



HOSTAYÊ ZIMAN
CELADET BEDIRXAN

**EGER
SEROKÊN
DUNYÊ
JIN BÛNA**

RÛPEL 25



**'WEDAT
ZANIBÛ
WÊ BÊ
KUŞTIN'**

RÛPEL 18-19



**ŞIVAN
VEDIGERE
WELAT ?**

RÛPEL 39

**2 RÛPEL
DIMILI**

ROJNAME

Sal: 1
Hejmar: 0

HEJMARA PROVAYÊ

TELEFON:
1/517 13 78

7000 TL.
10 MARK



Foto: GEORG KRISTIANSEN

● Şermin bê dest û bê çav ma... Şermina 12 salî ji bajarê Duhokê li malê razabû. Ji nişka ve çend helikopter hatin û...

BIRIN KÛR E

■ ■ Zarûkên rû pelixî. Zarûkên bê mîl, bê dest, bê pêçî. Zarûkên piştîkîyayî. Zarûkên zîkçirîyayî. Zarûkên çavrijîyayî...

■ ■ Zarûkên Napalmê. Zarûkên mayînên kor. Zarûkên kızıri, şewiti, wesle wesle perçekiri. Zarûkên li ber mîrinê...

■ ■ Ji bo ku meriv bîkaribe li Duhokê "Nexweşxana Azadiyê" ziyaret bike, gerek kezeba meriv ji pola be...

RÛPEL 20-21



**BALERINA
KURD
LEYLA
BEDIRXAN**
RÛPEL 8-9

SPOR

Çavê Hekari-sporê Fenerbahçe ji dibire

RÛPEL 22-23

FILMFALMUZİK

Xeber • Reportaj • Kultur • Xaçepirs



GORDIMER-XELATGIRA NOBELÊ

RÛPEL 31

ZARÛKEK TÊ DUNYAYÊ

Zarûkek ji dayika xwe bûye. Navika wê hin nehatiye birrin. Bê xwedi ye. Bê dê û bav e. Bê nav e. Lê heta ku dayika wê jê re naveki bibine, emê jê re bêjin ROJNAME.

Wek hemû zarûkên cihanê, ROJNAME ji malekê dixwaze. Xwarin û vexwarinê; germi û şefqetê dixwaze.

Ji aliye şefqetê ve serê me ji xelkê Kurdistanê ve bilind e. Em baş dîzanin ku ewê wê zarûka xwe ji dil û can hemêz bike. Lê em disa dîzanin ku ji hêla sermiyan ve piştî xelkê Kurdistanê kul e. Em çawa bikin, çavê feqiriyê kor be...

Loma ji ev wezîfe dikeve ser milên sermiyandaran. Ji xwe dezgehên rojnaman li her derê dunyayê ji aliye wan ve tîn danin. Îcar ji bo sermiyandarê Kurd, pîrs ne bi tenê pîrsa kar û zera ye. Pîrs, pîrsa xiretê, xireta milleteki ye ji. Piştî ku hukûmet ji bêje "zimanê we serbest e" êdî sekin mîrîn e. Yan ji raste-rast bêxireti ye. Gerek heyfa heftê salan bê stendin. Roj û seet êdî gerek bi mîzîna zêr bîn wezîndanin. Êdî gerek rojname û televizyon û mekteb û universiteyên Kurdan ji bîn avakirin.

CIVAT


Heta ku rojnamên modern derneyên, wê tu car dengê me neçe hevdu. Nivîskarên me, şairên me û zîmanzanên me wê her tim li derveyê civata xwe, li Ewropayê, di quncikên xwe de, pîrsên me yên herî ciddî munaqêşe bikin. Emê her tim weki civata kerr û lalan bîmin. Bi gotîneka din, iroj zerûreta me ya herî acil komunikasyonêka civaki ye. Ji bo wê ji, ne bi tenê rojnameyek, bi kêmanî çar-pênc rojnamên mezin lazîm in.

PROVA

Ji nuha ve hinek gazin tîn guhên me. Gazinên dost û hevalan.. Dî-bêjin, "çima ji me nepîrsin, çima bi serê xwe dîkin?"

Wusa xuya ye xebata me çewt hatiye fêm kirin. Ji ber ku me hê dest bi deranina ROJNAME'yê nekiriye. Ev hejmar bi tenê ji bo numûnê ye. Bi baweriya me hejmareka weha şert bû. Ji ber ku di gelek pîrsên rojnamegeriyê de em bê tecrube ne. Yanî heta ku çare ji hinek pîrsên esasi re (ji aliye zîman, terminoloji û şêkil ve) neyê ditîn weşandina rojnameka modern zahmet e.

Loma munqêşeyeka fireh lazîm e. Û rojnameka ku ne tenê elit, lê



Lê gelo wê bîkaribe bijî?

xelk ji bîkaribe li ser munaqêşe bike lazîm e. Ev hejmar ji bo wê yekê şert bû. Yan na, me aqilê xwe bi nan û penêr nexwariye, em baş dîzanin ku bi sê-çar kesan, ne 40 rûpel, 4 rûpel ji dernayê.

Piştî ku we hejmara provayê xwend, xwe hazîr bikin, emê werin yek bi yek ji we bîpîrsin. Eger hun bîxwazîn, emê ROJNAME'yê teslimi we bikin.

Ji ber ku deranina rojname Kurdî êdî li ser me gîşan ferz e. Loma, serketina ROJNAME'yê ya me hemuyan e, û gunehê tîkçûna wê ji dî stuyê me hemûyan de ye.

SERMIYAN

Eger meriv bi mîjîyê ticaretê bîfîkire, ew piyasa ku iro li Turkiyê ji bo rojnamên Kurdî heye, li tu dereka dunyayê peyde nabe. 15-20 milyon insan bê rojname dîjin. Eger fîrseteka weha bi destê sermiyandarên Turk biketa wê bi çargavi bîhatana. Ji ber ku ev piyase, bi kêmanî, tîra deh rojnamên rojî û dehên hefteyi dike. Ji ber ku kara wê piyase, halê hazîr, ji kara hemû sektorên ticaretê zêdetir e.

Tîştê ku lazîm e, bi qederê kevçiyeki çayê cesaret û çend çuwal pere ne. Yanî sermiyanê destpêkê ye. Ji bo rojnameka weki ROJNAME'yê, ev sermiyan, bi hesabeki glover, li dor pênc (5) milyar

lirayên Turk e. Eger meriv bi awayeki din ifade bike, ji vê ROJNAME'yê re ev personel lazîm in:

- 35 rojnamevan
- 5 memûr
- 5 zîmanzan
- 4 resîmkêş.

Helbet meriv dikare rojnameyeka tenîktir û erzantir ji derine, lê bi baweriya me, rojnameyeka wusa ne laîqê millete Kurd e. Rojnama ku derkeve gerek bîkaribe sebr û rîk û hêrsa heftê salan şani bide. Gerek bîkaribe ji ROJNAME'yê ji dewlementir, xweşîktir, rengintir, û bi her awayi tekûztir be. Lê eger ji nav me çend sermiyandarên bi aqil dernekevin ji, em bawer in, emê (yanî xelk) bîkaribin li rojnama xwe xwedi derkevin. Ji bo wê ji modela herî ideal, danîna şirketeka senedan e. Şirketeka wusa ku her kes li gor qeweta xwe bîkaribe bibe şîrik.

SIYASET

Bi baweriya me, gerek ROJNAME li derveyê siyasetê be. Yanî ne wek organeka partiyên siyasî be. Ji ber ku tîştê ku rojnamekê dike rojname, pîrdengi ye.

Lê, di civateka wusa de ku insanên wê ji heqê jiyanê mahrûm in û her gav, her şev dikarin bîn girtin û kuştin... Di wê civatê de her rojname mecbûr e ciyê xwe kufş bike.

Bi baweriya me, gerek ciyê ROJNAME'yê ji li cephayê azadiyê be. Eger ev were mana siyasetê, wê çaxê gerek ROJNAME ji heta qîrînkê siyasî be.

ZIMAN

Me bi zanin zîmanê xelkê tercih kiriye. Ne ku me nîkaribû bi Kurdîyeka safî û paqî bînvîsanda. Em li çeq-çeqoyê nagerîn, ji ber ku me aş wenda kiriye. Mesela aş û çeq-çeqoyê dirêj e. Bîra bîmine hejmareka din.

ROJNAMEGERI

Di vi wari de bi tenê yek prensîbeka me heye. Ew ji AZADÎ ye.

Azadiya rojnamevan û nivîskarên, azadiya insan, azadiya birûbaweriyê..

Loma ji me deri ji hemû ihtîmal û hemû insanên re vekirî hîştîye.

Fermo, kerem bikin.



Eşref Okumuş

29.12
1991

TURKIYE
Telefon:
1/5171378
Telefax:
1/5171378

ROJNAME

• Li ser navê Weşanxana Dozê Xwedî:
(Doz Basım ve Yayıncılık Ltd. Şirketi Adına Sahibi)

Ahmet Z.
Okcuoglu

• Mesûlê gîştî:
(Genel Yayın Yönetmeni)

Eşref Okumuş

• Mesûlê Ewropayê
(Avrupa Sorumlusu)

Ali Coşar

• Mesûlê Huqûqî:
(Sorumlu Müdür)

Ferhat Tugan

• Adres:
Doz yayinevi
Nakilbent sok.
No: 49/3
Sultanahmet/IST.
• Adresa Ewropayê:
c/o Kaktus
Renstiernasg.14
116 28 Stockholm
SWED/SWEDEN

• Ev hejmar bi alikariya şirketa Mezopotamya derketiye

Elinizdeki gazete şimdiye kadar sattıklarınızdan farklı...Çogunuzun anlamadığı bir dille, Kürtçe olarak çıkıyor. Belki de ilk defa Kürtçe bir gazete satacaksınız.

Cumhuriyetin kuruluşundan bu yana Kürtler 92 kez gazete çıkarmış, ancak hepsi de yasaklanmıştır.

ROJNAME Doksanüçüncü (93) girişimidir.

ROJNAME'ye de saldırılar, suçla-

Sevgili gazete bayii!

malar gelebilir. Hatta "Satmayın bu gazeteyi" diyenler de olabilir size. Bunu şimdiden seziyoruz. Önyargılı olduğumuzdan değil, başımızdan 92 kez geçtiği için...

İran ve Irak'ta dahi Kürt gazeteleri serbesttir. Türkiye bu ülkelerden daha mı karanlık? Bu soruyu sorabilmeliyiz

kendimize.

İrkçi nefretin yerine kardeşliği ve sevgiyi geçirmek isteyen her yurttaştan dayanışma istiyoruz. Sorunlarımızı, ne kadar ağır olurlarsa olsunlar, karşılıklı sevgi ve güven duyguları içinde hep birlikte çözebileceğimize inanıyoruz.

Bu güven ortamının yaratılması için ülkemizde, Türkiyemizde ve Kürdistanımızda, daha bir çok rojnamele- rin çıkması gerekecek.

Ancak önce ROJNAME'ye hayat hakkı tanınmalıdır. Diğer 92 kardeşi gibi çocuk yaşta ölmesine izin verilmelidir.

Yeni yılını kutlar, sevgiler sunarız.

ROJNAME

Dunya dıguhure, lê em?

Gava me, cara yekemin, daxwaz û fikrên xwe yên li ser weşandina rojnameyeke Kurdi, ji der û dora xwe re got, piraniya ronakbirên me jê rû bade.

Bersivên wan ji hazir bûn: "Kurdi hê ne zimanekî nivîskî yê fireh û pêşkêşî ye. Îro wezîfa me jî her tiştî bêtir ew e ku em bikaribin xwe ifade bikin û behsa xwe bikin. Em vê yekê jî dikarin bi Tirkî baştir bikin. Ma çend kes dikarin îro bi Kurdi bixwinin û binivîsin? Hûn ê nikaribin Rojname bîfiroşin, ew ê di destê we de bimine. Lî milê dîn, dewlet wê rê nede rojnameyeke Kurdi..."

Belê, ev bersiv, rastiyekê ifade dikin. Rastiya ku ronakbirên me ne bi xwe û ne jî bi qîmet û hêjahiyên xwe bawer in.

Bê guman e ku em divê doza xwe bi dinê û kesan bîdîn zanin. Lê, berî her kesî, em bi xwe divê pê bîzanibin. Ji bo vê yekê jî, rîya herî bi tesir zimanê me yê zikmakî ye. Ev rastî, jî bo civatekî minî ya me ku di bin tehdîda asimilasyonê de ye, hin grîngtir e.

Lî aliyê dîn, Kurd pîr baş bi zimanê xwe yê zikmakî dizanin. Kurdekî xwendî ku li gundekî herî izole diji jî, bi dû ceribandina çarekî du caran, dikare bi hêsani rojnameya xwe bixwîne.

Dinya bi lez dıguhure. Merivahi, bi gavên bêhempa ber bi avakirina nizameke civakî û navneteweyî ya hin azadîr û xweştir, bi pêş ve dere. Diktatorên do di nav hîlm û bisekekê de cihê xwe jî nizamên azad û demokratîk re dihêlin.

Lê ji bo me Kurdan, tu tişt naguhure.

Gelo berpirsiyarê vê yekê kî ye?

Bê guman, berî her kesî dewlet û idare ye.

Lê belê, bi tenê ew berpirsiyar e?

Naxêr, di vir de, mesûliyeta me, ronakbirên Kurdan jî heye û ev ber bi çav e.

Kesên ku bi zimanê xwe nizanin, ronakbirên me ne. Û nîyet û daxwaza wan jî nî e ku ew hin bin. Loma ew li dijî weşîna rojnameyeke Kurdi bersivên jorin didin.

Em iddia dikin. Tiraja rojnameyêke bi rêk û pêk ya Kurdi ne li binê pêncî (50) hezaran e. Tu sedem nî in ku ew, bi wextê, tiraja xwe dernexîne ser pênc sed hezaran.

Bi Tirkî, her roj, bi sedan weşan derdikevin. Hemû jî tîr firotin. Ji bo çî rojnameyek ku xitabî bîst milyon Kurdan dike, wê neyê firotin? Bes, ku ew bikaribe bi rêk û pêk be. Bi tenê, ew nebe aletê hesabên piçûk...

Bersiva ku "Wê dewlet rê nede" jî, disa rîyeke dîn a revê ye.

Bê şik, em jî bir nakin ku em li welatekî wisa dijin ku tu mafên

Kurdan nasnake.

Lê belê, tu hukmên huqûqî nî in ku rê li merivan digirin da ku ew zimanê xwe yê zikmakî bi kar neyînin. Ji bîlî vê, qedexekirin û rêgirtin hovîtî ye, zordarî ye.

Gava meriv mafên xwe bi kar bine, dikare rê li zordariyê bigire. Heta hûn mafên xwe bi kar neyînin, çawan hûn dikarin bîdîn xwediyê wan mafan?

Bê guman e ku gava zordarî û keyfîyet li derekî hukum bikin, hingî di bikaranîna mafan de wê hîn zehmetî û dijwari hebin.

Lê bîha û bedelek wê jî heye.

Armanca me weşandina rojnameyeke Kurdi ye, ne derxistina şer û teşqelan e. Herçî zehmetî ne, ya herî mezin pere ye.

Bi mehan e, jî bo derxistina ROJNAME'yê, em xwe pîr diwestin û diêşînin. Me hemû imkanên çend hevalan û weşanxaneyêke yeksalî civandî ser hev da ku em bikaribin vê hejmarê provayê biweşînin.

Lê domandin û gavên nû, jî imkan û quweta me dibuhure. Bi tenê hevgirtinek, kollektîvek dikare jî bin vî bari rabe. Ji ber vê yekê jî, me welê baş dit ku em hejmareke provayê biweşînin da ku em bikaribin wê nişani civatê bîdîn. Hûn xwendevan wê biryar bîdîn ka ROJNAME bîla dewam bike yan na. Ev jî tenê bi kîrîna Rojname nabe. Divê meriv piştigirî û alîkarî li avakirin û pêkanîna muessesa Rojname bike.

Belê, em bang li we dikin û dixwazî hûn, berî her tiştî, bersiva vê pîrsê bîdîn: Gelo hûn dixwazî ku rojnameyeke Kurdi derkeve?

Eger hûn dixwazî, hingê hûn bi çiqas pereyî dikarin bîdîn hisedarên şirketa ROJNAME'yê?

Eger hûn dixwazî bîdîn xwediyê rojnameyekê, hingê jî dûr ve temase nekin.

Em vê jî we hêvî dikin. Ne bi tenê hêvî dikin, em dixwazî jî.

Ji ber ku zimanê me namûsa me ye.

Lê xwedîderketin jî wezîfa me hemûyan e...



Ahmet Zeki Okçuoglu

29.12 1991
EWRÛPA
Telefon:
46/8/ 6434308
Telefax:
46/8 6435710

Çapkirin (Basım)
Adalar Gazetecilik, Yayıncılık Matbaacılık ve Ticaret Ltd. Şti.

Belavkırın (Dağıtım)
Birleşik Basın Dağıtım A.Ş.

Bu sayı, MEZOPOTAMYA Basın ve Yayın A.Ş.'nin katkısıyla çıkarılmıştır.

ALİKARI

TÜRKİYE:
Salahattin Okçuoglu
Türkiye İş Bankası
Cağaloğlu Şubesi
Hesap no: 371471
İstanbul

EWRÛPA:
Rojname, Postgiri:
627 27 47-4
Swêd/Sweden

Wesiyeta Shakespeare

"Ha we zimanê min jî min stend, ha we çermê min jî min kir"

Ez di nav stran û beyt û metelok û çirok û dua û nîfîrên Kurdan de li gundekî nêzî Anqerê wek neslê çaran hatim dinê. Lî vi gundi bîyî Kurdi tu kesekî bi zimanekî dîn nedizani.

Ez hê şeş salî bûm mektebek çêkirin. Û em hemû zarok, biçûk, mezin, dirêj, kurt, gîş di sîmfekê de bi cih bûn. Bi vi awayî cara pêşî min zimanê xwe yê duduya jî nas kir. Ne me bi Tirkî zanibû, ne jî mamoostê bi Kurdi. Piştî demekê li mektebê Kurdi yasax bû. Lî malê bi Kurdi, li mektebê bi Tirkî, di demeka kî de min Turkiya xwe pîr pêşde bir. Lê Tirkî wek zimanekî dîn jî min re xerib û sar dihat. Lê hê jî zimanê ku di goşt û xwîna min de ye Kurdi ye. Ez dizanîm ku di tengasiyê de, digel ez Tirkî jî Kurdi çêtir dizanîm, disa jî zimanê ku pêşî tê bira min zimanê dayika min e, Kurdi ye.

Lî gor pîsporekî Afasi (di Yûnani de tê mana lalbûnê) ger qezayek bi serê mêjiyê meriv de were û mirov axaftinê jî bir ve bike, di dû re jî nexweşiya

"Tê tê maleka min tê, ji perê wi ali Firatê" Belê, me bi vi awayî dest bi tîştanokan dikir wexta ku em zarok bûn. Û me bi şecerabav û kalên xwe dewam dikir; Feyoyê Eli, Eliyê Hemê, Hemê Xintê, Xintê Hafedî, Hafediyê...

Di şevên dirêj ên zivistanan de karê me ev bû. Li aliyekî dîn jî bi wan radyoyên 'transistorlî'yên ku antênên wan di axê de çikandî bûn, me guhdariya radyoyên dûr dikir.

mîrov sax bibe, pêşî zimanê dayika meriv tê bira meriv.

"Ha te zimanê yekî yasax kirîye, ha te çermê wî bi saxî guraye" dibêje Shakespeare. Shakespeare di piyeseke xwe de weha dibêje: "Min mecbûr dikin ku ez dev jî zimanê xwe berdîm. Wî bikim wek kema a bê tîl, wek aletê hêja yê hefskirî ku awaz jê dernayê. We zimanê min li paş diranên min û herdu lîvên min qefil kirîye..."

Wextekê li Amerikayê zimanê Sorik û İspanyan, li Fransayê yê Alsasiyan yasax kirine. Mussoloni li İtalyayê xelkê herêmekê ku bi Almanî dipeyivî jî ci rakir û sirgûn kir. Lê van dewletan paşê dev jî van kîrînan xwe berdan, heta jibo pêşdebîrîna van zimanan alîkarî kirin û dîkin jî.

Gotina min şaş fam nekin. Ez Tirkî jî Kurdi baştir dizanîm û vê yekê jî wek dewlemendiyekê qebûl dikim. Tiştê ku ez dixwazim bibêjim ev e: mudaxela pêşveçûna zimanê me kirin. Ji ber wê jî ez bûm kesekî niv-zimani. Ev jî di nav Kurdan bûye wek fenomeneka normal. Nizanim gelo strana "Bêrivanê" tê bira we? Dibêje: "Te aliyekî dilê min reş kirîye, aliyê dîn bide xatîrê Xwedê û Pêxember" Yê me Kurdan jî wusa ye, aliyekî dilê me, ruhê me, mêjiyê me hatiye reş kirin. Aliyekî me maye. Em kîrîne niv-meriv.



Ali Coşar

ÇIROKA ELFABÊ

Elfaba me ya iro çawa çêbûye? Celadet Bedîrxan di Hawarê de (nr:13/1932) çiroka wê nivîsiye. Çend rêzên vê çirokê weha ne:

(...)Bî vê hîncetê min dil kir jî xwendevanên xwe re berpêkirîna elfabeya me bi kurtî gîlî bikim.

Ev elfabeya hanê ku iro em zimanê xwe pê dinivîsinin paşîya xebateke salînê dirêj e.

Di sala 1919'an de (...) min elfabeyek bi sîh û şeş herfên serxwe êxistibû destê xwe(...)

Ez paşê jî bi elfabeya xwe mijûl dibûm. Lê hetanî ku Tirk elfabeya xwe belav kirin ya me weke xwe dîma û têde me tiştêkî bîngehî nediguhart. Min her tiştên xwe pê dinivîsand û nasên xwe re dîda zanin.

Wekê Tirk elfabeya xwe belav kirin me dit ku di dengên hîn herfan de elfabeyên me ne minî hevin. Dengin hebûn ku Tirkan ne bi wan herfên ku me nişan kirine lê bi herfinên dîn nişan kiribûn.

Herwekî me berê jî çend caran gotibû, jî bona hêsani kirîna xwendina nivîsarên me, jî Kurdmancên Tirkîyê re, me dengên hîn herfan bi hev guhartin û herçend hebû me ewçend elfabeya xwe xîst nêzîkî Elfabeya Tirkan(...)

Jî lewra ez vê elfabeyê jî keda xwe bêtir keda milletê xwe dihesibînim û pêşkêşî we dikim.

Celadet Bedîrxan

TIYA DI ADIR VARENO

Binaya tiyatroy, nino mî vir çend qati bi. Ez nerdiwana ina bina ro vejyayni. Dî deqîqey mendibi kî tiyatroy dest pey bîko.

Mî nêwaştîni kî ez erey bikewa, çimki mî zanayni kî tiyatroy pabey çî kesi nêvindeno. Mî lezî kerdîni. Cîfê mî peysa bî û mî ereq vetbî.

Ez salona tiyatroy resaya nêresaya to va qey zanawo ez şîya zerre, lambey nîşka ve ra hewna şî, zerre tari û dermat bî. Veri çîyekî mî ra nêhasa, verra verra çîmê mî bander bî. Ez nêzana çî ri, tam ay hîng dî Sinema Dilan (Dilan Sinemasî) a Dîyarbekîr kewtî mî virî. Ez kî gedê biya gege ez şîyayîşê sinema dî inawa erey kewtîni. Labelê zerrey Dilanî mî ezber ra zanayni, mî weyra asan-asan cay xwî diynî. Ewta ina nêbî. Dilanî kura, ewta kura? Belkî ez se gîlangî belkî zi se gîlangî ra zafêr şîbiya Sinema Dilanî labelê ez raya (fina) ewlî ameynî inî tiyatroy.

Mî zor cay xwî dî, ez ronîştî. Hetana kî ez ronîştî, tiyatroy zi dest pey kerd. Salonî dekerda ya. Sehne dî tani eskerî şonî yenî. Sehne sehne niyo tî vanî qey raştî hefîsxane wo, hîma çî hefîsxane!

Mehkûmê kî nêşîni pay ra vindîrî

Pey sehni ra ge-ge barî û qîrîya mêrdîman yena. Mêrdîmê kî eskerî îşkence bere (bîde) kenî. Eskerê beşndergî, qelawî, dekerdey. Lezkani şonî-yenî. Gama kî rayîra şonî, potînanê yîni ver 'erd lerzeno. Sehne dî yew xort leqnayewo, eskerî pîro amey pêser, herkes yew het ra dekweno, dano pîro. Tani dekwênî çenandê yê, tani serey luliya tîfîngê xwî fektê yê ra kenî, porrê yê kaş kenî. Xort qîrreno, qîjeno, çîzzeno.

Ge-ge yewna-dîna mehkûmî asenî. Mehkûmê ze'îfî, lewpulîsiyayey, zerd û zîmulêqî. Gan te de nêmendo, nêşîni pay ra vindîrî. Hetî ra zi dani pîro, pîro ancenî û tuf kenî ridê yê.

Îno tiyatroy bî xwî yanî Zîwanê Koy o kî nuştîxê (yazar) Îngîlîzî, Harold Pînter'î nuştî, hefîsiyanê Hefîsxaney Dîyarbekîr ser o yo. Cuntaya 1980 ra pey no hefîsxane dî û hefîsxan-anê eskerîyanê binan ê Tîrkîya dî îşkence û ta'da bêhedd û bêhesab bibî. Hefîsxaney Dî-



● "Mî tebişeno, labelê hefîsxane dî rîka mî hîna xurt a. Dano miro, labelê ez da'wa xwî ya heqîni ser o hîna sur a."



● "Rêzil û kendîr û çîwa û hefîs ra ez nêtersena Mî lete-lete kî, bîkîşî zi ez vana 'ez Kurd a' reyna." (Hêmin)

Zîwanê Koy — Nuştîx: Harold Pînter

TIYATRO

yarbekîr ser o mî zaf çî wendbî. Embazê kî weyra mendîbî zaf qalê eziyetê weyray kerdbî. Harold Pînter'î zi Zîwanê Koy dî hal û ehwalê inî hefîsxanî weş îfade kerdbî û artîstanê tiyatroy rolê xwî weş kay kerdnî.

Ez salonî dî, hêşê mî teber a

Ez kî sehne ra ewnîyêna û îşkencekerdîşê eskeran veyne- na, tani embaz û şînasîyê mî yenî mî virî, embaz û şînasîyê kî ino hefîsxane dî seqet bibî yan zi kîşîyaybî.

A gama verênî ra pey ez hîni salona tiyatroy dî niya. Ez Dîyarbekîr dî ya, Çêrmûg (Çêrmîk) dî ya, Kolîk (Kexta) dî, Erxenî dî, Farqîn dî (Silvan) dî ya. Yew bî yew inî qereqol û

nezaret û hefîsxaneyê kî ez te de menda mî çîman ver ra geyrenî. Gardîyanî, polîsî û eskerê kî mî geyray, ez tebiştî, ez berda-arda, dawo mî û embazanê mî ro, yew bî yew kewenî mî vir. Cay îşkenceyê Merkez Karakolu yê Dîyarbekîr, Kurdoglu Kîşlasi, Devegeçîdî yenî mî vir. Ê ez zana kî eziyet û îşkenceyê Hefîsxaney Dîyarbekîr zaf zafê mî ra vişêr o. Îşkenceyê Hefîsxaney Dîyarbekîr ver dî belkî nêr-jeno kî ez qalê ê xwî bîka. Ê mî Cuntaya Eylûla 1980 ra ver bî. Aw wext hîma inawa adîr nêvayraynî.

Ez ge-ge newe ra ageyrena salona tiyatroy labelê ez hîna vişî cayna ya, ez salonî dî niya. Ez Kurdistan dî a, Kurdistan çend hezari kilometrey ewta ra,

ina salona tiyatroy ra durî yo?

Sehne dî mayanê hefîsiyan ra yew may û yew cenîya ciwana rîndî hasenî. Amey "goruşme". Mala goruşmî! Bî name goruşme labelê îşkenci miyan dî îşkence:

"Goruşme"yo bê qîsekerdîş

May zîwanê xwî vişêr yewna zîwan nêzana, zîwanê eskeran ra çîyekî fahm nêkena. Lajî rê zi bî zîwanê dayka xwî qîseykerdîş yasax o. Laj û may pê ra ewnênî. May lajî persena, laj qîsey nêkeno. Bî zîwanê may qîsekerdîş yasax o! May mesela ra çî fahm nêkena. Bêriya lajê xwî kerda, bêriya vengê yê kerda. Laj qîsey nêkeno. Laj şa'tîyawo (biyo ze'îf), biyo ze viya lay. Rî biyo ze şîm'a. May vazena lajî dî qîsey bîko, laj nêşîno qîsey bîko, eskerêdo zir-zop pey yê dî vinderto. May lajeki ra ewnêna, lajek eskerî ra ewnêno; ez qahriyêna, hêrs bena, ez kena kî biteqa, çîmê mî pîrr hesrî benî. Mesela hîndî ta'm ra vejîyêna kî gama kî esker verdano lajek qîsey bîko zi hîni lajek qîsey nêkeno.

"Hefs cay camêrdan o"

Ez maya lajeki ra ewnêna, maya mî yena mî virî: Rojê, binê dêsê Hefîsxaney Çêrmûgî ver dî vinderta, ez pencera ra te de qalî kena. Mîlul a, ez henekî kena, qaydê xatîrê mî ri peşmîriyêna. Rojê zi Hefîsxaney Eskerî yê Dîyarbekîr dî, cay goruşmî dî mî geyrena, nêşîna mî veyno; ez venmg dana, vengê mî şînasnena, ver bî vengê mî yena. Ma yew-dî qalî kenî, vana "Tî pey hesîyay? To ri yew keyna bî." Dîm a, "Zanî" vana "lajê mî, tî cay xem nêkî! Hefs cay camêrdan o!" Semedo kî ez tî ra nêpawena, ez heyret kena kî moral dana mî! Keyfê mî yeno. Embazanê Sêwrekîjan ra yew qalanê maya mî eşnaweno, Kîrdkî (Zazakî) fahm keno, vano "Maya merdîmî wîni moral bîdo merdîmî se hepis-mepîs muhim niyê la!"

Tiyatroyê Zîwanê Koy derg niyo, tîkêna dewam keno, dîm a bî çepîkan qedîyêno. Ez aw wext newe ra ageyrena salona tiyatroy. Embazo kî ma piya yi, vano "Emşo na salonî dî mî hêz û erjayeya sen'et û sen'etkari newe ra fahm kerdî."

Roşan Bariçek

Marda xo ra biyayîşê ma
çî bî kî
rojê yewinê menga verêna serri?
Tî zî zani kî
"cuzdan"ê ma qestikên,
"soyadi"yê ma zurayên.
Ma key benî wetendaş
lo wetendaş?

Malmisaniy



Tî zî zani kî dinya dî mêrdîmo bêzîwan û milleta bê zîwanî çîniya. Zîwanan ra zî ewro zîwano kî nêwaniyêno û nêwaniyêno hima hima kî nêmendo. Ma Kurdi kî wayirê nufûsêdê ehendi zafî yî û wayirê zîwanêdê ehendi kehani û xurtî yî, zalîman û goniwêran nêverda kî heta ewro ma bî zîwanê xwî biwani, binusi, dêri (deyirî) bîki. Nêverda ma kitabân û kovaran(dergiyan) bî zîwanê xwî veji, tiyatroyan û filiman bî zîwanê xwî vîrazi, radyo û televizyonyanê bî zîwanê xwîyê şîrîni gûşdari bîki. Şarî ma kerdî lal û tati, ma kerdî kerr û gêji. Ma biy zey 'eydalan û pepûkan. Ewro şarîstanan û dewanê ma dî, keyan û kuçanê ma dî gedey ma, gîrdê ma, pil û şenikê ma bî "yapmiş" û "êtmîş" xeberî dani.

Tî zî zani kî ewro dinya dî milleta bê rojname (gazete) hima hima kî nêmenda. Dinya-'alem bî zîwanê xwî ne yew (jew) ne dî ne hirê, bî seyan

û bî hezaran rojnameyan vejenî. Bî zîwanê xwî xebîranê dinya û welatî wani. La ma? Ma se kenî wendoxo erjaye? Belê, e, ez zî zana, tî zî zani kî serdestê ma çî tewîr serdest o. O goniwer o, zalîm o, neheq o, bêmerhemet o, bêşeref o; merdîmey ra dûrî yo, sextekar o, wayirê dek û dolavan o. Labelê madem kî ehendi nebaşey û te'da ma ser o esta, madem kî ma ehendi bîndestê şarî yî, gani (gerek) ma xwî ra zî bî-persî:

Gelo kema-ne û sisteya ma çî ya? Na bî nî-desteya ma dî gunehkareya (sucê) ma zî çîniya?

Tî mî ra persî, ez vana esta. Ma çîyanê binan qe nêvaji, hima ma vaji eke ma despîncês milyoni Kurdê bîndestê Dewleta Tîrkiye nêşîyê (nêşkenê) bî zîwanê xwî çend kitabân, kovaran û rojnameyan veji helbet ma dî kema-ne esto, ma dî sistey esta. Eke ma dî kema-ne çînêbo, dîşmenê ma do (ko) nêşîyo ehendi asan welatê ma dî estorê xwî kay bîdo. Eke ma nêşîyê welatê xwî rê wayir bîveji, do şar mal û mîlkê welatî boro. Eke ma zîwanê xwî rê wayir nêveji, helbet do ewro gedeyê ma bî "yapmiş" û "êtmîş" qisey bîki; çend kelîmeyê Kurdkiyê kî ewro zani, meştî do inan zî xo vir a bîki.

Tî zî zani kî zîwan û kultur goni û goştîya merdîman û milletan î tî zî zani kî merdîm bê goni û goşt nêbeno. Eke ma zîwanê xwî û kulturê xwî vîni kerd, ferqê ma û koleyan çî beno? Lazîm o kî ma xwî verro dî, ma destan xwî ra verra nêdi. Ma ehendi erey kewtî, hîni bes o! Eke tî zî vanî "bes o", ma destê xwî bîdî pê, ma pîya xwî verro dî û çî kî ma ra yeno ma bîki.

Eşkara ya, eke merdîm xwî bîbetîlno, xebatî dî, mucadele dî rîkî bîko, merdîm şîno (eşkano) ser kewo. Labelê eke merdîm destan xwî ra verra do, dîşmen kesî rê merhemet nêkeno.

Çî gîrd çî werdî, çî camêrd çî cîwanîkî, wezîfe keweno mîlê ma hemînan ser. Herkesî ra zafêr zî wendey, zanayey û roşenbîrê (aydînlar) ma lazîm o kî mesulîyeteya xwî bîzanî. Zanaye mesul o. Kam çendî zaf zano, ehendi zaf mesul o. Kam kesî kî zano û nêkeno gunêhkar o. Rojê do milleta ma gîraney roşenbîran bîtepişo û bîperso:

-Vaje veyna, to semedê milleta xwî û semedê mêrdîmey çî kar kerd? Şert nîyo kî milletî ma ra hesab bîperso, ma xwî bî xwî ra bîpersî.

Wendoxo erjaye, xwî vir mekî kî hêzê (quwetê) ma yewbîyayîşê ma dî nîmite yo. Ma paştîya yewbinan bigîrî, kî ma bî rîsîpênaya xwî dîşmenan şermezar bîki, dostan şad bîki.

Ewro bê nuştîş û bê wendîş karekî nêşono seri. Tî zî dest pey bîkî bî zîwanê xwî biwani û

binusi. No karêdo gîrd (xîşîn) nîyo labelê karêdo werdî zî nîyo. Karêdo lazîm o. Ez nênusa, tî nênusi, kam yeno ma rê nuseno?

Eke to ra yena, nê wezîfî bîyarî ca, eke to ra nîna û tî nênusenî zî nuştîxan rê ardîm bîki. Bî zîwanê dayka xwî biwani, kritik (eleştîrî) û fîkranê xwî bîdî zanayîş; rojname, kovar û kitabê kî bî zîwanê dayka to nuştîyê û zerba to yî, inan rê wayir bîveji. Wa bara to zî no lej dî bîbo.

Ez tekrar kena: Zanaye mesul o. Bizane.

Yapmış û êtmîş'i rê bes o!

MEHEMED

MALMISANIY



AXÎNEK JI KE

Yol û Duvar slava dawin bûn ji Yilmaz

Ji bo musulmaneki di Qur-anê de, ji bo isewiki di Incilê de, ji bo marksisteki ji di Kapitalê de cewaba her tiştî hatiye dayin.

Ji bo kurdeki ji Yilmaz Güney di Yol'ê de her tiştî gotiye. Lê gotin heye, gotin ji heye.

Yol di hefsêka niv-vekiri de dest pê dike. Çend girti derdikevin iznê. Ji wan sê kes xwediyê rolên sereke nê: Mehmet Salih, Seyit Ali û Omer. Omer, zılma

millî ya li ser xelkê kurd (nişan dide). Seyit Ali û Mehmet Salih ji civate eşirî nişan didin.

Mewlûd û Yûsûf du qehremanên din in. Ew ji tîkiliyên jin û mîran rêdîdî.

Di gundê Omer de disa şer heye. Şerê gundiyên "qaçaxçî" û eskeran. Jiyaneka bê istikbal Omer dipê. Lê di nav şîrqîna tîvîngan de jî nihêrînek bi evin heye. Gulbehar heye. Gulbehara ku wê nebe yara Omer.

Jina Seyit Ali pê re bêbextî kiriye, ketiye rêya xerab. Malbata wê û ya Seyid Ali qerara kuştina wê dane. Seyid Ali mecbûr e ji vi qerari re seri deyne. Lê di aliki dilê wi de hêrs, di aliyê din de jî şewat heye. Şerê dest pê dike di dilê wi yê dudilî de. Şerê namusê û zêfîqetê...

Mêrxasiya eşirî û tîrsa insani

Mehmet Salih di şerê de bû-rayê xwe di ci de hiştiye û reviyaye. Tîrsiyaye. Û li gor qanûna eşirî cezayê tîrsê mîrîna e. Dilê Mehmet Salih ji bûye du şeq: Li aliyekî mêrxasiya eşirî, li aliyê din tîrsa insani...

Yol, filmekî ku meriv ji sinemayê derkeve û ji bir bike nine. Esas filmekî bi tenê ji nine. Ji çend filman çêbûye. Yilmaz Güney gelek pîrsên esasi (wek

namûs, bêbextî, tîrs, mêrxasî) di nav senaryokê de karîbûye bihelîne. Film panorama civata me ye.

Di Yol de jî qet qise nakin. Lê awîrek, an seribadanek wan hêjayî deh rûpel dialog e. Yilmaz Güney li ser vê yekê weha dibêje:

"Sinema di esas de hereket e. Mîrov di tiyatroyê de, dikare pîrsa xwe bi dialogê rohnî bike. Lê di sinemayê de hereket, awîr û rîsm muhimtir in."

Di Yol de slogan û gotinên

Güney ditina xwe ya derheq hunera sinemayê weha ifade dike:

"Ez mîrovekî siyasi me. Lê Ez film wek wesîta şanîdana rastîyeka teorîk nabinim. Ez li diji filmên ku li ser sloganan tên ava kirin û dibin makîna propagandayê me."

Êşeka dîlî û serihildanek

Yol serbilîndiya mîletê Kurd e. Bi dehan mîletên xwedî dewlet nikaribûne nêzî xelateka

weha bibin. Hezar mîxarîna Yilmaz zû ji cem me bar' kir. Lê hunerê wi yê nemir wê di nav me de her bijî.

Filmê Duvar slava dawin bû ji Yilmaz. Yilmaz di vi filmî de, bi awakî pîr realistîşkence û zordestiya tazi rêdide.

Duvar ji aliye rexnegîrên filmên Ewropî ve zêde nehat

ecibandin. Tîştên ku ew lê germ nebûn şiddeta raste rast e. Yilmaz Güney bersiva wan weha dide: Li Ewropayê mîrov ji bo ku objektîfîr xuya bike, divê rastîyan revîze bike."

Hadisên ku di film de derbas dibin rastîya civata Turkiyê û zindanên wê ne. Lê ji bo raya gîştî ya Ewropayê filmekî weha giran e. Mesûliyeteka axlaqî dide ser mîlên meriv.

Gava meriv nikaribe ji bin rastîyê derkeve, meriv wê qebûl nake û bi vi awayî ji mesûliyetê "xelas" dibê. Durûtî ji şeklekî jîyanê ye.

Ez gotina dawî didim Yilmaz:

"Filmê Duvar, êşeka dîlî, orînek ji kezebê û rapîrînek e"

Vahap Bilgeç



YOL HÊJAYÎ DEH XELATAN BÛ. Pîrsên giran bi awakî pîr besit şanîdan, Yol deh caran hêjayî xelata zêrîn dike.

vala tunene. Pîrsên giran bi awakî pîr besit û bi tabloyên hûrîkên jîyana rojane ve şanîdan, Yol deh caran hêjayî xelata zêrîn dike.

Tadekari gîş ne gunehê sistemê ye

Yilmaz Güney xwestîye bi tevayî zordestiyê şanî bike. Lê zordestî ne tenê ya dewletê ye. Zordestiya mîran, ya dinî, siyasi, eşirî û civakî ji di film de hatine hûnandin. Em li Yilmaz Güney guhdari bikin:

"Divê mîrov barê tadekariyê hemû nexerê stuyê sistemê. Zordestî tenê ji sistemê nayê. Têkiliyên mîrovan ji zordestiyê tinin (...) Di Yol de zindana rastîn, dunya li derveyî zindanê ye"

Karakterên filmên kevnên Yilmaz Güney, ku direk siyasi bûn, di Yol de tunene. Yilmaz




● Li aliye mêrxasiya eşirî, li aliye din tîrsa insani.

ZEBÊ...




ZORDESTIYA CIVATÊ.

Zordesti bi tenê ji sistemê nayê. Têkiliyên mirovan ji zordestiyê tinin. Di filmê Yol de zindana rastin, dunya li derveyi zindanê ye. Yanî "jiyana rojane" bi xwe zindan e.



Eger zimanê te "yasak" bûna teyê çî bıkıra? İHD, di anketekê de ji Turkan ev pîrs kîr. Cewaba gelekane weha bû: "Minê intixar bıkıra." Lê tu dişa ji intixar neke, **ROJNAME**'kê bıkire. Hem ruyê xwe, hem ruyê me spi bike.



INTIXAR NEKE ROJNAME'KÊ BIKIRE!

BALERINA KURD



WEKÎ MAR XWE LI BA DIKIR. Qraliçeya Sabayê Belqis, Şeva Kurd, Govend, Dilan û dansa Mar...Dî nav salên 1930 û 1960'i de, li Ewrûpayê tu kesi ku van baleyên Leyla Bedirxan nenasiya tunebû.

"Govend ji dibe bale"

Ji salên 1930 heta 1960'i te ji kijan Ewrûpiyeki ku bi sinet û hunerê mijûl dibû navê Leyla Bedirxan bîrsiya, wê yekser hin parçesahneyên, Şeva Kurd, Govend, Dilan û dansa Mar bi-hata birê.

Balerina kurd Leyla Bedirxan ne tenê li Ewrûpayê, li gelek welatên Ereban û hetta li Tirkîyê ji bi nav û deng bû.

Mîrov li rojname û kovarên Ewrûpiyê yê demê dinîhêre, mîrov dibîne ku ew di nav hunermendên Ewrûpiyê de çiqas navdar bûye.

Leyla Bedirxan piştî ku li Almaniyayê mekteba baleyê xelas dîke di 1925'an de û paşê ji li Fransa, Belçika, Îspanya, Îsvîçre, li Amerika û li hin welatên Ereban derdikeve sahnê.

Bala hemû hunermendan dikişand

Ji rojname û kovarên wê demê tê fêhm kirin ku ji derveyî dor û bera kesên hunermend, di nav prens û qral û kontên Ewrûpiyê û Ereban de ji hatiye naskirin. Mesela di baleya "Qraliçeya Sabayê Bel-qise"yê de ligel gelek prens û prensesên Ewrûpiyê, melîkê Fasê ji beşdar bûye.

Di 1934'an de li bajarê Salzbourgê festîvala baleyê çêdibe. Leyla Bedirxan ji beşdariyê festivalê dibe û bala gelek kesan dikişîne.

Di 1935'an de cara pêşi baleya "Qraliçeya Sabayê Belqise"yê li Parisê, li sahnaya "Scala De Milano" pêşkêş dîke. Ew bi xwe di vî baleyê de di rola Belqiseyê de ye.

Di dawîya 1935'an de di baleya "Baya-Zein"ê de ji yek ji rolên sereke, rola "qereçî"yê distîne. Muzîka vî baleyê di bin berpirsi-

yarîya M. Naggiar de ji ali van kesan hatiye amade kirin: I. Aitoff (piyano), A. Castell (flut), R. Buffay (ritm).

Bêguman ji hemûyan muhimtir programa wê ya 24'ê Hezîrana 1935'an e, ku bi navê "Gala De Danses D'Orient" li Parisê li "Grande Salle de Rameau" pêşkêş dîke. Ji broşûreke ku wê demê hatiye belavkirin, xuya dîke ku programa wê gelek dewlemend e. Mesela navê hinek ji van dansan ev in:

Radha Xwe Dixemiline, Dilan-Govenda

dunyê dîke.

...Wan edetên ku di nav millet de pîroz bûn, ew bi hevîrê baleyê şiklek welê didê ku wê digihîne ciyê berzîrîne û hunerê...

Di baleyê de bi tevdan û tevgerên xwe yê xusûsi, wê bala herkesi kîşand ku ji kultura welatê wê ya hezar salî dihat.

Mîrov di nav dansên wê de şopa kultura ji Hindê heta bi Kurdistanê, Îranê û Tirkîyê dibîne. Leyla Bedirxan van kulturên di hîşê xwe de welê asimile kiribû ku bi wi laşê xwe

yê ciwanîk, aliyê herî baş û balkêş a vî dansa Rojhilatê dani ser sahnê.

...Dî jest û mimîkên çav û dest û milan de maneyek hebû. Bi taybetî di listîka Mar de, di tevgerên xwe de pîr sakî û serketî bû. (Maurice Imbert, Les Debats, 1935)

"Parisê ser û bîni hev kir"

Disa bi qasî ku mîrov ji kovar û rojnameyên wê wextê fêhm dîke, Leyla Bedirxan hetta salên 1960'i hunera xwe ya baleyê dewam kirîye. Mesela di 16.5.1953'an de, li Îstebolê, di rojnâme "Son Saat" de weha hatiye nivîsin: "Balerina Kurd Leyla Bedirxan Parisê serûbîni hev kir."

Tiştê ku di salên 1930'yan de gelek rojname û kovarên kurdan ji derdikevin. Ji wan Hawar, Rona-hî, Roja Nû, Stêr û Neynîk ji ali



HER TEVGEREK MANEYEK. Di her jest û mimîkên çav û dest û milên wê de maneyek taybetî hebû.

Kurdi, Dilana Hindi, Dansa Durziyan, Mar, Qraliçeya Sabayê Belqise, Beledi.

Hunermend û rexnegirên wê demê gelek li ser sineta wê nivîsîne:

"...Leyla Bedirxan ew tore û edetên ku di biçûkiya xwe de girtibû û bi wan rabûbû, di ciwanîya xwe de bi awayekî hunerî pêşkêşî

pi s m a m ê n
Leyla, Ccla-
det û Ka-
mûran ve tîn
derxistin, lê
qet behsa wê
nekirine.

**Mahmut
Lewendi**



HEVÎRÊ DILANÊ DI TEŞTA...

L. BEDIRXAN



Leyla Bedirxan keça Abdurrezaq Bedirxan Begê kurê Necib Begê kurê mezinê Bedirxan Beg û dotmama Celadet û Kamûran Bedirxan Beg e.

Dî sala 1908'an de li Îstenbolê hatiye dinê. Jî ber kar û barên bavê xwe ew jî li gelek welatên Rojhilata Navîn û Ewropayê geriyaye.

Leyla Bedirxan demekê li Almanyayê maye û li wêderê mekteba baleyê xwendiyê. Piştî salên 1925'an dest bi kar û barên ser sahnê kiriyê. Leyla Bedirxan di Îlona 1986'an de li Parîsê wefat kir. Keçek wê ya bi navê Nevin heye ku nuha li Fransayê wek rojnamevanê Mîsîrî kar dike.

...û çiroka jiyana wê

Bavê Leyla Bedirxan, Abdurrezaq Bedirxan di 1846'an de li Îstenbolê hatiye dinê. Dî xortaniya xwe de jî bîlî mektebên resmî yên dewletê, wî li malê jî talîma kurdi xwendiyê.

Abdurrezaq Bedirxan Beg di wezaretê derve ya Osmanîyan de xebitîye. Demekê dibê konsolôsê Teheranê.

Dî 1912-1913'an de, ew û Îsmail Axa Sîmko, li Kurdistanê Îranê dest bi karên siyasetê dikin. Bi navê Gihandin; Komela Çandî û Rewşebîrî avadîkin. Mektebên Kurdi vedîkin, Nexweşxaneyekê çêdîkin. Dî dawîya 1913 an e jî bo alîkariya maddî û siyasetê Rûsyayê bajarê Petersburgê.

Dî 1918 an de jî teref Jon Tîrkan ve li Musilê tê girtin û wî idam dikin.

Ebdurrezaq Bedirxan Beg jî bîlî Kurdi, bî Tîrkî, Rûsî, Îngilîzî, Fransî, Farisî û Erebi zanibûye.

...BALEYÊ DE DISTIRA û şikleki welê dida toreyê milletê xwe ku wê digihand ciyê berzîrînê vê sinetê.

XWÎN DIHERIKE

Seveka bê deng û sakin bû. Tarix 17'ê Tebaxê 1991 bû. Ji rojan çarşem bû. Şeva çarşemê êdi xwe bi siba pêncşemê ve girêda. Hiv weki kiloreka ziv li esman dîçirî. Li erdê ji der xir û xali bû. Xijina deri vê bê dengiyê xera kir.

Deri, deriyê dervayê qereqola gundê Meleeli (Beşdam) girêdayê Malazgirta qeza Muşê bû. Qumandanê qereqolê Şaban Egilmez, faqên ku li dora qereqolê ji bo neyaran hatibûn danin, yek bi yek kontrol dikir. Piştî vê wezifa xwe ani cih, berê xwe da direka bayraqê.

"Ulan bayrak!.."

Bayraka Turk a bi hiv û stêr bi naz xwe li ba dîkir. Komutan di cih de sekîni û qedereka xweş li bayrakê nihêrî. Û ji xwe ve çû. Bi hezrê ku dora xwe bi dengê xwe bihîsine, qêriya:

"Ulan bayrak senin altında dogdum, senin altında oleceğim..."

(Yani, herê ala bêbav ez di binê siya te de mezîn bûme, ezê di binê siya te de bîmrim.)

Yên ku bi vê qêjinê hîsiyan ne tenê eskerên ku li dora qereqolê faq danibûn. Sê gundiyan kurd ji bi vê qijina qumandan hîsiyan. Ev her sê gundiyan di nezareta qereqolê de ji xelkê Zikreş'ê bûn. Zikreş (Çiçekveren) ji girêdayê Malazgirtê ye.

Qumandan "Diko"

Pozê qumandan Şaban Egilmez eyni weki nukulê dik bû. Ew bi xwe ji yeki kîn û kurt bû. Disa bi xijineka weki gava dîn, ji derê qereqolê ket hundir. Di çermê serê wi de zêde por nema bû, ji ber vê ji yekcar dirûvê dikê şer pê dîket. Loma ji leqebê Diko lêkiribûn. Ew sê kesên di nezareta qereqolê de girti; Fesih, Nizamettin û Hacır Akan

ên birayên hev bûn. Gunehe wan yek bû; tu yek neçûbû bixêrhatina qumandan.

Wezifa Şaban Egilmez li Milas'a qeza Muglayê li "jandarma bolük komutanlığı" bû. Nêziki du meh berê neqla wi, weki qumandan, ji qereqola gundê Meleeli re derketibû. Meleeliya ku bi Turki jê re dibêjin "Beşdam".

Fermana qumandan

Qumandanê nû çawa hatibû nehatibû ji 17 muxtarên girêdayê qereqolê re û ji hemû kesên ku li van gundan dijiyan re fermanekê şandibû. Gotibû bila

Piştî nutqa xwe ji, ji bo "hîn mesrefên qereqolê" ji gundiyan "alîkarî" dixwest. Cihê vi tiştî di qanûnên Turk de tunebû. Lê esker û sivilên xwedan wezîfe vi tiştî, yanî xugi û bertilê (xerac û ruşwetê) zûda li Kurdistanê bi cih kiribûn û her tim bi kar dianin. Ku te pere nedabe, dihat mana tu li hember emrê qumandan derketi, ew ji dihat mana ku tu li hember dewletê derketi. Yanî yê ku pere nedidan di cih de dibûn xayin.

Wê şeva ifadê, pêşi xêr û gunehên Fesih jê hatin pîrsin. Fesih ji her sê birayên mezintirîn bû. Heta ku çêr û heqaretên


kultesi" 35 roj di tedawiyê de ma. Di vi muddeyi de, her carê yek ji me refeqeta wê dikir. Ez dîkarim bi dosya û wesiqên nexweşxanê vê yekê îsbat bikim....

"Hunê çiqas bîdîn?"

Her sê birayan ji bi eyni şekli ifadê xwe dan. Lê çî feyde, qumandan tu paxaf bi ifadên wan nekîr. Qumandan, piştî ku li ser hev çend caran disa çêri wan kir, got em werin ser esasê meselê:

"Hunê çiqas alîkari bikin?"

Her sê birayan bi yek deveki û bi hev re cewaba qumandan dan:



herkes were ziyaretê min. Ev her sê birayên ku nuha di nezaretê de bûn, emrê qumandan bi cih neanibûn, ji ber vê yekê hatibûn girtin.

Gundiyan ku dihatin qereqolê ji mecbûrî li nutqa qumandan guhdari dikirin. Qumandan digotê wan, Turkiye yekpare û yek perçe ye, gerek em yekiti û biratiya xwe ya milli xera nekîm.... Nutqa qumandan di nav van gotinan de diçû û dihat.

qumandan xelas bûn, hêj nû keysa Fesih Akan çêbû ku derdê xwe bêje. Sebebê ziyaret nekîrîna xwe û birayên xwe bi van gotinan ifade kiribû:

Wesiqe pere nakin

"Diya min, aliyeki laşê diya min Zeri Akan felc bûbû. Me ew pêşi bir Diyarbekirê. Doktorên Diyarbekirê ew hewalê Anqerê kirin. Diya min li nexweşxana "Hacetepe Tıp Fa-

"Sêsed hezar."

Lê cewaba wan dilê qumandan xweş nekîr. Qumandan bi rûçikeki tîrş û bi awirên tûj derket derve.

Li hev nekîribûn. Qumandan bi perên ku hatibû teklîf kirin qayil nebûbû.

Pêşi çavên her sê birayan ji hîşk girêdan. Dûre ji wan re gotin serê xwe berjêr bikin û berê qûna xwe bîdîn gundê xwe... Û bi qabloyên cereyanê

milên wan ên rastê bi piyên wan ên rastê ve hîşk girêdan. Dûre qabloyên cereyanê weki hevsar kirin stuyên wan. Li kêleka qereqolê girêki hebû. Her carê yek ji van her sê birayan, eskereki li piştî xwe dikir û qederê sêsed metroyan, berjor, ber bi kaş ve dibir.

"Qabloya cereyanê, dest û lingên me, û çermê stuyên me weki kêrê dibiri."

"Ma ew ne kurên welat in"

Fesih Akan bi vê gotinê dest bi qala tiştên ku hatibûn serê wan dikir:

"Piştî cara pêşin dest û lingên me û stuyên me di nav xwînê de mabûn. Em nivxerîqî, weki teli-seki vala li ber piyên qumandan ketibûn erdê. Min ji qumandan re got; em milyonekê bîdîn te, me berde. Qumandan got; zêdeke, zêdeke lê hinekî dîn ji zêdeke, wusa nabe gerek tu hineki dîn ji derkevi jor... Li vê qereqolê binihêre, ewqas esker hene li vêderê, ma ew ne kurên vi welatî ne?"

Her sê bira, ji milyonekê berjor neçûbûn. Bixwestana ji, nikaribûn ji milyonekê zêdetir bîdana. Ji ber taqeta wan hew digihîstê, qeweta wan ewqas bû.

Ji nîşka ve rê guhertin

Wê şevê, her sê birayan yek bi yek û her yeki sê caran li ser hev avêtibûn feleqê. Heta serê sibê kutaneka pîr xerab xwaribûn. Paşiyê milyoneki xwe, ku hew ewqasê wan hebû, dabûn û nivmîrî ji qereqolê derketibûn.

Her sê birayên ji gundê Zikreşê, êdi bê taqet ketibûn. Xwe avêtibûn ser rêya gundê xwe, ketibûn milên hev û meşiyabûn.

Her sê birayên rêwi, li nivê rêya gund, ji nîşka ve, niyeta xwe guhertibûn û ji dêvla gund berê xwe dabûn Malazgirtê. Mesûlên "Sağlık Ocakı" ya Malazgirtê, van her sê birayan "acilen" hewalê "Devlet hasta-

Cendeki berê, ez li mêvandariya çend nas û dostên xwe yên kevn bûm. Ev camêr û hurme êdi di nav xwe de bi Kurdi nedipeyivîn. Nepeyvîna wan li aliyeki, bi ser de, bi axaftina min a Kurdi ji tînazên xwe dikirin. Wexta ku tiştêki ji hev bixwestana digotin "ji qewli Nedertê ve" filan tiştî bide min.

Kurdi ji wan re ewqas xerib bûbû ku, wexta min hejmarên telefonê bi kurdi digot, dikenîyan, reqemên kurdi gelek komik diditin.

Ez ji we dipîrsim: Gelo kêmaniya hejmarên Kurdi ji yê Turki çî ye? Werin em bi hevdu re bîjin: Bist û çar - pêncî û pênc - şeş û neh... Kanê di van gotinan de tiştê

Kurditiya bê zîman iskeleta bê goşt e

komik çî ye? Gelo eger ji vê re "kompleksa milli" neyê gotin, wê ji çî re bê gotin? Tiştê xerab, ev Kurd ji berê ve insanên "devrimci" ne. Gelo şoreşgerî û kompleks çawa dîkarin li kêleka hev bijin?

Baş e, ez ji wan dipîrsim, Kurditiya çî ye wê çaxê? Eger zîman ji here, çî dimîne? Hun ji min bipîrsin, çend sloganên vala dimînin. Ew ji bi Turki helbet...



NEDRET BİLİCİ

Ez disa dipîrsim, eger meriv li mala xwe bi Kurdi nepeyive, çawa dikare ji dewletê mekteb û televizyona Kurdi bixwaze. Ewê dewlet nebêje "Ev çî durûti ye?"

Beri nuha bi neh-deh salan li bajarê me, Farqînê, her kesi bi zîmanê xwe dipeyivi. Ne

tenê li Farqînê, li Cizîrê, Nusêbinê, Silopiyê û gelek ciyên din... Zîmanê Turki tenê li dairên resmi û bi Turkan re dihat axaftin.

Di zarûtiya min da, eger yekî li sûkê bi dukkandariyekî re bi Turki bixafte wê dukkandari jê re weha bigota: "Lawo, ma tu ne kurê filankesê yi, ez bav û kalê te dinasim, tu bi çî rûyi bi Turki dixafî?"


Yani axaftina bi Turki şermeka mezîn bû. Wek ku meriv inkara bav û kalên xwe, rehên xwe û huviyeta xwe bike.

Heft xweli li serê "bajari" yê me yê nû be. Êdi di nav malên xwe de û bi zarûkên xwe re ji bi Turki dixafîn.

Zîman, kakilê huviyeta milli ye. Kurdê bê zîman, ji aliye huviyeta xwe ve, wek qalîkê vala ye, wek gûzeka piç e.

Kurdbûyîna bê zîman ji weki iskeleta bê goşt e. Di nav zemanekî kîn de dirîze, dibe xweli. Li ber bayê belav dibe. Wenda dibe.

JI MALAZGİRÊ.



"ÛLAN BAYRAK EZÊ DI BIN SÎYA TE DE BIMRIM". Ev hêvi, ya Qumandanê qereqola gundê Melealiya ye. Lî kuderê dîmire kêfa wi ye. Lê wê beri mîrîna xwe çend gundiyan bîkuje? Nizamettin Akan ê çenda ye?

hanesi" ya Mûşê kîrîbûn. Jî wê derê jî "acilen" wan sewqê Diyarbekirê, Nexweşxana Fakultaya Universita Dîclê kîrîbûn.

"Cih nemaye"

Lê çî heyf ku cih jî wan re li nexweşxanê "tunebû". Roja 10'ê tebaxê bû û li Diyarbekirê merasîma cenazê serokê HEP'ê yê bajarê Diyarbekirê Vedat

Aydın bû. Xelkê ku ketîbû merasîmê jî aliyê polêsan ve hatîbû gulebaran kirin.

Birindar pîr bûn. Bî sedan birindarên Kurd li vî nexweşxanê tedawî dîbûn. Jî ber vî yekê jî cihê Fesih, Nizamettin û Hacıralî nexweşxanê "tunebû".

Jî wê derê, jî bo çûyîna Nexweşxana Sigortayê wan li taksîyekê sîwar kirin. Dî wê gavê

de cibeka aidê "Alay Komutanlığı" ya Mûşê jî xwest bî taksîya her sê birindaran re refaquet bike.

Mîrîna Nizamettin Akan

Cib û taksî bî hev re jî nexweşxanê bî rê ketin. Piştî pênc deqîqan gihîştin hêla Seyrantepê û li wê derê sekinin.

Jî taksîyê dengê hewar-hewarê

bîlind dîbû. Xelkê ku vî dengî dîbîhistin li dora taksîyê kom dîbûn. Tevî xîrecîra qelebalîxê jî dengê tîlsîzekê dîhat bîhistin. Tîlsîz aidê cîba eskeran bû û jî "Alay Komutanlığı" ya Mûşê re mesajekê dîşand:

"Jî wan gundiyan dawedar Nizamettin Akan, jî ber wendakîrîna xwinê li merkeza bajarê Diyarbekirê mîr".

Qabloya cereyanê reha şahî, yanî "atar damar" a Nizamettin birribû.....

Günay Aslan



Rojname wê li Turkiyê valayîyeka mezîna dagîre. Ev destpêk jî du alîyan ve bê hed û hesab muhim e.

Yek: Ewê bibe alîkarê şikandîna tabûyan. Dudo: Ewê niyeta dewletê derxîne meydana. Ew dewleta ku jî raya gîştî ya Turkiyê û dunyê re serbestiya zîmanê kurdi îlan kirîye.

Politika zordestiya lî ser Kurdan jî avabûna Cumhuriyetê heta îro hatiye. Jî vî zordestiyê, bê guman, zerara mezîna zîman û kultura Kurdi dîtine. Pêşveçûna zîman û kultura Kurdi jî ber vî politika dijîmnanîyê hatiye sekinandin. Hatiye sekinandin, lê nehatiye wenda kirin. Ev bî saya berxwedana xelkê Kurd e. Bedelê



ALI EREN

vî jî bê hedd û hesab gran bûye. Loma, ez jî mucadela ronakbîrên Kurd re hurmetên xwe pêşkêş dikim. Gelekên wan di vî mucadelê de riskên mezîna dane ber çavên xwe.

Dunya medenî bî her awayî dîxebite ku kultur û zîmanên wendabûyî derxîne ber ro-

Bî xatîrê we maddeya 2932 û rûreşiyên dîn

nahiyê. Cumhûriyeta Turkiyê jî her tiştî dîke ku zîman û kultura Kurdi wenda bike. Darbekarên 12'ê îlona 1980'yî bî vî mexsedê madda 2932 xîstîna mewzûata qanûnê.. Dî vî rûreşiyê de qet beis nedîtin. Îdara Ozal, piştî mucadeleyeka dîr û dirêj, mecbûr ma ku vî şerma mezîna rake, yanî vî maddê iptal bike. Lê di şûna wê de hukmekî nû neanî.

ROJNAME dîxwaze, ev tiştê ku iqtidara

siyasî û parlamentoyê nîkariye biguherîne, di pratîkê de tîxe jîyanê û bî vî awayî durûtiya dewletê derxîne meydana.

Mesûlên dewletê li her derê dunyê dibêjin ku zîmanê Kurdi serbest e. Û vî derewê bî awayekî zîrek didin qebûl kirin. ROJNAME wê rastiya vî meselê derxîne ber çavên dunyê û îbat bike.

Loma derketîna ROJNAME'yê pîrseka heyatî ye. Serbestiya zîmanekî grêdayê bîkaranîna wî ye. Jî ber vî jî azadiya ku jî ROJNAME'yê re bêt naskirin, jî zîmanê Kurdi re têt naskirin.

Daxwaz û hêviya min e, ku barbariyên heta îro hatîna kirin êdî neyên tekrar kirin.

Jî pêşveçûna rojnamên Kurdi re destek xwestin heqê me ye, lê halêhazîr nebin kostek bes e. Ev daxwaz, ev hêvi heqê me ye. Ez hêvidar im, wê ROJNAME jî bo gelek rojnamên Kurdi bibe gawek hêja.

ÇAGATAY ANADOL

Xwendevanîno! Min ev nivisa xwe bî Kurdi nemivisand. Lê sernivisa wê ya bî Kurdi min nivisandiye. Ez çî bîkîm, ewqas jî destê min tê. Jî xwe Cumhuriyeta Turkiyê ew imkan nedaye ku Kurd bî xwe jî bîkarîbîn bî Kurdi bînvîsîn. Loma ez bawer im hunê lî min negirîn. Lê ez dî wê baweriyê de me, ku dî rojên pêş de Turkên ku bîkarîbîn bî Kurdi bînvîsîn jî wê hebîn. Bî vê nivisa xwe (her çiqas dilê min bar nade) ezê jî têkevîm nav rêza nivîskarên ku nivîsên wan bî zîmanekî dîn derketîne.

Ger hun bala xwe bîdînê, ez nabêjim "bî zîmanekî xerib". Çûnki Kurdi jî bo min ne zîmanekî xerib e, zîmanê bîrayên min e. Jî ber wê yekê jî ez gelek kêfxweş im ku nivisa min cara pêşî bî zîmanekî dîn derdikeve, ku ew jî Kurdiye.

Heta 1966'an min gotînekê jî bî Kurdi nî-

zanibû. Her wê salê jî ber zela Wartoyê, em grûbek hevalên universiteyê çûbûn Wartoyê. Em mehekê lî wê derê man.

Hunê nuha bibêjin ma tu fêrî Kurdi bû? Çî heyf ku tenê çend cumle. Mumkun e ku ez wan cumleyan jî çewt bînvîsîm, lê ez bawer im hevalê min ê ku vê nivîsê tercûme bike wê wan rast bike.

-Kurmancî zani?


-Kêfa te xweş e?

-Ez jî te zaf hez dikim!

Hun jî dîzanî dî 15-17 saliya xwe de, mirov mîraq dîke, ka bî zîmanên dîn "ez jî te hez dikim" çawa tê gotin. Her çendî jîyaneke me ya azad û hisî tunebû jî, lê dî bîst û yek saliya xwe de ez fêr bûm ku bî Kurdi bîkarîbîm bibêjim "ez jî te hez dikim." Lê çî heyf ku min fersend nedit ku vê cumlê jî keçeke kurd re bibêjim. Nuha jî êdî emr çû.

Belki hun mîraq bîkîn, gelo mehekê me lî Wartoyê çî dîkîr. Wê demê me hemûyan lî "Orta

Dogu Teknik Üniversitesi"yê dîxwend û pîraniya me endamên "Sosyalist Fikir Kulübü"yê bûn. Xaniyên Kurdan hîlweşiyabûn. Me jî wan re deh xaniyên du çavî ava kîrîn. Pêşî me jî beton hîmê wan çêdikîr, paşê me bî qalasên qalînd stûnên wan hazîr dikîr, jî alî hundur û derve de bî textên tenîk me nabêna van



stûnan dîgirt û dîbûn wek diwarekî ku nabêna wê vala ye. Me hînek ka tevî çamûrê dîkîr û me ev çamûra berdîda wê valayîya diwêr, dîbû wek kerpiçê. Êdî hundurê xênî germ dîbû û sar û sermayê nîkarîbû

tesîr lî hundur bîkîra. Yani bî vî awayî xwe jî sermayê dîparastîn. Lê paşê em fêr bûn ku jî sermê bêtîr,

tîşteki dîn heye ku ge-

rek meriv xwe jî bîparêze! Ew jî gulle ye. Wexta ku jî der ve bî tîfînga mawzerî gulleyekê bera diwarê xênî bîdîn, ew textên tenîk û kerpiçê dî nabêna de ku 10 santîm e qul dibe û gulle tê hundur. Jî ber wê jî Kurd dî van xaniyan de nedîman.

Vê hedisê tîşteki dîn jî nîşanî me da ku meriv nîkare plana xaniyên Kurdan lî Anqerê bîde çêkîrîn!

Xwezîka herkesî ev rastiya basît bîzanîba. Nabe ku mirov lî Anqerê jîyana Kurdan plan bike. İstîqbala wan, çî xewn û hêviyên wan plan bike.

Bî navê "Mîrov nîkare tenê bî xavyarê bîjî" romanek heye, ez bawer im ya Mario Simmel e. Çî dunyayeka bî tezat e em tê de dîjin. Pêkenîneka kurt a Kurdan heye, dî wexta xwe de bî Kurdi jî min re gotîbûn û tercûma wê jî kîrîbûn.

Kurdek lî kêleka rîyekê rake-tîye. Çend kes wî dîbîn. Lê dînihêrîn ku mîriye. Lî tûrikê wî yê xwarînê mîze dîkîn. Têde perçeyek nanê hîşk û serîyek pîvaz heye. Dîbêjin:

"Nan heye, pîvaz heye, kuro ev Kurdê hanê çîma mîriye?"

Bî vê pêkenîna xwe, Kurd rexne lî xwe dîgîrîn. Lê bî min êdî tu qîymeteke vê pêkenîne nemaye.

Çûmki Kurdan zûde fêm kîrîne ku êdî mirov nîkare tenê bî nan û pîvazê bîjî.



SONDA ZARÛKAN



Eger hun heqê min nedin, ezê bî meclîsa we de bîrîm

• Lî welatekî ku zarûk "zarûk" in, dîvê dengê xwe nekin, nelîvin, neleyîzin, nepîrsîn...

• Lî welatekî ku zarûk lî malê, lî mektebê bî disiplîna eskeran bîn terbiye kîrîn...

• Lî welatekî ku porê zarûkan wekî yê eskeran bî zorê bê kurr kîrîn û kîrasên reş, îlla reş, bî zorê lî wan bê kîrîn...

• Lî welatekî ku destên zarûkeki şeş-heft salî lî pîşt wî bê girêdan û bî zincîrê bê qefîl kîrîn...

• Lî welatekî ku zarûk eynî wekî mezinan bîkevî mahkemê û bîn ceza kîrîn...

• Lî wî welatî heqê zarûkan heye ku wekî zarûkê dî nîsmê kêlekê de bîfîkîrîn.

Kurdistan Press derket

Rojname Kurdistan Press, ku berê hefte carekê derdiket, dî dû derneketîna salekê re jî nû ve wek rojname mehîni derdikeve.

'Yukarı Mezopotamya' dibe merkeza kulturê


"Yukarı Mezopotamya Kültür Merkezi" dîxwaze hemû xebatên lî ser edebîyat û kultur û folklorê Kurdi lî merkezekê bîcivîne. Dîxwaze problemên Elfabê jî ortê rake û hînek normên standart çêke.

Berbang dibe du kovar

Berbang, ku bî Kurmancî, Dîmilî û Soranî dertê, dîxwaz bibe du kovar. Yek edebî, yek jî aktualîte.

Armanc dibe 15-rojî

Armanc, ku bî Kurmancî û Dîmilî mehekê carekê derdikeve, dîxwaz bibe ku bibe rojnameyeka 15-rojî.



●Çi heyf ku ne Demirel ne ji İnönü heta nuha icabeti daweta Apo nekirine. Ma redkirina destê aşitiyê ji kê re feyde tine?

Apo hukûmetê daweti masa aşitiyê dîke

Serokê Partiya Kakerên Kurdistanê (PKK) Abdullah Öcalan, serokwezîrê hukûmeta nû, Suleyman Demirel, daweti aşitiyê kir.

Öcalan, dîxwaze bê qeyd û şert bi hukûmetê re rûnê û bazara siyasî bike.

Abdullah Öcalan di dawîya meha buhûrî de mesajên aşitî, muzakere, lihevkarî û dialogê da gelek rojnameyan.

"Em ne terefdarê terörê ne"

Öcalan di mesajên xwe de weha dibêje: "Li meydana meseleyê heye, em dibêjin, eger hun bi xwe bawer in, werin em li ser bingeheka siyasî meselên xwe bi rîya dialogê hel bikin. Türkiye hin ji dîxwaze meselê bi terörê hel bike. Em li dîji terörê ne."

"Lê" dibêje Öcalan "Eger ew

dev ji terörê ber nedin, emê ji bi zîmanê ku ew jê fam dikin bersîva wan bîdin. Mesûlê vê ji ne em in. Ji bo ku em bi awayekî pirr insani daxwaza aşitiyê dikin."

Öcalan devam dike: "Eger Türkiye ji van teklîfên me re kerr bîmine, emê mucadela xwe ji hemû alîyan ve geş bikin."

"Em gavên samîmî istismar nakin"

Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê, dibêje ku, eger ew hukûmet bi niyeteka paqîj xwe nêzi meselê bike, emê ji vê niyetê wan istismar nekin.

Piştî bîdengiyeka dirêj Demirel da xuya kirin ku di şûna dialogê de şer dîxwaze. Radyoya Swêdê ji İnönü sebêbê bîdengiyê pîrsî. İnönü weha cewab da:

"Emê pêşî herin 'Güneydoğu'yê li xelkê guhdari bikin."

Belediya Diyarbakırê Siyabend û Xecê vedijine

Alîkarê serokê belediya Diyarbakırê, M. Emin Özdemir, di xwaze di sezona 1992'an de, piyasa Siyabend û Xecê bi Kurdî

bîne ser sahnê. Li gor xebera Yeni Ülke'yê, ewê bi alîkariya "Merkeza Mezopotamya'yê" qursên zîmanê Kurdî ji vekin.

Bozarslan 'Kurdistan'ê ji derani

Mehmet Emin Bozarslan hemû hejmarên rojname Kurdistan'ê li gel wergera wan a latîni çap kir.

Rojname Kurdistan'ê di navbera 1898-1902'an de derketibû.

Dema ku meriv dest bi merivbûyîna xwe dike û destê xwe bi kar tîne, di wê demê de û bi vê yekê re wesîta xwe ya herî muhîm zîmanê xwe bi pêş dixîne.

Ji hêla din ve, ji bo tîgîhiştina kînatê û desthilatîya li ser wê, zîman wesîteyeke wusa ye ku pê hemû daxwaz û kirînên aqil derdikeve rastê. Bi vê fonksiyona xwe, zîman bûye faktoreki wusa mezin ku meriv dikane pê nêrin, zanebûn û tecrubên xwe yê şexsî bigêhîne kesên din û her weha civakîya meriv pêk were.

Zîman, di destpêkê de wesîteyeke basî e. Lê dûre bi destpêka nîvîsê re bûye xwediyê roleke wusa ku pê civak pêşde çûne û medeniyetên cuda cuda hatine avakirinê.

Di roja îroyîn de ji, zîman, weke hêzeke civakî tî famkirinê ku pê nêzîkbûna îlmî, teknoloji û kulturê yekgirtî pêk were û bibe malê navnetewî.

Û herweha zîman nişana hîwiyeta civak û milletan e ji. Civaka ku zîmanê xwe wenda bike, nasname xwe ji û hebûna xwe ji wenda dike. Ji tarîxê wenda dibe. Civak hene ku di tarîxê de jiyane û dûre wenda bûne. Di wendabûna van civakan de tofanên şer, afetên tabîetê û nexweşiyên tîger bûne sedemên xwe yê derveyîn, lê sedema herî mezin wendabûna zîmanê wan bûye.


Bi wendabûna zîmanekî heya, kultura muştêreka cihanî ji xizan dikeve. Ji ber vê yekê ji kesên îlmîdar û dezgehên civakî sîvil, weke pîrsa navnetewî çî ji destê wan tê, ew dikin û dîxwazî ku zîmanên heya bi serbestî bijîn. Ji kîjan civaka netewî dibe bîla bibe, parastin û pêşvebirina zîmanekî, bûye wezîfa merovatiya medenî.

Ew daxwaz û kirînên ku ji bo desthilatîya yekzîmanî, ji bo dewlet an ji neteweke bi hêz, radîbe yasaxan li ser zîmanekî heya datîne, êdî meşrûbûna xwe wenda kirîye.

Herweha dezgehên kulturî yê Koma Milletan, cîvînen Konferansa Ewlekarî û Hewkariya Ewropayê (KEHE, bi Turki AGİK) û nîmaza Peymana Parisê (Paris Şartî) wusa dane xuyakirinê ku ji bo dewleteke meşrû, şertê herî muhîm ew e ku alîkariya pêşvebirina zîman û kulturê heya bike.

Ji hêla şexsî de ji ehemîyeta zîmên mezin e. Pêşveçûna jirî û zîrekiya meriv, tenê bi hinbûn û hinkirina zîmanê dayikê dibe. Ev tîştê ha rastîyek e û bi awakî îlmî hatiye îspatkirinê. Hemû pîsporên hindariyê, psiokolog û hekim li gor vî rastîyê dibêjin ku ji bo pêşdeçûna meriv, bi kêmanî hinkirin û hinbûna dibîstana pêşî divê bi zîmanê dayikê be. Ji ber vî yekê li dewletên Ewropî, bi baldarî li ser zîmanên civakên cuda cuda û li ser zîmanên zarokên mul-

TARIK ZIYA EKİNCİ



Hin ditinên li ser zîman û 'yasak' a Kurdî

tecîyan dîsekinin ku ew di dewra dibîstana pêşî de xwendina xwe bi zîmanê dayika xwe bikin.

Lê ev 70 salên politîka Turkiyê ye ku ji bo avakirina dewleteke yekzîman û yeknetewî, ji bîlî Turkiyê yîvîna bi zîmanekî din û nexasî ji peyivîna û pêşvebirina zîmanê Kurdî yasax e.

Dem dem bi rîya qanûnê hînek guhertin bûne, lê yasaxa li ser zîmanê Kurdî her berdewam bûye. Ev politîka dewletê, ya ku naxwaze Kurdî bibe zîmanê hinbûn û hinkirinê, bi tehdîta cezakirinê naxwaze were xwendin û nîvîsandinê û bibe zîmanê weşandinê, bî guhertin hin îro ji dewam dike.

Li Kurdistanê, di salên 1930'yî de, di kuçên bajêr de û li bazarê ji peyivîna bi Kurdî yasax bû. Bi çewtî bûya ji yê ku bi Kurdî bîpeyivîya, weke ceza 25 qurîş perê bronzi ji wan

dîgirtin. Ku were bîra meriv û meriv bîzanîbe di wan rojan de li Licê barekî êzîngan bi 5 qurîşan bû, wê çaxê merivê baş fam bike bî ji bo gundiye-ki xîzan ev perê ha çî cezayekî giran bû.

Dema meriv li ser zîman difikire, bîvê nevwê ew rojên buhûrî bi êş û azara xwe tî bîra meriv. Di wan salan de li Licê tenê dibîstaneke pêşî hebû. Xwendekarê wê kêr hebûn û ez ji yekî weke wan bi şans bûm ku diçûm dibîstanê. Ji ber ku min piçêki Turki dîzanibû, di navbera min û wan de ferqek hebû. Dema ku gundiye- yê me yê nas tîştên xw: dîhanî fîrotinê an ji karekî wan bi dayîrên dewletê diketin, berê dîhatin ba me û wan ez bi xwe re dibîrîn. Wezîfa min ew bû ku ew merivên ha li cezayekê weha asê nebin û bi sîlametî vegerin. Rojên ku min ew wezîfa xwe bi cî dîhani, ez bextiyar dibûm; lê dema ku ez bi ser ne diketim, tev gundiyan ez ji dêşiyam û nerîhet dibûm.

Ji bo ku nîkanîbûn bi pozbîlîndên esnafên bajîrî re bîpeyivîna, tîştên wan bi awakî gelekî erzan ji dest wan derdiket û min ji nêzîk ve ew bextreşîya êşa gundiyan dît. Bêçaretî, rebentî û êşa merivên ku zîmanê diya wan yasax bûye, min bi çavên xwe dîtîye. Ev dîrameke merovatiyê bû. Tarîx tu carî rastî dewleteke din nehatiye ku ew dewleta rabe hemwelatîyên xwe bi dîrameke weha bîde jiyandin.

Ci heyf e ku ew drama ha li ber devê sedsala 21'an ji hin dewam dike. Gundiye- yê Kurd yê ku ji bîlî Kurdî bi tu zîmanekî din nîzanîna, di dayîrên dewletê de, di adliyê de, li eskeriyê û di qereqolan de vî drama mezin dîjin. Rebenên gundiye- yê Kurd ji bo zîmanê xwe tîne şikandin, peyv li ruyên wan dikevin, ji vîr û wîr de neheqî lê dibîna. Û ew êşa wan wê weke rûreşîyeke Turkiyê her tîm li pêşberî me bîsekîne.

Lî ber devê sedsala 21'an ji ew kadroyên siyasî yê ku vî dramê bi gundiye- yê Kurd dîdîna jiyandin û dûre qala demokrasî, mafên merovati û medeniyetê dikin, ew ê di jiyana demokrasîya Turkiyê de weke xezebeke rêş her tîm bi bir werin.

Divê meriv ji bir neke, ku heta bi milyonan Kurd li welatê xwe bi serbestî zîmanê xwe bi kar neyînin, li Turkiyê ji ne demokrasî, ne mafê merovati û ne ji medeniyet dibe. Û di Turkiyê weha de ji tu rewşenbîrek nîkane bîbêje ez serbest im.

Cehennema me ya rastin lı vêderê ye

Zebaniyên
me ji Qatil,
Vampir,
Adolf û
Gestapo ne

Beriya destpêkirinê
dixwazim bêjim ku
tiştên ez lı vêderê
dinivisim, yan hatine
serê min bi xwe yan ji
hatine serê hevalên
min û min ew tişt bi
çavên xwe ditine.

Gava ku em ji nezaretê
deranin û birin odayeka
zindanê, qerdiyanên dest-
bî çolî dora me doş dibûn.
Mina ku lı hêviya me bûn.
Dema ku navên me qeyd
dikirin, qerdiyan û leşker
lı dora me her zêde dibûn.

Dema navê min xwen-
dîn, min got: "Fermo ez-
beni". Mina ku min goti-
neke gelek bê usûl gotibe
qerdiyan û leşker lı min
kom bûn. Bî jop û zinci-
ran ez lı erdê pij kırım.
Pîştî qeydkirina navan
qerdiyaneki ji me re got:
"Yeko-yeko birêz bin!"
Em ji bûn!... Wê gavê qer-
diyaneki dest bî axaftinê
kır:

– Wexta ku hun bimeşin,
hun dê lı rast û çepê xwe
nenihêrin. Axaftin qedex-
ye. Serirakirin, rêzakeri-
rîn qedex ye. Wexta ku
hun bimeşin gerek çokên
we lı singên we bikevin, ji
lingên we ji gerek yek deng
derkeve. Hun tê gihîştin?!

Derpiyên me ji me kırım

Lı ser gotina wi em bî
dengeki qêriyan:

– Belê me fam kır.

Lê qerdiyanên lı dora
me bî hevûdın re kenin û
gotin:

– Evana nabın meriv.
Ancax lêdan dikare wan
bîke meriv.



"Lı vêderê laşên me bî saxi dişewitandin. Bî me miz
dîdan vexwarin. Mîşkên mîrar û gû dîdan xwarin."

HEFSA DIYARBEKİRÊ. Diyarbekir êdî ne bî kela xwe, bî zindana xwe tê nasin. Û ne tenê lı welatê me, lı hemû welatên dunyê...

Seri lı me teva geriyabû.
Me çî dîkir, û çî dîgot xêra
wê tîne bû. Wana her êriş-
tanin ser me. Dawi me
biryar da ku em qet neaxi-
fîn, lê wê ji xêr nekir. Em
kırin yek-rêz û birin.

Paşê lı ber diwareki em
rawestandın û berê me
dane diwêr. Wan çî bigo-
ta me wusa dîkir. Du ser-
leş-ker hatin ji me re gotin
ku "kincên xwe derxinin,
deynin ber xwe." Me teva
cılên xwe derxistin danin
ber xwe. Em şilfî tazi lı
ber diwêr rawesti man.

Çendekan ji me nexwest
derpiyên xwe derinin, lê
ewan bî lêdan û zorê der-
piyên me ji me kırım. Lı ser
daxwaza serleşkereki
qerdiyanan kincên me
saxti kırin û tev çirandin
avêtin wir. Dî dî re qerdi-
yaneki ji serleşkereki pîr-
si:

– Femandarê min, ma
em muyên wan kur ne-
kin?

– Erê, neha wextê kurkî-

rînê ye.

Me dît ku dî dest qerdi-
yaneki de şûşeyeka ispir-
to, dî dest yeki de darek
paçek lê lefandi û dî dest
yekî dî de ji kûpê agirve-
mîrinê heye. Ber bî me ve
hatin. Serbaz got:

– Berzik û binçengên
wan kontrol bikin. Bira
herkes milên xwe bilind
bike.

Laşên me sax sax dişewitandin

Me teva milên xwe bi-
lind kırin. Ji yê pêşin dest
pê kırin. Xwediyê şûşeya
ispirto dihat ispirto bî ser
laşê me dadikir. Xwediyê
paçê paçê xwe vedixist û
agir berdida laşên me.
Xwediyê kûpê agir ji agirê
laşê me vedimîrand.

Yek bî yek em hemi
wusa kırin. Laşên me sax
sax dişewitin. Dî wê nav-
bênê de ji yê ku dîgriya
an diqêriya jop, çolî zin-
cir dixwarin.

Cara pêşin dema me hin

"yedeke subay" dîtın hine-
ki dilê me şa bû. Ji ber ku
ewana ne malê ordiyê bûn.
Me dî dilên xwe de dîgot
qe nebe, dê disan hineki
mîrovperweri lı ba wan
hebe.

Lê çî fêde! Ew ji herkesi
hovtir û xeddartir bûn.

Serbazeki qelew dî des-
tê wi de dareki dirêj, qa-
lind bersitûka wi vekiri
mina serxoşan, çend ca-
ran dî ber me re çû û hat,
paşê ziviri ser leşkeran û ji
wan re got:

– Zarokno, kurkırin qe-
diya. Nuha dora serşuştinê
ye. Cihê serşuştinê hazir e?

Serên me dixistin nav pisiya lexemê

Me nizanibû serşuştin çî
ye. Lê wexta em birin wi
cihi me fam kır...Lı qata
yekemin hucreyên 8,9 û
10'an ji av û pisiya tuwa-
letê tiji kırîbûn. Em xistin
nav vê pisiyê.

Meha sibatê bû. Dunya

geleki sar bû. Wusa lı wê
navê em dî cihê xwe de ji
serma dirikrîkin û ew ava
pis ji laşê me dinuquti erdê,
erd pis dîkir. Hawir dora
me pisiya insên bû.

Carekê ji nîşka ve deri
vêbûn û bî dehan qerdi-
yan derbasi hundir bûn.
Dî destên wan de jop,
çoyên dirêj û qalind, zin-
cir û şişên hesini hebûn.
Her serê girtiyeki ji me sê-
çar qerdiyan û leşker di-
ketin.

Lı me kom bûn. Çep û
rast lı bin guhên me dixis-
tîn. Me nema karibû raba
ser xwe an rûnişt.

Ji êşan em tev dinaliyan

Dî dî re kûçikan anin
berdan me. Kûçikan laşê
me tev birin, û dî xwinê de
hiştin. Em hemû niv-miri
lı erdê dirêjkirî dinaliyan.

Dilê wan bî vê ji hênik
nebû. Macûnên me yên
dîranan û merhemên me
yên rûkur-kırinê anin dî

laşên me yên birindar dan
û bî tiqe-tiq dîkenin.

Dû re bî çepilên me gir-
tîn, bî dî xwe re em
kışkışandin. Û em hemi lı
ser hev avêtin hucreyekê.

Ev hucre ji bo şexseki
bû. Lê em 24 kes bûn. Em
gîşan lı wêderê avêtin ser
hev. Ji ber ku laşên me
teva tiji birin bûn her ku
laşên me digihan hevûdın
birinên me dijenin.

Ji êşan em tev diqêriyan
û dinaliyan. Vêderê dogeh
û qerdiyan û leşker ji ze-
baniyên me bûn.

Ji bo ku qerdiyan neyên
naskirin navên ku lı xwe
dikirin geleki balkêş in.
Wekû misal: Gestapo,
Adolf, İdîamin, Qatil,
Qesap, Vampir, Cınawir
û her weki dîn.



Nayif
Kurt

Sed milyon zarûk nıkarın herin mektebê

Lı dunyê ji sed milyoni
zêdetir zarûk imkana
xwendinê nabinin. Dî
destpêka konferansa "Lı
Rojhilata Başûrê Asyayê

Xwendin" de, yek ji me-
sûlên UNESCO'yê, Fe-
derico Mayor, di axaftina
xwe de got ku, nuha lı
dunyê ji 100 milyoni zê-

detir zarûk nıkarın herin
mektebê. Lı gori Mayor,
her çiqas hejmara zarû-
kên ku diçin mektebê sal
bî sal zêdetir dibe ji, hê ji

rewşa xwendina zarûkan
pîrr xerab e. Lı welatên
dunya sîsiyan ji sed insa-
ni bî tenê penci dıkarin
bixwinin û bınivisin.

Turkan 4 seet kê mî dîtın

Hukûmeta Bûlgaristanê lı
mekteban xwendina Tur-
ki serbest kır. Lê nivê Tur-
kên Bûlgaristanê, ji ber ku
bî çar seetan qayıl nebûn

zarûkên xwe neşandin
mekteban. Ji Turkên Bûl-
garistanê gelek dî 18'ê
ilonê de dest bî boykotê
kırin.

İşkence çawa tedawi dibe?

Rojna-
mê ji
pîsporan
pîrsi

İşkence dî bedena meriv de brînên kûr vedike. Brînên fiziki û psikolojik...

Xwediyên van brînan, pîrê caran merivên me, hevalên me, ciranên me ne.

Gelo ev brîndar çiqas dîkarin bî xwe brînên xwe derman bikin? Gelo tedawiya brînên îşkencê mumkun e?

Ez jî bo cewaba van pîrsan dîçim cem du doçentan. Navê yekî Sten Jakobsson e. Swêdi ye. Yê din psikolog û doçentê Danmarkî Peter Sondergaard e. Herdu jî tedawiya brîndarên îşkencê dîkin. Herdu jî lî hemû welatan tînan nasin.

Heta nûha jî 24 welatan 250 multeciyan siyasi tedawi kirine: Peter Sondergaard derheqê wan de weha dibêje:


– Dinê wan, kultura wan û rengê wan çawa dibe bîla bibe, di nav wan de homojeniyek heye. Lê xusûsiyetên wan ên cihê jî hene. Mesela jîneka Kurd yan Turk nîkare zûbîzû qala tecawuzê bike.

Ji bo tedawiye reçeteka hazır tune

Ji bo tedawiya psikolojik diyalog şert e. Yanî gerek nexweş bipeyive. Vebibe. Yan na tedawi ne mumkun e. Baş e, peyv çawa dest pê dike? Peter Sondergaard:

– Jî bo vê reçeteka hazır tune. Lî gor her kesî stratejîka xusûsi lazîm e. Eger lingê yekî yan gurçîka wî biêşe meriv dîkare bî emeliyatê jêke û bavêje. Lê meriv nîkare brîndarên îşkencê bî emeliyatê rehet bike.

– Berî her tiştî gerek baweriyek xurt di nav me û nexweş de çêbibe. Gerek em şanidîn ku emê heta dawiyê lê guhdari



PISPORÊN İŞKENCÊ. Rojnamê bî herdu doçentên Skandinavi, Sten Jakobsson (lî milê çepê) û Peter Sondergaard (lî milê rastê) re lî ser tedawiya îşkencê peyivî.



“Eger lingê yekî yan gurçîka wî biêşe meriv dîkare bî emeliyatê jêke û bavêje. Lê meriv nîkare brîndarên îşkencê bî emeliyatê rehet bike”

bîkin. Tedawi zemankî gelek dirêj dajo. Jî ber ku îşkence şexsiyeta meriv serûbin dike. Jî xwe mexseda îşkencekaran jî ev e. Sondergaard dibêje nexweşiyên di dû îşkencê re ev in:

Kabûs ditîn, xweydan, bihtengi, bédengi, şermokî, bêxewî, fobî, şikdari, bêtaqetî, laliya psikolojik û qelsiya hafîzayê.

birînên îşkencê wekî alerjiyê ne

Doçent Jakobsson, ku tedawiya fiziki û psikolojik bî hev re dike, tîkîliya van herdu tedawiyan weha îzah dike:

– Westê ez penisê mêreki, yan jî rehîma jînekê muayene dikim û jî wan re dibêjim “hun dîkarin bîbin xwedî zarû”, ew jî aliyê psikolojik ve kêfxweş û azad dibin.

– Yanî birînên îşkencê wekî alerjiyê ne. Meriv pê nîzane wê kengê derên meydanê. Yanî tu garantiya başbûnê tune. Lê gelek kes bî xêra dostan jî, dîbin xwediyê jiyaneka normal. Çayvexwarîna bî du-sê hevalan re dîkare bîbe sebebê pêşveçûnên mezin.

Kesên xwediyê şûûra siyasi zûtîr tedawi dîbin. Zûtîr radîbin ser lingên xwe. Ew dîkarin bî çavê “evdal”, “reben”, “hêsir” û “sadîst”an lî îşken-cekaran mîzekin.

Doçent Jakobsson derheqê nexweşên Kurd gelek tiştan dizane û pîr ber dikeve ku hêj lî Diyarbekirê merkezeka tedawiye nehatiye ava kirin. Eger inisiyativeka wusa çêbibe, sozê “alîkariyê” dide. Di heqê Kurdistanê Turkiyê de weha dibêje:

– Lî wêderê metodên îşkencê pîr pêş de ketin e. Em zanîn ku doktor jî, yanî meslekdaşên me jî, alîkariya îşkencekaran dîkin. Westê em jî nexweşên xwe dibîhîzin dilê me lî hev dikeve.

“Lî Turkiyê du rejîm hene”

– Me navên gelek îşken-cekaran tesbît kirîye û lî Londonê lî merkezêkê cîvandiye. Dî nêzik de emê gelek tiştan teşhîr bîkin.

Jakobsson lî ser hukûmeta Turk jî weha dibêje:

– Tiştên ku hukûmet dibêje û tiştên ku polês û esker lî Kurdistanê dîkin qet lî hev nakin. Wusa xuya ye ku lî Turkiyê du rejîm hene.

Ez jî herdu doçentan pîrsa xwe ya dawî dikim: Gelo mesleka wan lî jiyanê wan a şexsî tesîreka

çawa dike? Pêşî Sondergaard cewab dide:

“Zarûkên min bî min îftîxar dîkin”

– Ez carîna hêviyên xwe hemûyan wenda dikim, dunyayê reş û tari dibînim. Lê westê ku ez dibînim nexweşek bî her awayî derbasî jiyaneka normal bûye, wê çaxê dunya hemû dibe malê min.

Jakobsson jî dibêje: – Zarûkên min û jîna min pîr gazînan dîkin. Jî ber ku ez nîkarim jî wan re west veqetînim. Lê ez dizanim, ku di dilê xwe de bî min îftîxar dîkin.



Ali Coşar

Derneka Xêrxwazên Qereqolê

Lî Sêregê “Komela (dernek) Tamirkirin, Malzeme Peydekirin û Çêkirina Qereqolan” hat damezirandin. Xelkê Sêregê navê vê teşebbûsê daniye “Komela Yagciyan” Mîmarê vê komelê, reisê eşîreta Agaçxanê İzzet Ozagaçhanlı ye. Mêrik him axa ye him jî “Korucubaşı” ye.

Jî Yenî Ülke’yê re dibêje, armanca me, “jî aliyê tamir û malzeme peydekirinê ve jî qereqolên muduriyeta emniyeta Sêregê re xîzmet kirin e.”

İzmîrî hevdu berdîdî

Jî ber sebebên şerên daimî, zîna, terk û muameleyên xerab roj bî roj hejmara jin û mêrên ku hevûdu berdîdî zêde dibe. Dî warê berdanê de bajarê ku serî dîkîşîne İzmir e. Pîştî İzmirê Konya tê. Lî gorî reşmên “Devlet İstatistik Enstitüsü”yê hejmara daweyên berdanê, par 25 356 bû.

“Aydın”an 200 milyon zerar kirin

Mumessilê Fîrotîna Malzemên Tîbbî, yanî şîrketa Eray 200 milyon LT (Lîrayê Turkiyê) zerar kir. Xwediyên şîrketa merivên Wedat Aydın in. Lî gor xwediyên şîrketa, pîştî kuştîna Wedat Aydın şîrketa ku jî wan re mal dîşandin bî carekê, bê sebeb û bê mazeret êdî mal neşandin.

6 800 telebeyên kerr û lal

Lî 33 mektebên ker û lalan 6 800 xwendevan dîxwin. Bajarên ku mektebên ker û lalan lê hene ev in: Adana, Afyon-Bolvadin, Ankara, Bursa, Çanakkale, Gelibolu, Denizli, Diyarbakır, Erzurum, Eskişehir, Antab, Gümüşhane, İçel, İstanbul, İzmir, Kastamonu, Kayseri, Kocaeli, Konya, Meletye, Nigde, Rize, Samsun, Sêwas û Wan.

Beşikçi cara hefta hefsê 'ziyaret' kîr



Foto: ANDERS FORSSTROM

EWÊ TC KENGÊ DEV JI BEŞİKÇİ BERDE? Kanên sozên we, Silêman beg û Erdal beg? Kanê azadiya birûbaweriyê?

İsmail Beşikçi jî ber kîteba xwe ya "Kürtlerin Mecburi İskanı" cara duduya hat girtin. Jî bo Beşikçi 5 sal hefs û 100 milyon cezayê peran tê xwestin. Beşikçi, jî emrê xwe yê 52 salî, 11 sal di zindanan de derbas kiriye.

Bî emrê sawciyê DGM'a Anqerê, polêsan di 07.00 ê serê sibê de Beşikçi jî

-11 sal hefs, 7 girtin, 26 dawê

mala wî birin. Dî mahkemê de sawci lî gor "Qanûna Anti-terorê" qerara girtina wî da û wî şand "Ankara Merkez Kapalı Cezaevi" yê.

Jî bo "sûc"eki du car ceza

Jî bo eyni kîtebê Beşikçi dî sala 1978'an de hatibû girtin, sal û niv ceza xwaribû û cezayê xwe jî

kışandibû. Avûqatê İsmail Beşikçi Serhat Bucak lî ser vê yekê jî rojnaman re weha dibêje: "Eger kîteb nîvisandin sûc be, meriv jî vî sûci carekê ceza digre. Cara duduyan jî bo eyni tiştî girtina Beşikçi şerme-ka pîrr mezin e."

İsmail Beşikçi jî sala 1972'yan vir de tam 7 caran hatiye girtin. Jî bo kîtebên wî, nîvisên wî û

heta bigihîje jî bo mektûbên wî heta nuha di heqê wî de 26 car dawê vebûne. Jî van daweyan 8 heb hê jî dewam dikin.

Dî şûna 142'yan de Qanûna anti-terorê

İsmail Beşikçi kîteba xwe ya bî navê "Kürtlerin Mecburi İskanı" dî 1977'an de nîvisandibû. Salek pişt re jî bo vê kîtebê

lî gor qanûna 142'yan hatibû girtin û sal û niv ceza xwaribû. Weki tê zanin, ev madde û madda 141'an di meha Nisanê de rabûn. Lê di şûna wan de "Qanûna Anti-terorê" hat danîn. Lî gor vê qanûna nû sawciyên DGM'ê xwestin disa jî nû ve Beşikçi ceza bikin. Lê bî ser neketin. Jî ber ku qanûn izin nadin meriv jî bo "sûc"eki du caran ceza bide yeki, loma Beşikçi tahliye kîrin.

Ömer Okumuş

●Ewê eskerî çiqas kîr bibe? Herkes lî benda qerara hukûmetê ye.

Eskerî çiqas kîr dibe?

Hukumeta nû di-xwaze eskeriyê kîr bike. Dî protokola hukûmeta koalîsyonê de lî ser mesele eskeriyê tenê bî yek cumlekê tê gotin ku wê zemanê eskeriyê bê kîr kîrin. Jî hêla din ve Mebûsê ANAP'ê Yücel Seçkiner jî bo kîr kîrîna eskeriyê kanûneka nû teklîf kîr.

Lî gori teklîfa Seçkiner eskeriya ku 18 meh e gerek bibe 15 meh, ya ku 16 meh e bibe 12 meh, ya ku 8 meh e bibe 4 meh. Jî bo ew kesên ku bî dowîz eskerî dikin, mehek bes tê ditin.

Jî xeynî vana Seçkiner dixwaze, ew kesên ku lî derveyê welêt dijîn û yên ku wextê eskeriya wan buhuriye jî bo carekî bî efû kîrin.

Goşt derket 31 hezari

Jî ber nexweşiya we-bayê, ku lî goştê ga û mangeyan geriyabû, fiyeta goşt meha buhuri zêde bû. Kiloya qime û goştê nerme derket 31 hezari.

Kiloya qime meha berî wê bî 29 hezaran bû. Ev fiyet lî gor qesabên İstenbolê ne. Lî bajarên Kurdistanê jî, lî gor ci, fiyet jî 24 hezaran heta 30 heza-

ri diguhure. Piştî ku tîrsa nexweşiya webaya dewaran di nav xelkê de belav bû teleb jî goştê pez re zêde bû û fiyet bilind bûn.

Nisk jî % 10 buha bûn

Jî kengê de ye ku fiyeta nisk û fasûlyan jî ciyê xwe nedilîvi. Lê di meha buhuri de wan jî jî zemê qismetê girtin. Fiyeta wan jî sedî deh zêde bû. Her ku serma

zêde dibe xelk bêtir lî nisk û fasûlyan digere. Lî gor esnafan, nisk û fasûlyên ku halê hazir lî piyasê hene tîra teleba xelkê nakin. Yani bî gotineka din isal jî

bî qasî xwarîna xelkê istihsalî nisk û fasûlyan nebûye. Loma jî ber bî zivistanê ve dibe ku fiyeta nisk û fasûlyan hin jî buha bîbin.



Sebze û meywe bûn agir

Dî meha çûyi de meywe û sebze dî zemê de seri kışandin. Dî nav xwarinan de yên ku herî pirr zem hatin ser ev in: Meywe, sebze, beqliyat, penêr, zeytûn, goşt, arvan, maqarne, birinc û rûn.

Sebebê zêdebûna fiyeta meywe û sebze, jî nû ve destpêkirina ixracata van malan e.

Zemê serê mudur xwar

Hetta mehek berê jî ixracata meywe û sebze sekinandi dihat hesibandin. Sebebê vê yekê jî kriza Kuweytê û ambargoya ku jî aliyê Koma Milletan (KM) ve li hember Iraqê hatibû danin e. Piştî ku KM jî aliyê hin xwarin û dermanan ve ambargoyê sist kir, ixracata xwarinê jî dest pê kir.

Çendeki berê mudurê Tüpraşê jî sedî 18 zam anibû ser maddên petrolê. Li ser vê yekê fiyeta tupên 12 kilo jî 27 500 LT (lirayên Turk) derketibû 33 hezari.

Her kes li benda hukûmeta nû ye

Hukûmeta Mesut Yılmaz jî ber vê yekê mudurê Tüpraşê Mehmet Savran jî wezîfê avêtibû û vê zemê dabû sekinandin. Lê mudurê ku hat şûnê jî mecbûr ma ku jî sedî deh zem bine ser tupên gazê.

Vê carê fiyeta tupên gazê jî 33 hezari daket 31 hezari.

Tiştê ku hat serê mudurê Tüpraşê hat serê mudurê fabriqên şekir, Ertan Yülek jî. Jî ber ku wi ji, jî sedî 20 zem anibû ser şekir. Zema şekir jî paş de hat sitandin. Nuha herkes li benda qerarê hukûmeta nû ye.

Fiyeta rûnê nivişk daket

Dî meha deh û yanzdan de fiyeta hemû maddên xwarinê bilind bû. Bî tenê fiyeta rûnê nivişk û kartolan jî % 2 daket.

Sinorê feqiriyê bilind bû

Jî bo maleka xwediyê şeş zarûkan hatina asgarî li gor meha dehan 16. 899 LT zêde bû, derket 1.4 milyoni.

Mêjiyên azad durûti nakin

Hedisên van 3-4 mehên dawin careka dîn şanidan ku heqên insanî, ên xelkan, ên milletan û azadiya birûbaweriyê çiqas hîşk bî hevdu ve girêdayî ne. Bê guman zindana herî xerab ew zindan e ku dî mêjiyê insanî de ava bûye.

Tarixa resmi weki diwareki kevnepereşt e. Yên ku dîkarin serbest bifikirin, ên ku dîkarin xwe dirêji xeyalan bikin, ên ku teslimê pragmatizmê nabî, dibe ku iro jî aliyê hinekan ve weki donkişotên çaxa me bînin. Lê kesên ku wi diwarê tarixa resmi hilweşînin jî ev kes in.

Jî ber vê yekê, ew kesên ku jî xwe re dibêjin em sosyalist in, em demokrat in, em heqên insanî diparêzin, divê careka dîn rûnê û kûr kûr bifikirin, xwe mahkeme bikin.

Ev cara çendan e ku sinor tê ihlal kirin? Êdi em nikarin bihejmêrin. Çima ronakbîrên Turk bê deng in. Ew kesên ku heqên insanî diparêzin, ew kesên ku li ser heqên insanî bûne pîspor (uzman) çima hê jî kerr in û bî bédengiya xwe piştî dewletê digirin?

Baroyên ku hene, çima li gori qaidên huqûqê li vê yekê rexne (eleştiri) nagirin? Ew kesên ku bî navê "Pîrsên Heqên İnsanî" kîtaban nivisandine, çima nikarin teşebbûsa qir kirina xelkeki teşîr bikin? Ronakbîrê Turk İsmail Beşikçi, çima dî vê meselê de bî tenê dimîne?

Ev ronakbîrên ku li gori fikra "nizama nû" ya Amerika, "dî hinek şertan de heqê tayîn kirina qedera milletan" diparastin, çî qewimî gelo ku hema jî nişka ve fikirên xwe terk kirin? Û disa bî dewletê re dengê xwe kirin yek.

Ev ronakbîr çî zû bûn dergevanên fikra "hakimiyeta millî". Ew fikra ku pê li sinoran dike, tu heq û huqûqên dewletan û tu peymanên (muahede) enternasyonal nas nake.

Belavoka 95 ronakbîran jî tam li zemaneki weha rast hat. Ev yek tesaduf e gelo? Yan dixwazî bî ideolojiya resmi ya nivmîrî li fikra hakimiyeta millî xwedî derkevin? Divê em (gerek) neheqî nekin. Fikrên belavokê, jî bo hin kesên ku li binê belavokê imza xwe danibûn gaveka pêş de ye. Lê disa jî em nikarin tenê li pêşveçûna van şexsan binihêrin û kêfa xwe jî belavokê re binin. Tam dî wexteki ku sinor tê ihlal kirin de ev belavok derket. Hin aliyên fikra hakimiyeta millî ya Turkan bî vê belevokê hatin veşartin. Ev rewş munaqesha nav marksîstan û Bruno Bouer, ya 150 sal berê, tine bira meriv. Li hember kesên ku heqên Cihûyan (Yahûdî) diparastin Bouer digot, "şexsî ne bî serê xwe, ancax bî xêra civatê hene". Û Bouer dewam dikir, "loma pîrsên Cihûyan jî divê bî pîrsên hemû insanên dunyê re bî helkîrîn. Cihû ne jî civata bûrjûva ne û heqê wan tune ku bîbin perçeyek jî wan."

Meriv dikare Murat Belge weki hevaleki nû yê Bouer bîbine. Tu li wê ecêbê mêzeke, em jî kuderê hatin kuderê? Hun dibînin, fikrên ku behsa nizamên nû dikin, çî bî tesîr derketin.

Van 95 ronakbîrên me dî şûna belavokeka weha de, bîla belavokekê, li hember van kesên ku êrişê Zana û Dicle dikin, binivisandana. Du kurdan xwestin sonda şoven a meclîsê ku biratiya xelkan înkâr dike jî dîl venexwin. "Pêşverû" û "paşverû" yên Turk weki ku ittifaqeka millî kiribin bî ser wan herdu kurdan ve çûn. Hinekan çêr kirin, hinekan sitem kirin, hinekan jî xwestin bî şîretan wan biçûk bixin.

Halbuki eyî kes bî daxwazên Turkên Bûlgarîstanê û Yunanîstanê pîr kêfxweş dibûn. Em sondekê li aliyeki bîhêlin, Turkên van deran dî partiyên xwe de, bî huwîyeta xwe ya Turk weki mebûs ketin meclîsê û disa doza nivekariya hukûmetê kirin. Çima gava dor tê mesela Kurd demokratbûnê jî bir dikin?


Ez dixwazim li ser meseleyeka dî jî hineki bisekinim. Belki pariyeki dûrî mewzûyê xuya bike, lê dî esasê xwe de girêdayê vê meselê ye. Wextê nivîskarên Kemalist jî Cumhuriyet'ê veqetîyan hinek ronakbîran dest bî boykotê kirin. Dî nav wan de hinek nav hene ku me jî wan re hurmet dikir.

Wexta ku rojnama Cumhuriyetê, bî alikariya van nivîskarên Kemalist dî mesela kurdan de politika dewletê dimeşand; wexta ku Cumhuriyetê dî "İHD Genel Kurulu" yê de, bî kurmancîaxaftina Vedat Aydın, weki hereketeki tehrîkar qebûl kir; wexta ku li ser qetliama Çevrimli'yê xeberên nerast nivîsand, ev nivîskar li ku bûn, çima Cumhuriyet'ê boykot nekirin?

Bî dîtina me ev boykot tepkiyeka hîssî û vala ye. Ev tepki wê bî tenê li ber dîlê tarixa resmi şêrin were. Ev boykot jî şexsan re, jî heqên insanî re, jî heqên xelkan re ka çî tine?

Em ancax belki bî fêkiyên mêjiyên ku xwe jî zindanan fîltandine bîkaribin tameki bîdî xeyalên xwe yên rindîk. Dî vê riyê de çiqas acîzî û kul û derd hebin bîla hebin, xem nake.

Belki em bî xêra mêjiyên bêsinor û bê qereqol bîkaribin bîgîhîjîn tama xweşîkariya utopîyan. Her çiqas ev bî kul û derd be jî...



ERCAN KANAR
Serokê İHD'ya İstebolê

Xani disa buha dîbîn

Kirêya xaniyan li pêşîya enflosyanê baz dide. Jî xwe kirêya xaniyan bî enflosyanê re bilind dibe, lê vê carê li gor texmînan dî zemaneki nêzik de, jî xeynî tesîra enflosyanê, wê kirêya xaniyan dî carekê de jî sedî pênçî bilind bibe.

Wusa xuya ye dî rojên pêş de "kirêçî" û xwediyên xaniyan wê disa bîkevin qirika hev.

Li Diyarbekirê nuha dî kirêya xaniyan de sinorê herî bîni 300 hezar e. Lê ev reqem bî tenê jî bo taxên weki Mêrgeahmedê derbas dibe. Jî hêla dînan ve li

taxên weki Ofîsê Êdî xaniyekî bî niv milyoni jî nayê dîtin. Weki kirê, dî fiyeta xaniyan de jî li Diyarbekirê li gori şêklê xani, li gori cî ferqeka pîr mezî heye. Li dora Mêrgeahmedê belki hê jî xaniyekî bî 35 milyoni bî sitandin, lê li Ofîsê ev fiyet jî 100

milyoni dest pê dîke. Halê hazîr li Mêrgeahmedê meriv dikare xaniyekî mukemmel bî 100 milyoni bistîne.

Lê li gori mûtehidan hîm kiriyên xaniyan hum jî fiyetên xaniyan heta serê salê wê jî sedî pênçî zêde bîbin.

'Wedat zanibû wê bê kuştin'

"Ez hê ji bawer nakim. Meh derbas bûne, lê ji min re hê jî wek xewnekê tê. Zû mir. Pîrr zû. Insaneki weha heqê wi tunebû ewqas zû bimir." "

"...Dilê min bar nade ez bêjim; ew çû, wê bi hezaran werin. Ne wusa ye. Wedat yek bû, Neco yek bû, Muhterem yek bû. Di mîrxasiyê de, di nefspîçûkiyê de, di camêri û durustiyê de dirûvê wan pîrr bi hevdu diket."

Gotin ji devê Wehbi Aydın hêdi û hebo hebo dertên. Bi her gotinekê re qermûçekên êşê li eniyê belav dibin. Bi her bihndayinekê re keserekê dikişine. Carina berê xwe ji min dizivirine, wenda dibe. Ez çaya wi ya sar nû dikim. Bihnekê vedigere rastiyê, lê disa diçe.

Her gotinek ji birinekê dadiweribe

Hindik dipeyive, lê ji kezebê dipeyive. Weki ku her gotinek di zikê wi de girêkeka êşê bibişkêfe... Weki ku her gotinek ji birinekê daveribe. Ji ber ku brina Wehbi Aydın ne yek e.

Çend sal berê bav çûbû. Nikaribû biçe ser gora bavê. Nikaribû, ji ber ku cezayê wi hebû. Çend meh berê ji bira çûbû. Nikaribû biçe ser gora wi ji. Ji ber ku êdi ne "vatandaş"ê TC'ê bû. Du sal berê wi avêtibûn.

"Lê" dibêje Wehbi Aydın, "çi dibe bila bibe, ezê rêya çûyînê bibinim"

Wehbi deh sal berê ji welêt derket. Niha li Parisê diji. Li Universita Sorbonê, di fakulta ilmên siyasi de ("Sciences Politiques") hazirîya doktorayê dike.

"Vê carê kê bigirin cara dawîn e"

Herdu bira, deh sal berê, li hefsa Diyarbekirê, di koridoreka tari de bi hezrê du-sê deqîqeyan bi hevdu re peyivibûn. Ew roj ev roj, êdi hew hevdu ditibûn. Lê berî mirîna Wedat bi du rojan ji hevdu re telefon kiribûn. Wedat jê re gotibû, "ez texmîn dikim wê mirîna min ne mirîneka normal be. Vê carê kê ji me bigirin wê cara dawîn be."

Hemû gotinên Wedat di birê de mabûn. "Pîrr xerib e" digot, bi awaki şaşmayi, "Wedat çawa zanibû wê bê kuştin?" Dawiyê



WEHBI AYDIN: "Wedat digot, bi metodên ne-insani meriv nikare civateka insani ava bike"

-Mirîna min wê ne mirîneka normal be

weki ku li izahekê bigere, digot, "wan rojan li Diyarbekirê gelek ci hatibûn bombe kirin.

Bayê teror û provakasyonê xelkê bajêr quncifandibû..."

Wedat Aydın, serokê HEP'ê

yê Diyarberkirê, 37 salî bû. Bavê sê lawan bû. Rojen, Felat û Bêder. Rojen, berî 12'ê ilonê jê re

çêbûbû. Mesleka Wedat mamosteyî bû, lê dewletê heqê wi yê kar jê stendibû. Gava ku di sala 1986'an de, yani piştî pênc salan, ji zindana Diyarbekirê derket, dest bi dukandariyê kir. Lê zû "top avêt". Ji ber ku dukana wi ne dukan bû, "buroya welatparêzan" bû.

Wedat "delaliyê" malê bû. Li mektebê "qet ne jêhati" bû. Lê li gund û di nav malê de pîrr bi kêr bû. Insaneki pratik bû. Li gor rewşê tesbîta herî baş, herî zû dikir.

Wedat weki insaneki çawa di bira birayê xwe de maye? Wehbi dibêje, "destên wi mezin bûn" û dibêje. "Pîrr dîşewat bû, lê ji aliyekî de ji pîrr otorîter bû. Dilê wi paqij bû. Pîrr destvekirî bû, pîrr nefspîçûk bû. Pîrr sosyal bû û pîrr rûmet dîda insanan. Lê çî bifikirîya yekser digot. Tiştê ku rast nedîta di ci de digot. Mesela, dikaribû ji yekî re rasterast bigota, welle tu qe-brax î!"

"Gerek meriv kurditiya xwe tu car veneşêre"

Wedat di xebata siyasi de çawa bû? Wehbi piçekî dîfîkire (ji ber ku gelek sal buhurîne) û kîrînên wi, mektûbên wi û gotinên wi tîne bira xwe:

"Rûmeteka pîr mezin dîda mucadela vekirî. Digot, heqên insani û Kurdîti ne layîqê veşartîne ne. Li kuderê û di kîjan şertan de dibe bila bibe, gerek meriv kurditiya xwe û mucadela ji bo heqên insani veneşêre. Ji bo Wedat axaftîna bi Kurdî mesela xîretê bû. Gerek meriv tu carî vê bîxîretiyê qebûl nekira. Loma di kongreya ÎHD'ê de bi Kurdî peyivî. Mexseda wi ne xîrecîra vala bû. Ji bo wi, heqê zîman gerek tu carî nehatîna texîr kîrin."

"Bi metodên ne-insani civateka insani ava nabe"

"Lê" dibêje Wehbi, "Ev nayê wê manê ku ji zîmanê Turkî acîz bû. Tu carî dîjîmîniya Turkan nedîkir. Min nebihist ku gotîneka xerab li ser milletê Turkî ji devê wi derketibe."

Wehbi dewam dike: "Ez şêklê xebata Wedat pîrr teqdîr dikim. Ditîna wi ya esasî weha bû: Di mucadela de wesîte û metodê hedefê tayîn dikin. Bi metodên ne insani meriv nikare civateka insani ava bike."

Eşref Okumuş



WEDAT AYDIN:

"Zimanê te xireta te ye. Zimanê xwe paş de bistine. Bêxiretiyê nekîşîne!"

JI ÇAVÊN WAN



BRÎNA NAPALMÊ. Herdu çimên Anter bî bombeyên Napalmê hatibûn şewitandin.



"DOKTOOOR..." Doktor goştê Kawa bê Anestezi (dermanê tevîzinê).



LI BENDA TEYARÊN SEDDAM. Dê û bavên Anter, Kawa û Iman ji bo zarûkên xwe her tiştî dîkin, lê çî feyde, silahên wan bî teyarên Saddam nîkarin.

**Hêdi jêke
doktor...
Hêdi bîbire
brina
Napalmê
kûr e...**

Zarûkên rû pelixi. Zarûkên bê mîl, bê dest, bê pêçî. Zarûkên pişt şikîyayi. Zarûkên zîk çîrîyayi. Zarûkên çav rijîyayi. Zarûkên napalmê. Zarûkên mayînên kor. Zarûkên kizîrî, şewîti, wesle wesle perçekîrî...

Jî bo ku meriv bîkaribe lî Dehokê "Nexweşxana Aza-diyê" ziyaret bike, gerek kezêba meriv jî pola û dilê meriv jî qeşemê be.

Lî ber deriyê qismê zarûkan me didin sekînan. Doktoreki navsere tê û me ixtar dîke: "Evder çiyê brindarên giran e. Hun emîn in ku hun dîxwazî bîkevin hundir?" Belê, em emîn in û me jî jorê

izin jî girtîye. Em kaxezê xwe şani doktor didin û dîkevin hundir.

Çavên me bî destekî piçûk dîkevin. Destekî bê tîlî. Hemşîreyekê hîşk rahîştîyê, dîxwaze bîlind bike. Hemşîreyeka dîn devê şûşa ispiroyê vedîke û rasterast dîreşîne ser brîna tazi, ser pêçiyên nivjêkîrî. Qijîn bî lawîk dîkeve: "Axx doktooor, doktooor, doktooor!"

Dermanê tevîzandîne tunebû

Dayîka lawîkê tehemmul nake, dîkeve nav herdu hemşîran û bî kefa destê xwe eniya lawê xwe mîsdîde û dibêje:

"Erê, erê, erê Kawayê mîn, lawê mîn, rohnîya mîn, çavê mîn, dayîka te bîmre lawo, dayîka te..."

Yek jî hemşîran lî me dîzîvîre û dibêje: "Tu çare nine, em mecbûr in. Anesteziya me (yanî dermanê tevîzandîne) berî deh rojan xelas bû."

Lî kêleka nîvîna Kawayê neh salî Şermin dirêjkîrîye. Matmayî lî me mêze dîke. Bî çavekî mêze dîke, jî ber ku çavê dîn kor bûye. Destekî wê jî jî zendîkê ve hatiye jêkîrîn.

Dîlşad û Hozan mîrîn

Herdu nîvînen kêleka wê vala ne. Diya Şerminê dibêje:

"A evder çiyê Dîlşad e, evder jî çiyê Hozan. Herdu jî hefta berê mîrîn. Wan bîrîn gundê wan, nêzîkî Musulê... Herdu jî hevalên Şermin bûn, neh-deh salî bûn. Ew jî bî êrîşên helikopteran hatibûn brindar kîrîn."

Lî oda kêlekê brindarên şewatê radîkevin. Ew jî zarûk in. Em jî wan bî Anter Hacı re dîpeyîvin. Herdu çimên wi tazi ne, brînen wi yên şewatê hêj şîl in. Dibêje, "brînen napalmê ne." Em lî doktorê wi mêze dîkin, bî mana "erê, rast e" serê xwe dihejîne. Anter Hacı dewam dîke:

AGIR DIBARÎ



jêdîkir. Derman "nemabû".



"NAVA ÎMAN QUL BÛYE" Jî ber ku tu xwarin di zîkê Iman de nedisekîni, dayika Iman wusa bawer bû ku nava Iman "qul" bûye.

"Ber bi êvarê bû, ji nîşke ve helikoptere-kê xuya kir. Çend caran di ser taxa me re çû hat, dawiyê nîzîm bû, nêzik bû. Min daketina bomban bi çavê xwe ditin, min dengê peqînekê jî bihist û êdî tişteki din nayê bira min. Min hew dit ku ez li nexweşxanê me."

Doktorê Anter Haci heta niha gelek brindarên napalmê tedawi kirîye. Jî me re dibêje, "brînên napalmê weki brînên şewatê yên normal in. Ferqa wan ew e, ku zûbîzû sax nabin, tedawiya wan pirr zahmet e, dikare bi salan bajo."

Pirani zarûkên dergûşê bûn

Li Nexweşxana Azadiyê, ku berê navê wê "Nexweşxana Saddam" bû, li dor heştê zarûkên brindar radikevin. Hin ji wan brindarên mayinan in, hin ji yên top û helikopteran in.

Em ji qismê zarûkên brindar derbasi qismê zarûkên nexweş dibin. Piraniya

KARÊ JI BEJNA XWE GIRTIR DIKIRIN

Saddam
li dû xwe
bi tonan
guleyên
topan
hiştibû. Lê
hemû bi
çamûr
bûn û
Paqijkirina
van gullên
ku ji bejna
zarûkan
drêjtir bûn
para
zarûkan
ketibû.



nexweşên vi qismî zarûkên dergûşê ne. Yan ji bêxwariniyê nexweş ketine, yan ji virikê, ku sedemê wê ji bi pirani ava gemari ye.

Zîkê wê "qul" bûbû

Yek ji van nexweşan Iman e. Çar mehi ye, lê giraniya wê du kilo ye. Di hemêza dayika xwe de saetên xwe yên dawî diji. Rûçikê wê şîn e, lêvên wê tenik, weki pelên cîxarê ne. Tevziyekê dide xwe. Dîxwaze bigiri. Lê taqeta wê têra grînê nake. Devê xwe yê weki devê çivîkekê vedike ku biqije, bigiri. Lê bi tenê dengê kizînekê jê tê.

Dayika wê ji me re dibêje, "nava wê qul bûye." Jî ber ku xwarin di zîkê wê de namîne, çî bixwe dibe av û di ci de dertê der, dayika Iman wusa bawer e ku zîkê Iman "qul" bûye.

Eşref Okumuş

BAJO HEKARÎ-



HER 11 ŞÊRÊN HEKARIYÊ: 1- Qalevan Şahin, (Kaptan), 2- Aydın, 3- Bahattin, 4- Nurettin, 5- Celal, 6- Davut, 7- Bülent, 8- İlhami, 9- Remzi, 10) Cenk, 11- Faruk (Lawê Salih Yıldız). Hekari Belediye-spor di nav taximên Kurdistanê de xwediyê rêza 13' an e.

**"Beyîye hay beyîye
Hay hay hay beyîye
Beyîye malêt began
Rewşê, lewendiyê...."**

Lî nav meydana Hekariyê ku çaraliyê wê bi çiyayên asê xemilandi ye, meydana futbolê heye. Lî dora meydanê, jî bo temaşekirina futbolê, ciyê du hezar kesane heye. Lê wextê maçê hebe xortên Hekariyê girên dora meydanê jî vedigirî û bi yek dengê strana jorin diqirî.

Fûtbol berê

leyistika memûran bû

Bi sitranên govendê jî "Hekari Belediyespor" re tezahurat dikin. Di esase xwe de sitrana Beyîye di govenda Şexani de tê gotin. Di nav govendên Hekariyê de ya herî bi qedr û qîmet Şexani ye.

Lî Hekariyê futbol leyistikeka

Beyîye hay Beyîye, çamûrê kezebreşiyê



● Leyistikvanên Hekariyê ne li sermayê, ne jî li çamûrê guhdari dikin.

nû ye. Berê memûr, mamoste û sûbayên ku dihatin Hekariyê li ser mîrgan bi topê dileyistin.

Xortên Hekariyê jî van kesan hinê futbolê bûn. Di 1975'an de cara pêşî taxima xwe ya futbolê

ava kirin û navê wê danin Sumbulspor. Dûre bi navê Cilospor, Zapspor û Kavaklıspor

jî taximê futbolê hatin danin.

Hê nû isal liga profesyonel bû qismetê Hekariyê. Bi israra xortan serokê belediya Hekariyê Şükrü Çallı bûye sebeb ku "Hekari Belediyespor" bikeve liga 3'an. Jî bo Hekari Belediyesporê, jî taximên Hekari Gücü û Gençler Birliği leyistikvan hatine girtin. Lê di 10 heftên pêşî de nihêrtine ku rewş baş nîne. Jî terefداران û jî zenginên Hekariyê bi qasî 60 milyoni pere civandine û bi van peran 7 leyistikvanên xerib transfer kirine.

Di 14 maçan de çar serketin

Wextê di hefteya dawî ya meha buhîrî de min vî reportajê dikir, Hekari Belediyespor di grûba duduyan a liga sisîyan de ciyê xwe diparast. Di 14 maçan de çar xalibiyet, sê fitbûn û heft

SPOR!

mexlûbiyetên wê hebûn. Hekari Belediyespor bî 15 pûanan di grûba xwe de, di rêza 19'an de, di nav taximên Kurdistanê de ji di rêza 13'an de bû.

Dî vi muddeti de Hekari Belediyespor 20 golan avêtibû. Ji van 20 golan 8 gol aidê Bülent Çalli bûn û li gora Bülent Çalli anca ewqas ji wan dihat.

Fûtbolvanên Hekari Belediyesporê dibêjin, em ê vê sezonê di rêza 7'an de yan ji di rêza 8'an de xelas bikin. Û weha dewam dikin: "Gava meriv bine bira xwe ku di liga 3'an de sala me ya pêşî ye, wê meriv qebûl bike ku ev neticeka xerab nine."

Pere bi tenê têra xwarin û rê dîke

Baş e, çî kêmasiyên we hene? Mudurê Qulûbê Hamdi Demiroglu bersiva pîrsa min dide: "Berî her tiştî perê me tune. Hatina me tenê girêdayê lokala me ye. Lokala me di binê xaniyê Belediyê de ye û rojê anca 400-500 hezar tine. Ev pere, wexta em dertên deplesmanan bi tenê têra heqê rê û xwarina me dîke. Hinek fûtbolvanên me yên ku bê kar in di Belediya Hakkariyê de weki karker dixebitin. Maaşên wan milyonek û sêsed hezar e ku ji bo xwarina fûtbolvaneki gelek hindike."

Her heft fûtbolvanên xerib li lokalê radizên. Ji van heft keşan Remzi Yıldırım ji Diyarbakirê ye. Jiyana wî ya fûtbolê yazde sal e. Ji van yazde salan bi tenê sê sal weki amator leyistiye. Pênc sal di Diyarbakirspor de, 3 salan di Tekirdag-Malkarapor de û par ji di Cilospor de leyistiye.

Insanên vêderê pîrr germ in

Remzi spora Hekari û Malkaraporê dide ber hev:

"Li vê derê jiyana insanên pîrr monoton e. Teb'en jiyana me ji weki ya xelkê ye. Tiyatro tune, sinema tune. Bi tenê qehwe heye. Ji bo wê yekê spor mijûliyeke bi serê xwe ye. Di vî wari de potansiyeleka mezin heye. Lê, hê bi amatori ye. Fûtbol ji bo wext derbas kirinê tê leyistin. Kesên ku nakevin nav yazdên pêşî dev ji her tiştî berdidin. Lê tu car meriv nikare li rojava, ev germiya ku li vir di nava insanên de heye, bibîne. Bi rastî ev germi li her derê 'Güneydogu' yê heye.

Tu di wextê xwe yê vala de bi çî mijûl dibî?

Dibêje, "Kitêban dixwinim" Kitêba ku herî paşî xwendiyê ya İsmail Beşikçi ye û navê kitêbê ji "Savunmalar" e.

Hekari Belediyesporê bî 15 milyon, Cenk Vanlı ji Mûşê transfer kiriye. Cenk Vanlı 21



NATIRSE. Antrenor Yıldız: Em bi Fenerbahçe re bileyizin pîrr pîrr emê 5-0 di bin kevin"

sali ye û 3 sal e ku profesyonel e. Kitêba ku wî ji herî paşiyê xwendiyê "Uzaylıların Ayak İzleri" ye. Dibêje, "Ez nexweşê kitêbên weha me."

Hemû leyistikvan ji bajarên Kurdistanê ne. Ji bo wê yekê li Hekariyê zêde xeribî nekişandine. Ziman û kultura xelkê û ya wan yek e.

Serê merivê polêsek dikeve

Wextê li Hekariyê maç dibin polês tedbirên mezin distinin. Di her maçekî de bi hindikayi 200-300 polês diçin saha topê. Ew maye ku serê merivê polêsek bikeve.

Dibêjin ku dewlet ji hedisên maçan ditirse. Ji her hedisê yê şîka serihildanê dîke. Carekê wextê hakimîki teref girtiye, hedise derketiye. Paşiyê hedise mezin bûye û xelkê sloganên siyasî avêtiye. Di nava xelkê û polês de şer derketiye.

Ew roj iroj polês di van mese-lan de pîr "hessas" in. Çendeki berê ji li ser rengên kesk û sor û zer "nerihetî" derxistine. Forma Hakkari Belediyesporê şîn û

sîpi ye. Wextê wê bi Sarıkamış re maç bikin, dinêrin ku forma herdu taximan weki hev in. Li gori qaidan gerek forma du taximên ku bi hev re diley-ızın ne ji hev bin. Ji ber ku maç li Hekariyê ye, Hakım ji Hekari Belediyesporê re dibêje forma xwe biguhêrin. Ew ji forma xwe diguhêrin. Forma Hakkari Gücü li xwe dîkin. Rengên forma Hakkari Gücü kesk û sor û zer in. Polês derhal lê hay dibin û zebî digirin. Piştî maçê sawci gazi antrenor û leyistikvanan dike û ifadên wan digire. Fûtbolvan dibêjin, "Dî nivê maçê de em lê hay bûn ku rengên formayên me "yasak" in û me wê çaxê formayên xwe guhart. Lê bi ihtimaleka mezin ewê dosya biçe DGM'ya Diyarbakirê.

"Wê rengên lembên trafikê çawa bikin?"

Antrenor Salih Yıldız dibêje ev "yaşaka" li ser rengan tewş e. Çawa karin rengên ku çiya dixemilinin yasax bikin. Di vî zemanî de êdî ciyê tiştên weha gerek tunebe. Wê çaxê gerek kesk û sor û zer ê ku li ser lembên trafikê ne ji rakin.

Antrenor Salih Yıldız ji xezeba 12'ê İlonê tîr nesibê xwe girtiye. Di darbeya 12'ê İlonê de ew ji kar avêtine û 10 salên wî di hefsa eskerî ya Diyarbakirê de derbas bûne. Piştî ji hefsê derketiye bi folklor û fûtbolê mijûl bûye. Salih Yıldız ji fûtbolvanên xwe memnûn e:

"Berê tecruba wan tunebû, amator bûn. Nuha hêdi hêdi bi pêş ve diçin. Ku em derdê xwe yê peran ji çareser bikin wê baştir bibe. Wê Wilayet ji hatina komirê serê tonê 30 hezar bide me. Wê çaxê wê rewşa me ji baştir bibe."

Salih Yıldız dibêje, "Spor failiyeteka cîvaki ye. Piştigiri û biratiyê hîni merivan dîke. Ev ji ji bo bajareki wek Hekariyê muhim e. Li vê derê nufûsa bajêr li dor 25 hezari ye û 20-30 qehwe hene.

Ez pîrsa xwe ya dawî dikim: Eger Hakkari Belediyespor bi Fenerbahçe re bileyize tu dibêji wê maç çend û çend biqede?

Cewaba Salih Yıldız yekser û kin e:

"Pîrr pîrr emê 5-0 mexlûbîbîn"



Ferhat Tugan

Goşt+hevîr+mast = "Zimanê Çivikê"

Di zimanê Botan de û di zimanê Sumeriyan de navê nan "Ninda" ye.

Dawiyê gotina Ninda di zimanê Kurdi de bûye "Nan".

Nan, weki "Nan-û nimet" di zimanê Osmani de ji hatiye bikaranin. Di dunyê de cara pêşî navê ku li nan hatiye kirin "Ninda û Nan" e. Kurdan ji hevîr ne bi tenê nan, gelek xwarinan ji çêkirina.

Ji van xwarinan yek jê Erişte ye. Gotina Erişte ji "Riş û Rişte" ya Kurmancî ketiye Turki. Ev xwarina ku iro navê wê "Makarna" ye, çend hezar sal berê bi navê "Erişte" ji alî xelkê me ve hatiye keşf kirin. Yek ji xwarinên me yên navdar û tarîxi ku bi hevîr çêdibe ji "Tutamaç" e, ku bi navê kevn "Zûbanê Guncîşk", yanî Zimanê çivikê ye. Em ê nuha ji we re bêjin ka ev xwarina çawa çêdibe:

"Tutamaç" xwarineka bi mast, bi hevîr û bi goşt e.

ÇÊKIRINA HEVÎR:

Meriv hevîrê xwe bi hêk, av, xwê û arvan distire. Hevîrê meriv gerek ne zêde hîşk be ne ji zêde nerm be. Paşiyê meriv potikekî şil davêje ser hevîrê xwe û 20 deqiye dihelê. Dûre dor tê çêkirina nanê tenik. Qalindiya vî nani gerek 3 mm be. Meriv gerek nanê xwe kerî bi kerî bike. Mezinayiya kerîyan gerek 1 cm "kare" be. Meriv kare di şêklê Erişte de ji nanê xwe yê tenik jêke.

Êdî wextê hazirkirina goştê. Goşt di 5 qedeh avê de gerek were kelandin, heta ku nerm dibe. Wextê ava goşt bi kelê dikeve meriv kefa serê hiltine. Gerek meriv mast, sirê pelixandi û hêka xav bike ser wê ava ku tê de hevîr hatiye kelandin, û di quşxanê de lihevxe. Piştî lihevixistinê meriv goşt tevi avdonkê û pariyên hevîr berî vê quşxanê dide û heta ku kelek bi ser keve dîkelîne. Şiv hazir e. Êdî meriv melzemê qalîk ji berî serê dide û şiva xwe datîne ser sîfrê.

ÇÊKIRINA QALIK:

Meriv hêk û xwê û arvan li nava hev dixê, heta ku dibe hevîr. Meriv dawiyê hevîrê xwe dike şêklê darîkeki zirav û dirêj. Dûre meriv hevîrê xwe di mezinayiya nîskan de jêdike. Piştî wî, meriv rûnê nîvîşk sor dike û hevîrê xwe davêje. Piştî hevîr baş sor bû, meriv êdî hevîr bi ser şiva xwe ya hazir

de dadike.

F. Sümer yek ji nivîskarên ideolojiya resmî ye û dibêje ev xwarin ya Selçuklu'ya ne. (1) Ev yek ne rast e. Kaşgarlı Mahmut dibêje, "Piştî ku Turkan vê xwarinê dit, navê wê danin Tutamaç". (2) Ciyê ku Turkan vê xwarinê lê dit ji Botan e. Burhan Oguz ji dibêje, "Ew xwarinên ku navên wan di "Selçûknameler"ê de hene ne yên Selçûklu'yan in. Piştî Selçûklu'yan ev war istila kirin navê van xwarinan ji xelkên van deran hin bûn. Yanî paşiyê hin bûn". (3)

İsmet Zeki Eyuboglu ji di eynî qeneetê de ye. (4)

Destên asimilasyonê heta bigihîje ketinê mutfexên me ji. Di mutfexên me de "Tutamaç" berî gelek xwarinan tê. Kurdan bi meziyeteka bilind vê xwarinê kirine nav kultura me ya mutfexê. Nûşican be!

MELZEMÊN WÊ:

1/2 kg. goştê miyê, nerm
1/2 kg. mastê kis
1 hêk
6 serî sir

AVDONKA WÊ:

5 qedeh av
1 kevçiyê şiraniyê xwê

QALIKÊ WÊ:

1 hêk
1/2 kevçiyê çayê xwê
3 kevçiyê şorbê rûnê nîvîşk
Bi qasî ku têr bike arvan


Not:

(1) F. Sümer- Oguzlar s. 237-238


(2) Kaşgarlı Mahmut- Diwan u Lugat it Türk s. 452-453

(3) Burhan Oguz- Türkiye Halkının Kültür Etkinlikleri s. 680 cilt 1

(4) İsmet Zeki Eyuboglu- Anadolu Uygurlığı s. 125-134



CEMŞİD BENDER



İSMAİL BEŞİKÇİ

Milletê zıman-qedexekiri (yasax-kırî), weki merivê zıman-jêkırî ye. Zıman ne bî tenê wesitayeka basît a têkiliyan e. Edebiyat û sin'et û kultur jî bî rêya zıman dîkemîlîn. Fıkra meriv û zımanê meriv bî hevdu ve hîşk grêdayî ne. Ev, gırêdaneka organik e. Eger tu bî Turki bipeyivî, bî Turki bîfıkırî, tê weki Turkeki bîfıkırî. Eger tu bî Kurdi bipeyivî, bî Kurdi bîfıkırî, tê weki Kurdeki bîfıkırî.

Zımanê Kurdan hatiye jêkırin

Loma, peyvandina bî Kurdi yan fıkırandina bî Kurdi, weki proseseka (süreç) wusa dertê meydanê, ku ehemiyeta wê jî texmina me gelek wêdetir e. Nivîsandina bî Kurdi jî weki proseseka hin cihê tê xuya.

Zıman, dimensiyoneka (boyut) pîr muhim a huwiyeta millî ye. Huwiyeta millî tayîn dîke. Qedexekırîna peyvandina zımanekî, nexasîm jî qedexekırîna nivîsandina zımanekî, jî aliyê birîrdarkırin û helandina wî zımanî ve neticên gelek muhim dide.

Gava ku milletekî serbixwe bixwaze huwiyeta wî ya millî şax bide; dî warên zimên, tarix, edebiyat û folklorê de, teşwîka lêkolînê gelek fireh dîke. Jî bo vê armancê muessesên cihê cihê yê lêgerînê, enstîtuyan û hwd (her weki dîn, ve saire) dadimezirine. Xelatan dide kesên ku van lêkolinan dîkîn.

İcar em bîfıkırin ku ev millet, dîxebite ku milletekî dîn dî bin destê xwe de bîhêle. Karê pêşî yê ku milletê serdest dîke yan dîxwaze bîke, qedexekırîna zımanê milletê dîn, yanî milletê bindest e. Lî gel qedexekırîna zimên, dîkeve pêşîya xebatên ku dî warên tarix, zimên, folklor û edebiyatê de tînin kîrîn û ewan jî qedexê dîke.

Bî vî awayî huwiyeta millî dest bî erozyonê (helandin) dîke. Dî prosesa erozyonê de, milletê serdest zıman û kultura xwe empozeyî milletê bindest, milletê kolonî dîke.

Gava ku Kurd nêzikayî lî zımanê xwe dîkîn û derheqê tarix, edebiyat, zıman û folklorê xwe de dest bî lêgerînê tînd (yogun) dîkîn, rêyeka fireh lî pêşîya şaxdayîna huwiyeta Kurdi vedîkîn. Ev xebat wê dî pêşveçûna hereketa millî de jî roleka zaf mezûn bileyîzin.

Dî van waran de gavavêtina Kurdan û xebata wan a jî bo pêkanîna zımanekî muştêrek î nivîsandîne, fonksiyoneka dîn jî dadigire, ku ew jî ev e: Ew dijwariyên ku neticeya parçebûn û parvebûn û veqetandina Milletê Kurd û Kurdistanê ne, wê jî meydanê bînin rakîrîn.

Fırıya, fıriya, çı fıriya? - Sovyet fıriya



NABE, Bİ ZORÊ NABE. Yekitiya bî zorê weki zewaca bê dil e. Aqûbeta wê weha ye...

Tehdîtên Gorbaçov pere Nekirin. Her sê cumhûriyetên Slavi jî dev ji Yekitiya Sovyetê berdan. Lî ser vê yekê, Yekitiya Cumhûriyetên Sosyalistên Sovyetê (YCSS) piştî 74 salan bû mij û dûman.

Piştî civîneka bî dîzî dî nav serokên Federasyona Rusyayê, Cumhûri-

yeta Ukraynayê û Rûsya Spi de, yekitiyeka nû hat danîn.

Yekitiya van her sê dewletan, ku jî sedî heftêyî Sovyeta kevn in, otîrîta merkezi ya dî bin serokatîya Gorbaçov de red dîke. Gava ku ev rêz tînin nivîsandin Gorbaçov hê jî serokê Sovyetê ye. Lê wusa xuya

ye wexta ku hun van rêzan bîxwinin wê Gorbaçov jî kursiyê xwe zû de gêndir bûbe.

Yekitiya nû merkeza iktidarê jî, dî şûna Moskovayê de bari Rusya Spi kîr. Serokên her sê dewletan bî resolusyonekê beyan kîrîn ku ewê êdî tu icraatên Moskovayê qebûl nekînin.

25 milyon Mark çû

Ricaya Erdal Inonu jî sosyal demokratên jî pere nekîr. Hukûmeta Almaniyayê jî ber siyaseta Turkiyê ya lî hember Kurdan jî alîkariya eskerî 25 milyon Mark bîrî.

Dî parlamentoya Almaniyayê de sebebê qerarê kêmkirina alîkariyê weha hat îfade kîrîn: "Turkiye jî alîyekî ve lî kurdên xwe tade dîke

û jî aliyê dîn ve lî Kurdistanê İraqê xelkê sîvil bomba dîke". Sosyal-demokratên Almanî nîca Inonu qebûl nekîrîn.

110 milyon lira hat

Lî Swêdê (İsveç) çar Kurdên ku dî dawa Palme de lî telefonên wan û malên wan bî dîzî hatibû guhdari kîrîn 130 hezar kronê Swêdî (ku dîke 110 milyon Lirayê Turkiyê) tezminat girtin.


Piştî ku serokwezîrê Swêdê Olof Palme dî 28'ê sibata 1986'an de hat kuştin istixbara Turkiyê û Swêdê xwestin ku cinayetê tîxin stuyê Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK).

İstixbarata Swêdê wexteka dirêj bî dîzî lî çend Kurdên "hevelbendên



PKK'ê" guhdari kîr. Mikrofonên bî qasî hebên nok û nîskan dî telefon û nivîn û diwarên wan de bî cî kîr. Lê lî gor qanûna esasî (anayasa) ya Swêdê guhdarîkırîna bî cî-hazên elektronik qedexê (yasak) ye. Piştî ku mesele derket meydanê lî hember istixbaratê û wezîrê edaletê gelek dawê vebûn.

Heta nuha du wezîrên edaletê, şeş mudurên gîştî yê emniyetê û du mudurên gîştîyên istixbaratê jî wezîfê hatine avêtin. Jî bo hînan jî wan cezayê hefsê jî tî xwestin.

● Dî dî cinayeta palme re istixbarata Turkiyê û Swêdê xwestin ku cinayetê tîxin stuyê Kurdan.



Eger serokên dunyê jin bûna...



Gava ku mesûlê ROJNAME'yê, Eşref Okumuş, li min doza nîvîsandîne kir, sê şertan dani ber min: "Yek; gerek tu bi navê xwe yê rastîn binivîsîni û fotografekî xwe bîdî me. Dudo; gerek tu li ser pîrsa jinan nenivîsî. Sîsê; gerek tu bi zîmanê xelkê binivîsî."

Mîn jê re got, jî xwe ez jî xeynî Kurdîya xelkê bî Kurdîyeka din nîzanîm. Lê ez herdu şertên te yê din qebûl nakîm. Sedemê vê jî ezê nîha jî we re bêjim:

Rast e, gerek jî ne tenê li ser pîrsa jinan, li ser hemû pîrsan binivîsî. Lê, me Kurdan pîrsa jinan heta iroj kêman caran wekî pîrseka bî serê xwe munaqêşe kirîye. Jî ber vê, ez dîxwazîm li ser vê pîrsê bî perspektîva jîneka Kurd binivîsîm. Ez nîkarîm navê xwe yê rastîn jî bîdîm, jî ber ku ezê gelekî qala mêrê

xwe bîkîm. Û meselên ku ez dîxwazîm li ser binivîsîm, bî pîrani meselên mustehcen in. Netîrsî, ez li vêderê kîncên xwe jî xwe nakîm.

Jî mustehcenîyê qesda min; fîraqşûştî, xwarînpîjandî, malîştî û potîkên bî gû ne. Gûyê zarûkan...Yanî karên ku qedera jînên welatê me ne. Ne wusa ye, dî civata me de tabûyên herî mezin û mustehcenîya herî xerab fîraqşûştî û gûpaqîjkîrîna mêran nîn e?

Hunê nîha bêjî; ma dibe meriv van meselan wusa sîvîk bigire, gerek meriv hemû sedemên "cîvakî", "tarîxî" "kultûrî" û nîzanîm çî, bide ber çavan.

Ev, rasterast xapandî e. Jî hînek rastîyan re tahlîl mahlîl ne lazîm e. Tahlîla fîraqşûştîne tune. Gava ku meriv şîvê xwar, ava xwe dîkelîne, lûfîkê xwe tîne û fîraqên xwe dîşo. Ewqas basît e. Baş e, wê dost û cîran nebêjî, "xwelî-lî-sero, pîrr serjînk e, ne mêr e." A jî xwe her tîşt jî vêderê dest pê dîke. Karên me jinan, bêrûmet in, gerek mêr xwe bî wan



karan piçûk nexînin. Karên mêran jî, idarekîrîna civatê ye, tîştên "mezîn" û "cîddî" ne.

Tîştê herî xerab, mêrên me yê ku jî xwe re dibêjî "şoreşger" û "pêşverû jî, jî bo rakirîna van tabûyan xwe nalîvin. Çîma wê xwe

bîlîvinî? Ma kî jî paqîjkîrîna gû hez dîke?

Gava ku mala me li gund bû, Şêx, me bî cennetê dîxapand. Gava ku em hatî bajêr, sosyalîstan, me bî şoreşê dîxapand. Îro jî

gerek em li benda "Kurdîstana azad" bîn.

Mîn jî mêrê xwe re gotîye. Ez, ne li benda cennetê, ne li benda şoreşê, ne jî li benda Kurdîstanê dîsekinîm. Jî ber ku fîraq gerek her êvar bîn şûştî. Berî şoreşê jî, piştî şoreşê jî...

Eger nîzam ne ev nîzam bûna, eger mêrên me ne ev mêr bûna, emê jî li ser jîyana xwe, civata xwe û welatê xwe xwedîgotîna bûna.

Gelo eger serokên dunyê jin bûna, wê li vê dunyayê ewqas zulm û çavşorî hebûna?

Hun çî dibêjî?

Binivîsî. Û li ser adresa ROJNAME'yê (ku derkeve helbet) jî min re bîşînin. Soz dane min, wê çap bîkî. Eger ev rojname nîkarîbe derkeve, ez jî serî de dibêjim, sîcê mêran e. Jî ber ku hemû hefsar dî destên wan de ne.

DGM dîxwaze IHD'yê bigire

Daweya ku dî heqê şûba IHD'ya Istenbolê de, jî ber şeva piştîgîriya Kurdên Iraqê vebûbû, dî 28'ê meha buhurî de dest pê kir.

Şûba IHD'ya Istenbolê jî bo alîkariya Kurdên Iraqê dî 12'ê meha Gulanê de şeveka bî muzîk û şahî çekîrîbû.

DGM'ya Istenbolê doza girtîna IHD'yê û cezakîrîna serokên wê dîke.

Sawciyê DGM'a Istenbolê Yaşar Günaydî derheqê mesûlên IHD'yê û Mehdi Zana de, ku dî şevê de axaftînek kirîbû, bî iddia "bölücü" tiyê jî du salan heta pênc salan cezayê hefsê dîxwaze. Sawci dî celseya pêşî de ku dî 28'ê Qasîmê de bû, bî îsrar li ser rengên kesk û sor û zer sekîni.

"Rengên PKK'ê ne"

Dî iddianama sawci de li ser rengên kesk û sor û zer weha tê gotî: "...Kesk

Sawciyê DGM'ê jî bo rengên kesk-û-sor-û-zer doza girtîna IHD'ya Istenbolê dîke

û sor û zer rengên PKK'ê ne. Li gor tesbîtên me dî şevê de govendgêran cîlên bî van rengan li xwe kîrîne."

Jî "sanîk" an Avûkat Eren Keskin, ku yek jî mesûlên IHD'yê ye, jî bo vê iddianamê weha got: "Em bî îfadên polêsan mahkeme dibîn. Îfadê polêsan jî aqîl û mantiqê dûr in. We iddianama xwe li gori zîhniyeta polêsan hazîr kirîye. Ew rengên ku li ser cîlên govendgêran bûn, yanî kesk û sor û zer, ne rengên PKK'ê ne. Ew, rengên millî yê xelkê Kurd in. Ew sembola milletê Kurd in. Ev reng

cara pêşî jî aliyê "Teşkilat-ı İctimaiye Cemiyeti" ve hatîne bîkaranîn. Hun dibêjî ev rengên PKK'ê ne. Jî bo ku hun vê yekê îbat bîkî, dîvê hun bayraka PKK'ê binî mahkemê û li rengê wê binîhêrî. "Ancax, hakîmê mahkemê Osman Şen vê daxwaza Keskin red kir. Eren Keskin jî xeynî nîhêrinên xwe yê li ser iddianamê weha got: "Dî nav çarçeva heqên insani yê bîngêhin de heqê tayîn kîrîna qedera millî jî heye."

Dî vê dawê de yê ku jî bo wan jî 2 salan heta 5 salan cezayê hefsê tê xwe-

stî ev kes in: Eren Keskin, Mehdi Zana, Ercan Kanar, Mustafa İzzet Eray, Huseyin Aygul, Yuksel Hoş û Ayşegül Zarakolu. Jî xeynî Mehdi Zana yê din gîş endamên komîta karger a (Yönetim Kurulu Üyeleri) IHD'a Istenbolê ne.

Jî ber kêmasîyên hînek ewraqan û jî bo ku li Mehdi Zana û polêseki ku şahidî dîke bî guhdari kîrî, celse taloqê 13'ê Sîbata 1992'an bû.

Hunermendên Turk jî hebûn

Şeva Piştîgîriya Kurdên Iraqê dî 12'ê Gulana 1991'ê de, li "Açıkhava Tiya-trosu" ya Harbîyê hatîbû çekîrî. Jî xeynî dengbêj û govendgêrên Kurdan, hînek ronakbîr û sîn'etkarên Turkan jî beşdari şevê bûbûn. Nur Surer, Aytaç Arman û Ferhat Tunç, çend jî van bûn. Temamî hatîna şevê jî Kurdên Iraqê re, yê ku revîyabûn ketîbûn Turkiyê re

Ferhat Tugan

Yeni Ülke'yê rekora dunyê şikand

Dî nav salekê de 55 dawê, 30 girtin 18 civandin

Yeni Ülke'yê isal rekora dunyayê şikand. Lê ne rekoreka normal. Rekora civandin, dawê û girtinan. Wusa xuya ye, ku dî van waran de xelatên rojnamevaniyê hebûna, wê Yeni Ülke'yê hemûyan bîstandana.


Rojnamê ji merkeza Amnesti'yê (Uluslararası Af-örgütü) pîrsi: Gelo tu rojnamên dunyê dî van waran de xwe digihandin Yeni Ülke'yê. Cewaba wan gelek kîn û yekser bû: "Na!"

Wextê Yeni Ülke'yê sala xwe dagirt, dî heqê mesûlên wê de ji 55'an zêdetir dawê vebûbûn. 18 car hatibû civandin. (Pênc car li gor qanûna anti-terorê, 13 car ji li gor 142'yan).

Muxabîrên wê, tenê dî nav heft mehan de, 30 caran hatin girtin. Hinek nivîskarên wê hê ji dî hefsê de ne. Muxabîrê wê yê Nîsêbinê, Vahap Aslan, ji bo xebereka li ser merasîma cenazê gerillayeki, hat girtin û hê ji dî hefsa Diyarbakîrê de ye. İsmail Beşikçi ji, ji ber gelek nîvîsan tî mahkeme kirin.

Nêzi 2 milyari cezayê peran

Ji Yeni Ülkeyê cezayên peran ji tî xwestin. Ev pere dî navbera milyarek û niv û du milyaran de ye. Disa ji her sibehên



DGM-DGM-DGM..
18 car "toplaltılmasına",
55 car ji "yargılanmasına"
Wusa xuya ye DGM ji bo
Yeni Ülke'yê dixebite.

yekşeman xwendevanên
Yeni Ülke'yê rojname xwe
ji bayiyên xwe distinin.

Nêzi 30 hezar tiraj

Tevî ku polês ewqas xwe diêşinin ji xwendevanên Yeni Ülkeyê roj bi roj zêdetir dibin. Li gori Yeni Ülkeyê, tiraja wê nêzîki 30 hezari ye.

Polês li gelek ciyan li muxabîrên Yeni Ülke'yê dixin, milên wan, serên wan, hestiyê pozên wan dişkênin; filimên wan, teybên wan û makinên wan ê fotografan ji wan distinin û pîrcaran ji, wan bi bahanên beredayî digirin.

Ömer Okumuş



"ADALET MÜLKÜN TEMELİDİR"? DGM'ya İstembolê ji baş dîzane ku li Türkiyê du adalet hene: Yek ji bo Kurdan, yek ji bo Turkan e.

Dengê Amerika bî Kurdi

Senatoya DAY, Dewletên Yekbûy ên Amerika, (bî Turki ABD) qerar da ku Radyoya Dengê Amerika êdî bî zîmanê Kurdi ji weşan (yayîn) bike. Qerara Senatoyê wê dî nêzik de li Koşka Spi (Beyaz Koşk) bê muzakere kirin. Eger Koşka Spi qerara Senatoyê tesdiq bike wê Dengê Amerika dî sala pêş me de dest bi weşanên xwe yên Kurdi bike. Radyoya Dengê Amerika li tevayîya dunyê tî guhdari kirin.

Televizyona YNK bî Kurdi

Li Kurdistanê Iraqê "Televizyona Xelkê Kurdistan"ê dest bi weşanê kir. Televizyona ku ji aliyê YNK (Yekitiya Nîştîmanî Kurdistan) ve tî finanse kirin weşanên xwe bî kurdi û ji bajarê Zaxo'yê dike. Weşanên televizyonê halê hazır rojê sê saet in û girani didin xebiran. Ji xeynî xebiran programên li ser pîrsên civakî, li ser tarîxê û li ser kulturê ji tî weşandin.

Radyoya Swêdê bî Kurdi

Radyoya Merkezi ya dewleta Swêdê (İsveç) sala pêş me dest bi weşanên Kurdi dike. Mesûlê Radyoyê Susanne Stenberg ji ROJNAME'yê re dibêje, ev weşan wê dî destpêkê de ji heftiyê carekê û 30-40 deqîqe bin. Piştî çendeki wê saetên weşanê zêdetir bibin.

Li Swêdê bî qasî 300 radyoyên mehelî ji hene. Her komele (dernek) di-kare dî van radyoyan de weşan bike. Halê hazır çar komelên Kurdan ji dî van radyoyan de weşan dikin.

Li Berlinê radyoya Kurdi

Li Berlinê ji Radyoya Kurdi vebû. Radyoya Kurdi ya Berlinê her yekşem saetekê weşan dike. Çar memûrên wê hene. Ji aliyê hin sermiyandarên Frensi tî finanse kirin. Grani dîde muzîkê. Xebiran ji diweşîne.

Tugrul Eryılmaz ji kovara Nokta veqetiya

Hinek insan ji xirecîrê hez nakin. Mucadela xwe bi bîdengi û bê heytêhol dikin. Eryılmaz ji insanekei weha ye.

Tugrul Eryılmaz mesûlê giştî yê kovara Nokta bû. Çendeki berê, bê ku kesi bi xwe bihesine wezîfa xwe terk kir û çû. Li gor

malûmatên ROJNAME'yê, xwediyên Kovara Noktayê jê re gotibûn "yan tî herî, yan ji tî dev ji mesela Kurdan berdi."


Eryılmaz, alternativa yekane qebûl kiribû. Dî wextê Eryılmaz de ji bo nîvîsên li ser Kurdan çend dawê ji kovarê re vebûbûn. Lê ji

raya giştî dihatin veşartin. Rûmeta Eryılmaz, ji Noktayên piştî wî gelek vekirî xuya dibê.

Cumhuriyet ji potinanan filiti

Kemalist çûn rojnamevan man

Foto: GEORG KRISTIANSEN



Sê kel hebûn ku wezifa dergevanî û parastina dewletê dabûn ser milên xwe. Êdi yek ji wan kelan tune. Di warê parastina "ideolojiya resmî" de ew halê ku her du kelên dinê têde ne, yanî halê "Ordî" û "SHP"ê ji li meydana ye. Hestiyên Atatürk jan didin!

Pireka Nadir Nadi, Berin Nadi dibêje van tiştên ku bûn şani me didin ku di Cumhuriyetê de dewrek xelas bû, "prensibên Atatürk û ekola Nadir Nadi ji ortê hatin hilandin." Lî gor Berin Xanım, ev neyartiya Atatürk û ev liberalizm tev ji binê serê hîn xortên 30-35 salî derketin. Wan ev kir moda.

Şerê navbera Kemalist û liberalan

Piştî mirina Nadir Nadi di Cumhuriyetê de şer dest pê kir. Şerê navbera Kemalist û liberalan... Kemalistan şer wenda kirin. Emine Uşaklıgil, Hasan Cemal û Okay Günensin rojnameka liberal û pîrdeng dixwestin. Kemalist lî hember derketin. Ji rojnamê veqetiyên û 70 xebatkarên wê ji bî xwe re bîrin.

Erdal Inonu xwest navberî bike

Ev mesele di manşetên rojname de çiyekî pîr mezin girt. Erdal Inonî xwest bikeve nav Kemalist û liberalan, wan lî hevdu bine. Lê bî ser neket.

Lî gor İlhan Selçuk, sebebê veqetandina wan ne nivisa Osman Ulugay bû, ku bî navê "Dî şûna DYP-SHP de koalisyona rast DYP-ANAP e" di Cum-

huriyetê de derketibû. Sebebê esasi ew bû, ku "hînekan dixwest xeta rojnamê biguhêrin."

Ji xwe ekiba Hasan Cemal ji vê yekê redd nedikir. Hasan Cemal û hevalên xwe dixwestin rûpelên Cumhuriyetê ji hînek çepên din re, hetta ji nîvîskarên "musluman" re ji vekin.

Dî prensibên nû de "Atatürkçî" tune

Ekiba Hasan Cemal pîr diqet dîkin ku mora "Neyarên Atatürk" lî wan nekeve. Lê disa ji wextê "prensibên rojnamê" yê weşanê dihejmêrin "Atatürkçü" tiyê naxin navê.

Berê, wextê yekî bigota "Kurd" çepî dihat bira meriv. Wextê yekî bigota "Çep" ji (pîr xerib e ku) rojname Cumhuriyetê dihat bira meriv. Loma ji yê ku dixwestin xwe çep nişan bîdin Cumhuriyetê bî şekleki wusa dîkirin berikên xwe ku herkesî bîkarîba navê rojname wan bîdita.

"Serê ronakbîran rohnî dîkir"

Berê, nivîsên İlhan Selçuk û Ugur Mumcu ji bo ronakbîrên Turk, heta ji bona "ronakbîrên" Kurd ji gelek muhim bûn. Çi tiştêki muhim bûbûya pêşî lî nivîsên van insanan dînihêrtin, ka ew çî dibêjin. Tiştên ku van nîvîskarên dîniwisand him nişana perspektîfa Cumhuriyetê bûn, him ji serê hînek "ronakbîran" rohnî dîkirin.

Êdi ev nîvîskar di Cumhuriyetê de nanîvisin. Ew dewr xelas bû.

Ferhat Tugan

67 SAL DI BIN SÎYA MÎLTARÎZMÊ DE... Êdi ji nav rûpelên Cumhuriyetê dengê reppe-reppa potinane nayê. Dewra Kemalîzmê xelas bû. Di Cumhuriyetê de ji nuha ve elametên xêrê xuya dîkin.

MAHMUT LEWENDI
PORTREYA
BEDIRXANIYAN
JI BO WE DERXIST



● Rojnama Kurdistan'ê û mesûlê wê yê gîştî Miqdad Midhet Bedirxan Beg.

Rojnama pêşin: Kurdistan (1898)

Dî 22'yê Nisana 1898'an de, yari 93 sal berê rojname me ya pêşin Kurdistan lî bajarê Qahirê derket. Xwediyê wê Miqdad Midhet Bedirxan Beg e.

Bi qasî ku tê zanîn, rojname Kurdistan 31 hejmar derketiye. Miqdad Midhet Bedirxan Beg tenê 5 hejmar derxist, piştî birayê wî Abdurrehman Bedirxan Beg dest bi derxistina rojnamê dîke. Armanca xwe ya dewam kirina rojnamê weha dibêje:

"...Hetta nuha birayê min Miqdad Beg ev rojname derdixist. Lê çî heyfê kû Sultan Hemid nehişt ew lî Mısıre bimine. Ew jî mecbûr ma hat Îstebolê û xwest lî Îstebolê derxe, lê disa nehiştin...Nuha ezê dewam bikim derxim..."

Her çendî hejmarên wê yê pêşî lî Qahirê derketin, lê cîyekî sabit ê rojnamê tunebû. Mesela demekê lî Cenewrê, paşê disa lî Qahirê, lî Londrayê, lî Folkstonê û hejmarên dawî jî disa lî Cenewrê derketine.

Wek siyaseta, rojnamê heq û huqûqê kurdan dî nav çerçewa Dewleta Osmanîyan de parastîye. Lê bi her awayî jî lî diji Sultan Hemid bûye.

Gava ku mirov lî naveroka rojnamê dinîhêre tede tarîx, edebîyat, siyaseta, din, deng û behs û nameyên xwendevanan hene.

Mala Bedirxaniyan

● Lî Kurdistanê gelek malbat hene ku dî tarîxa me de rolek mezin listine. Wek Malbata Şemzînan, Baban, Cemil Paşayan û gelekên din. Jî wan yek jî mala Bedirxaniyan e ku jî bo heq û huqûqê Kurdan, çî bî "şûr", çî bî qelema xwe be, têkoşinek bê hempa dane.

Mir Bedirxan (1802-1871) lî Cîzirê hatiye dunyê lî Şamê çûye rehmetê. Dî 1835'an de jî Diyarbekir heta Urmiyê seranserî Kurdistanê dî bin destê wî de bû.

Mir Bedirxan xwedî 54 zarok bû ku jî wan 40 kur bûn. Hemi jî xwende û mamûrên mezin bûn. Ataturk paşnavê wan guhert kir Çînar, yê hînekên jî bû Kutay.

Hînek jî zarok û neviyên Mir Bedirxan ev in:

Abdurrezaq Bedirxan: (1846-1918). Bavê Leyla Bedirxan e.

Ali Şamil Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e.

Abdurrehman Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e. Dî 1898'an de piştî birayê xwe Miqdad Midhet Bedirxan ew dibe xwedî û berpirsiyarê rojnama Kurdistan.

Ahmet Bedirxan (Çînar): Kurê Raşîm Murat Bedirxan e. Lî İzmirê dimine, abûqatiyê dîke.

Bahri Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e.

Celadet Ali Bedirxan: (1893-1951) Kurê Emin Ali Bedirxan e. Himdarê elfaba Kurdi ye. Sembola ROJNAME'yê ye. Lî Îstebolê hatiye dunyê. Demekê wî surgûnî Yemênê dîkin. Lî gel Mîstefa Kemal lî dij dagirkeran şer dîkin daku dewletek ku jî Kurd û Tirkên pêkhati ava bîkin. Lê Mîstefa Kemal lî ser soza xwe nasîkine.

Celadet Bedirxan dawiyê lî Almaniyayê huqûqê dixwîne, diploma doktrîyê digre. Dî 1932'an de lî Şamê kovara Hawarê û dî 1942'an de jî kovara Ronahi'yê derdixe.

Wî gelek kitêb jî nivîsîne, jî wan hînek Gramera Kurdi-Kurmanci Elifba Kurdi, Rêzîmana Kurdi ne.

Cemît Bedirxan: Kurê Celadet Bedirxan e. lî Almaniyayê dimine.

Emin Ali Bedirxan: (1851-1926) Kurê Mir Bedirxan e. Demekê mufettişê edliya Edirnê bû. Wek Kurdistan Tealî Cemiyetiyê dî avakirina gelek komelên Kurdan de cih girtiye. Bavê Kamûran û Celadet Bedirxan e.

Ferîd Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e. Dî Teşkilat-î İctimai-



● Malbata Bedirxaniyan. Hefs bûne, surgûn bûne, idam bûne... Lê jî welatperweriyê daneketine.

ye Cemiyetiyê de kar dîkir.

Hidayet Aziz Bedirxan (Hidayet Zapsu); Keça Aziz Bedirxanê kurê Mir Bedirxan e. Jîna Evdîrehîm Rehmiyê Hekkari (Abdurrahîm Zapsu) ye. Lî Îstebolê hatiye dunyê. Xwesiya nivîskar û xebatkarê kurd Musa Anter e. Dî 1975'an de wefat kiriye.

Huseyin Kenan Paşa Bedirxani: Dî 1913'an de lî Îstebolê wefat kir. Kurê Mir Bedirxan e.

Huseyin Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e. Dî 1910'an de hat idamkirin.

Kamûran Ali Bedirxan: (1895-1978) Kurê Emin Ali Bedirxan e. Lî Îstebolê hatiye dunyê. Dî avakirina Xoybûnê de beşdar bû. Lî Alma-

nyayê lî ser huqûqê doktora kiriye. Dî 1943'an de lî Beyrûdê rojnama Roja Nû, Stêr û Neynîk derxist. Demekê lî Parisê lî Universita Sorbonê dest bi mamostetiya Kurdi dîke. Dî 1978'an de lî Parisê çû rehmetê.

Kamûran Bedirxan nêzi 30 kitêb nivîsîne. Hînek jî wan ev in: Elfaba Min, Langue Kurde, Xwendina Kurdi, Türkçe İzahlı Kürtçe Gramer, Proverbes Kurdes.

Kamûran Bedirxan û Nazîm Hikmet şîrê diya hevdu vexwarîne, jî qewlî tirkên ve "süt kardeşi" ne, yan jî bî Botanî "şirji" yê hev in.

Kamil Bedirxan: (1872-1934) Lî Îstebolê hatiye dunyê. Kurê Mir Bedirxan e. Dî avakirina Kürt Neşri

Maarif Cemiyetiyê de cih girtiye.

Leyla Bedirxan: (1908-1986) Balerina navdar a Kurd e.

M. Salih Bedirxan: (1852-1915) Biraziyê Mir Bedirxan û bavê Rewşen Bedirxan e. Dî kovarên Rojî Kurd, Hetawî Kurd û Yekbûn de gelek nivîsên wî yê bî Kurdi û Tirkî derketine. Lî Şamê miriye.

Mahmut Bedirxan: Bavê Salih Ewnî Bedirxan e.

Mansur Bedirxan (Çînar): Neviyê Mir Bedirxan e. Ew bî xwe dî ordiyê de yuzbaşî bû.


Meziyet Ali Bedirxan (Çînar): Keça Emin Ali Bedirxan e. Ew û Nazîm Hikmet jî alî dê de merivên hev in. Ew heta 1978'an jî jiyaye. Mala wê lî Îstebolê ye.

Kıtabê ma yê Kirdki

● Leheçya Kirdki ra ca ra ca Zazaki, Kirmancki, Kirmanci, Dimili, Dimli, Dimilki zi vajiyêno. Bî na leheça hetani ewro nê kitabî vejîyayi:

Mewlîdê Kirdi:

Zanayîşê mî gore kitabo verêno kî bî leheçya



● Biyîşa Pêxemberî

Kirdki nusîyayo Mewlîdê Kirdi yo. Mela Ehmedê Xasî (1863-1950) no kitab 1898 dî nuştî. Şairê ma Ehmedê Xasî, yew deme Licê dî

muftîyey zi kerda.

Mewlîdê Kirdi, 1899 dî Diyarbekir dî çar sey tene (hebi) çap biyo (metbe'a ro gunawo). No mewlîd, menzûm o, 378 beytî yo û 29 rîperri yo. Her mîsraya yê 11 hecey a. Herçîqas kî verniya nê kitabî dî namey yê "Mewlîdî Nebîyî'l-Qureyşî" yo zi peyniya yê dî Ehmedê Xasî yew ca dî bî leheça Kirdki (Zazaki) wîna vano: "Temam bî viraştîşê Mewlîdê Kirdi..."

Mewlîdê Kirdi yo kî mî cor ra behsê yê kerd, raya (fina) verîni Diyarbekir dî bî herfanê 'Erebki çap bîbî (neşr bîbî). Labelê şerra 1985 dî



● Diyarbekiro Xopano

'eynî mewlîd Frensa dî, Paris dî hûmara çarîna kovara (mecmu'aya) Hêvî (kovara Enstituya Kurdi) dî bî herfanê Latinki çap bî.

Biyîşa Pêxemberî (Mewlûda Nebî):

Hewawo kî ez zana kitabo diyîno kî bî leheçya Kirdki çap biyo zi yew mewlîd o. Namey nê kitabî Biyîşa Pêxemberî (Mewlûda Nebî) yo û 'Usman Efendiye Babîjî (?-1932) nuştî. 'Usman Efendi bî xwî dewanê Sêwregî (Siverek) ra Bab ra yo û demeyê Sêwregî dî muftîyey kerda.

'Usman Efendi, Biyîşa Pêxemberî (Mewlûda Nebî) 1903 dî nuştî. No kitab 1906 dî erşawîto (riştî) Diyarbekir kî wîca çap bîki labelê kesê kî çapxane (metbe'a) dî bî nêşîyayo bîwani, cûka zi çap nêbiyo. Faiz Beg Bedir-



● Ferhengê Dimilki-Tirkî

xanî yo kî Meşrûtiyet (1908) ra pey Puturge (Pötürge) dî yew deme qaymeqamey kerda, no kitab xwî reydi berdo Estembul (İstanbul) kî yê

Niv-dewletek



● Kamûran Bedirxan lî Univer-sita Sorbonê mamos-tê kurdi bû.



● Sureyya Bedirxan û Mir Celadet Bedirxan.

XATIR BE TO 2932!

● ROJNAME, bi neşrbî-yayina xo, Tîrkiye de yew cayê tolê (veng) muhimi dekeno. Vejiyayina nê gazetî, dî hetî ra zaf muhim a. A yewine (juyine), o do şikîtena tabûyanê nê wari rê yadim bîko, averşiyayen û xurtbî-yayena zîwanê Kurdîkî rê xîzmet bîko. A diyine, o do pratîkê serdestanê ke serbest-bîyayina zîwanê Kurdîkî mas-mediya (kamuoyu) dînya û Tîrkiye rê ilan kerda, aşkera (eşkara) bîko.


Bêguman roja ilanbîyayina Cumhûriyeti ra heta ewro, politikaya zordestî û ta'daya serdestanê Tîrkiye ra zafê zafan kultur û zîwanê Kurdîkî zîrar diyo. Politikaya dîşmenki ya ke tetbîq bi, nê-verda ke no kultur û no zîwan xurt bîbê, aver şîrê. Labelê vera nê karanê negatîfan zî (menfiyan ki), seveta xover-rodâyina (direnîş) gîrd a mîl-leta ma ra, fîna (reyna) kesi bese nêkerd (nêşîya) kultur û zîwanê ma orte ra wedaro. Vayîya xîzmetkerdena zîwan û kulturê Kurdîkî zaf zaf bi. Ez mucadeleyê roşenîyanê (aydınlar) Kurdan ke vera nê riskan hemîni kerdo, bî hur-met ana xo vir.

Dînyaya medenî zaf xebîti-yay, gureyay ke zîwanan û kulturê vîndîbîyayan vejo meydan labelê Cumhûriyetê Tîrkiye orte ra wedardayena zîwan û kulturê Kurdan ra caran (qetyane) fek verra nêda. Seveta nê hedefî ra, yî-nanê ke Darbeyaya 12'ê Eylula 1980 kerdi, qanûnê bî hûma-ra (sayî) 2932'y bî kêfweşîye vet. Seveta nê qanûnî ra mordemî (mordîmî) şerm kerdê. Peyniya mucadele-kerdene de, Hukûmatê Turgut Özal'i mecbûr mend ke nê qanûnê şermezariye wedaro (hewa no). Labelê herunda nê qanûnî de zewbî (sewbî) qanûn nêrona. No tenzîmo (düzenleme) kî

îqtidarê siyasi û parlamentoy nêardo ca, ROJNAME do bîxe-bîtyo kî bî vejiyayîşê xwî pratîk dî bîyaro ca. ROJNAME wezîfey musnayî (nawîtiş) û deşîfrekerdena rîyakareya serdestan a vera zîwan û kulturê Kurdan gêno xwî ser. Çimki serdestanê ma, vera masmediya Tîrkiye û dînya, serbestiya zîwanê Kurdîkî ilan kerde. Tewîr-tewîr cematanê (toplantî) enter-nasyonalan dî zî no ilanê xwî bî westayey xebîtna. ROJNAME, do vera masmediya Tîrkiye û dînya raştîko serbestbîyayînan yan zî nêbîyayîna zîwanê Kurdîkî bîdo îspatkerdene. Seveta ney ra, ve-jiyayîna ROJNAME'i çendî vajî ehendî muhim a. Muhîm a, çimki azadbîyayînan û nêbîyayînan zî-wanî, gurênayînan (xebîtnayîşê) fonsîyananê cî ra girêdaye ya. Xora ROJNAME, do nê fonksi-yonan ra yewî (juyî) bîyaro ca. Seveta na ra, azadiya ROJNAME'i bena zey azadiya yew fonksiyo-na nê zîwanî.

Ez wazena û hêvî kena kî po-litakayê barbakîyê kî no ware dî heta ewro îcra biyê, tekrar nêbê. Heqê ma yo kî ma vajîm: Eke şîma neşîyatanê kî xurtbî-yayena zîwan û kulturê Kurdîkî rê xîzmet kenê rê destek nêbenê, qe nêbo vernî pîro megîrê, manî' mebê! Heto bin ra, ez hêvî kena kî ROJNAME bîbo destpêker (başlangîç) û neşîyatê neweyê bîni cî taqîb bikê.

M. Ali Eren



Muhammed Osman Bedirxan: Neviyê Mir Bedirxan e.

Miqdat Midhet Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e. 1898'an de lî Qahirê yekem rojnama kurdi, Kurdîstan derxist.

Nesrin Bedirxan (Çînar): Braziya Bedirxan Beg e. Dî 1949'an de wefat kir. Mala wê lî İstênbolê ye.

Necip Paşa Bedirxan: Bavê Evdurezzaq, Paşayê Osmanîyan bû.

Nevin Solh (Bedirxan): Keça Leyla Bedirxan e. Wek rojnâme-yan lî Mîsîrê kar dike.

Osman Paşa Bedirxani: Kurê Mir Bedirxan e.

Raşim Murat Bedirxan; (Çînar): Kurê Mir Bedirxan e herî dawî ye ku hetanî 1942'an jîyaye. Yek jî

endamên Kürdîstan Tealî Cemîye-tiyê bû. Hakîmî dîkîr. Navê kurên wi Aziz û Ahmet Çînar in.

Rewşen Bedirxan: (1909-) Lî Kayseriyê hatiye dînyê. Keça Salîh Bedirxan e. Kitêbek lî ser edebiyata Kurdi nivîsiye. Lî Sûriyê dimîne.

Sinemxan Bedirxan: Keça Celadet Bedirxan e.

Salip Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e. Wextekê Waliyê Şamê bû.

Salîh Ewnî Bedirxan: Kurê Mahmûd Bedirxan e.

Sureyya Ali Bedirxan: (1883-1938) Kurê Emin Ali Bedirxan e.

Huquq xwendîye. Demekê (1917) lî Kahîrê kovara Kurdîstan derdixist.

Dî rêxîstîna Xoybûnê de kar kirîye. Sîlêman Bedirxan: (1890-1912)

Kurê Xalîd Bedirxan e. Bî kurdi helbestên wî hene. Dî 22 salîya xwe de hatiye kuştin.

Tahir Bedirxan (Kutay): Kurê Mir Bedirxan e. Navê kurên wî Cemal û Kenan Kutay in.

Xalîd Bedirxan: Kurê Mir Bedirxan e û gora wî lî Beyrûdê ye.

Xelîl Rami Bedirxan: (1863 ?-1932), Apê Celadet û Kamûran Bedirxan e. Lî Bêrûdê mîrîye.

Vasîf Bedirxan (Çînar): Neviyê Mir Bedirxan e. Yek jî nêzikîrîn dostê Mustafa Kemal Atatürk bûye. Jî xwe ev paşnavê Çînar jî Atatürk lî wan kirîye. Vasîf Bedirxan wê demê Wezîrê Maarîfê bûye.

Mahmut Lewendî

ROJNAMÊN KURDAN LÎ TURKÎYÊ-RÛPEL 33



● Ez Çîzvîz Nêzana


wîca bîdo çapkerdiş. Labelê Estêmbul dî zî nêşîyayo bî-wanê û wîca dî zî çap nêbiyo. Peynî dî Celadet Bedirxanê rehmetî 1933 dî paytextê

Sûriye Şam dî no mewlîd bî herfanê 'Erebki ze (heze) kî-tab çap kerd.

Bîyîşa Pêxemberî ya kî Şam dî çap biya, 46 rîperri ya. 'Eynî kitab 1985 dî Frensa dî, Paris dî hûmara çarîna kovara Hêvî dî bî herfanê Latînkî zî çap bi.

Beyatname:

No kitabek (broşûr), Şêx Selaheddîni (lajê Şêx Se'îdî) mîridanê xwî ri bî lehçeya Kirdîkî nuştîbî. Zekî mî vir dî mendo des-pançê rîperri bî û 1977 dî çap bîbî. Ebadê yê zî wurdêk bî. Te de behsê zîkîr, wîrd û 'îbadetê muslu-mananê neqşîbendîyan bîni. Nê kitabekî ser o tarîx û cayê



● Na Xumxum a

çapbîyayîşî nuşte nêbî.

Dîyarbekîro Xopano: Azad Dîlêrî no kitab nuştî, Derwêş Weli zî redakte kerdo. Te de çend şîrê Azad


Dîlêrî û çend dêrî (kîlamî) estê. Dîyarbekîro Xopan o, bî Kirdîkiya (Dîmîlkiya) Çêrmûg û Sêwregî nusîyayo. 1986' dî Almanya dî çap biyo, 60 rîperri yo.

Ferhengê Dîmîlki-Tîrkî:

No ferheng (sözlük), Malmîsanîjî hazîr kerdo. Te de 20 000'î vîşêr kelîmey û ta'bîrî (deyîmî) estê. Kitab 1987 dî, şarîstananê Swêdî (İsveçî) ra Uppsala dî vejîya. Ferhengê Kirdîkî (Dîmîlki)yo verên o, 431 rîperri yo.

Ez Çîzvîz Nêzanan:

Arêkerdîxê (derleyen) nê kitabî Azad Dîlêr o. Derwêş Weli redakte kerdo û Enstî-tuya Kurdi-Şaxê Almanî



● Herakleitos

1987 dî şarîstanê Bonn'î dî çap kerdo, 72 rîperri yo. Bî Kirdîkiya (Dîmîlkiya) Çêrmûg û Sêwregî nusîyayo. Te de meseley, fîqrey û îstanîkî


(estanîkî, sanîkî) estê.

Na Xumxum a: Namey arêkerdîxê nê kitabî Koyo Berz o. Kitab dî, dêrî (deyîrî), fîqrey, meseley, hikayey û îstanîkî estî. Tekstê (metnê) folklorî yê kî nê kitabî dî yê, bî şîweya dormarê (çoşmeyê) Sêwregî yê. No kitab xezîna folklorê ma ra ze yew qevda vîlîkanê bûyweşan o. Kitab 1988 dî, Swêd dî vejîyayo, 213 rîperri yo.

Herakleitos:

Nê kitabî dî şîrê Malmîsanîjî estê. Weşanxaneyê Jîna Nû Uppsala dî miyan dî 1988 dî no kitab veto. Kitab 51 rîperri yo.

MEHMET ALİ KUT XWEDIYÊN XELATA NOBELA PAR Û ISAL DIDE NASÎN



● Octavio Paz, xwediye xelata Nobela par, dixwaze dunya ku Xwedê dev jê berdaye izah bike.

Nasyonalisteki enternasyonalist

Dost û hemwela-tiyê Octavio Paz, Carlos Fuentes, derheqê wi de weha dibêje: "Lawê Meksiko, birayê Amerika Latin, xortê Spanyayê, lawê navmali yê Fransa, İnglistan û İtalyayê, mewanê daimi yê Japonya û Hindistanê û di ber re ji Lawê Amerika Yekbûyî."

Bî gotineka din, Octavio Paz nasyonalisteki enternasyonalist bû.

Xwediye xelata edebiyatê ya Nobela par, Octavio Paz, di 31'ê adara 1914'an de li Meksiko City hatiye dunyê. Paz ji hêla bav de ji malbateka mestis (yani rûniştewanên Meksika yê kevn) û ji hêla dê ve ji Spani ye. Di malbata Paz de yê ku ji berê ve tê nasin bapirê wi bû. Kalikê Paz nivîskar û rojnamevan bû. Di wexta xwe de bi xurtî li dij kolonyalistên Frensi şer kiribû.

O. Paz şîrên xwe yê pêşin di hîvdesaliya xwe de, di kovara Barandal de çap kirin.

Pirtûka Paz ya pêşin (Luna Silvestra: Hiva Kovi) di 1933'an de

derket. Paz di sala 1937'an de diçe Spanyê, beşdari kongreyeka nivîskarên antifaşist dibe. Li wêder gelek şexsiyetên edebî dinase. weki Şairên Spani Machado û Cernûda, yê Amerika Başûr Nerûda, Vallejo, W H Auden û Tristan Tzara.

Baweriya wi ya bi komunizmê sist bû

Paz weki gelek nivîskarên Latin Amerîkî, ji hêla siyasî ve çep bû. Lê piştî peymanê navbera Hitler û Stalin baweriya wi bi komunizmê sist bû.

"Edebiyat dê nikaribe dunyê xelas bike, lê qe nebe dikare wê berbiçav bike: Wê temsîl bike, bi gotineka din, analîz bike. Helbet carîna ji biguhêre. Lewra divê em bîzanîbî ku analîza heqîqetê her gav bi rexne ye."

Ew heqîqeta ku Paz dixwaze analîz bike û biguhêre, helbet di derêca pêşin de ya Meksîkayê ye. Tecrubeyên şexsî û entelektueliyek pîrralî rê jê re vekirîye ku derbarê welatê xwe de perspektîveka xurt girtiye.

Lê Paz weki entelektueleki Meksîkî çendî ku li ser meselên welatê

xwe û Amerika Latîn mijûl bûbe û di vi wari de xwe mesûl ditibe, bi qasî wê ji li ser problemên dunyê mijûl bûye.

Paz bi pênuşa xwe sinorê nivîskariyê fireh kirîye. Tenê roman ji ew beşa nivîsinê ye ku Paz xwe têde ne ceribandîye. Weki din di hemî beşên din yê nivîsinê de meriv eserên wi dibîne.

Li ser pîrseka kovara "Magazine Littéraire" Paz weha dibêje: "Ez ji ekolekê tem ku şair di ber şîrnivîsîna xwe re bi huner û musikê ve ji mijûl dibe, weki misal Baudlaire, Valéry û Breton..."

Kulturên cihê yek bûne

Li ba Octavio Paz kulturên cihê yek bû ne. Lewra meriv vê yekbûyîne ne tenê di warê biyolojîk de, her wusa di warê edebî de ji bi xurtî dibîne. Paz zanava xwe bi diroka welatê Meksîkayê ya giştî ve izah dike. Lê digel vê ji şîr û essayên wi re heka xwe ji romantîzm û sembolîzma Ewropî digirin.

Rexnegir pêşketîna nivîskariya Octavio Paz bi du babetan izah dikin. Ya pêşin: Rêya wi ya ku di

SERKÊLNIVÎSEK BO ŞAÎREKÎ

Ew dixwaze bistirê, bistirê
Bo ji bir bike
Jina xwe ya rastî ji derewan
Û bir bine
Jina xwe ya derewin ji راستiyan

Octavio Paz

nav kulturên cuda re derbas bûye. Rehên wi ji dunya mitolojiya Meksîkoyê ya beriya kolonyalizmê derdikevin tîn salên sihiyên Ewropayê û şerê Spani yê daxilî. Ji wêder rêya wi diçe Frensê û ji wêder ji diçe Hindistan û Japonyayê.

Li van welatan Paz bi baldari li ser kultur û edebiyata wan di-seki-ne. Ew tiştên ku lê tesir dikin di-neqîne, di şîr û nesra xwe de bi şarezayî bi kar tîne.

Divê meriv li realita jibîrbûyî bigere

Ya din ji ev e ku Octavio Paz bi sê gehinekên edebî ve mijûl dibe: Ya mitolojîk, ya surealistî û ya lingvîstîkî.

Paz dibêje: "Sedsala me wêneya dunyayê, ya çaxên berê hunda kirîye, bîyî ku şûna wi tîji bike. Politîka, spor, mode, televîzyon dixwaze vê valahiyê tîji bike"

Paz êrişê dibe ser exlaq û baweriyên dema me: "Bi dû ku ilm, ol û metafîzîk da xwuyani kirin ku tîn nêkin, wê çaxê divê meriv li heqîqeta jibîrbûyî vegere".

Paz di vê lêgerîna xwe de alîkariyê di surrealîzmê de dibîne. Ji bo wi surrealîzm ne bi tenê stileka şairiyê ye. Lê metodekî izahkirîna jiyanê ye. Ew dide xwuyani kirin ku meriv dê çawan di dunyayeka ku Xwedê dev jê berdaye de bîji.

"Aqimendiya modern ne ji felsefê, ji huner tê. Ev ne aqimendi ye, seyr e, lê şairane ye. Sedsala berê jê re romantîzm digotin. Lê ji nivê sedsala me û vir ve jê re surrealîzm tê gotin" (Corriente alterna, 1967)


Beşeka mezin ji eserên Paz essay-în. Essayên Paz tev ji kompozîsyonên kurt û dirêj pêk tînin û derbarên huner, edebiyat, film û antropolojî de ne. Yek ji yên girîng ji Passion Critica ye, ku ji hevpeyvînên pê re bûne pêk hatiye.

Tiyatroyek û 700 rûpel şîr

"Essay" (ji qewlî Turkan ve "deneme") gotîneka ku di gelek zîmanan de bi kar tê, heta ji bo pirtûkên dirêj ji, weke minak pirtûkên felsefî û yê biyografî. Di nav eserên Octavio Paz de ji van herdu babetên essayê ji hene.

Şîrên Paz ji di bendeke pirtûk Poemes (1935-1975) de hatine cîvandîn, nêzi 700 rûpelî ne.

Deri vê Octavio Paz tiyatroyek ji nivîsi ye: La hija de Rapaccini (Keça Rapaccini)



M. Ali
Kut

ÇIROKEK JI
**NADINE
GORDIMER**
WERGER:
M. ALİ KUT

"Efû" yek ji çirokên dawin ên Nadine Gordimer e, ku hê li Turkiyê çap nebûne

Wextê me bi-hist ku ew berdane, ez li dora bexçe tevi bazdam û di nav çepelê re çûm nik ciranana

ku wan teva pê bihesinim. Bi dû wê de bû, cara pêşin min dit ku kirasê min, dema di nav têlan re derbas bûme diriyaye û li ser milê min ji birineke biçûk heye, xwin jê dihat.

Wi beriya neh salan ji vê derê bar kiribû. Li ba şirketeka inşaatê karek girtibû. Li ezmên diwarên cam lê-dikirin. Herdu salên pêşin ji mehê şemiyekê û du hefteyan ji nêzi cejna Noelê dihat mal. Belê wê çaxê bû wi ez guheztim. Û dest pê kir qelenê min da. Min û wi me bawer dikir ku ewê di sê salan de qelenê min tevi bide û emê bizewicin. Hêj wusa wi dest pê kir atlêt li xwe kir, ji min re behs kir ku derbasi sendiqayê bûye û behsa girevê ji kir, ku ew çawa yek ji wan bû ku çûbûn bi çawîş re axaftibûn, ji bo ew çend kesên ku piştî grevê ji kar hatibûn avêtin. Ew her dem di axaftinê de xurt bû. Heta bi inglizi ji - li gund, li dibistanê ew yê zirektirîn bû, wi rojname ji dixwendin; ewên dema me ji dikandarên Hindi tişt dikirin, weki sabûn û şekir, ku dukandar dixistin nav lê dipêçan û didan me.

Li cihê ku şer derketibû, di nav rûniştavanên kolitan ("geckon-duyan") de tevlihevi hebû, li wê derê bi tenê diwaneka wi ya razanê hebû. Wiya bi tenê ji min re bahs kir- tenê ji min re, ne ji extiyaran re- li wan cihên xelkê li hember tade û neheqiya ku li me dibû seri hildan, eva ji bo me teva dikirin, çî li gundan û çî ji li bajaran, sendiqe ji li aliye wan bûn, ew ji li aliye wan bû. nutuq dida û beşdari mitingan dibû. Sala sisiyan me bihist ku ew di girtigehê de ye. Li şûna ku ji xwe re bizewuce. Me nizanibû li ku girti ye, ta ku ew derxistin mehkemeyê. Mehkema wi li bajareki gelekî dūr bû. Min nikaribû her car biçim mehkemê. Ji ber ku ez nuha diçûm dibistanê sîfîna heştan û him li dibistanê û him li bexçe kar dikir. Ya din ji perên dê û bavê min zêde tunebûn. Herdu birayên min ku çûbûn bajêr ji bo ku kar bikin tu pere rê nedikirin malê. Qey ew ji li ba dostikên xwe yê keç dîman û mecbûr bûn ku ji wan re tiştan bikiriyana. Bavê min û birayê min yê sêyemin li ba xwediyê erd kar dikin û mehaniya wan pirr hindik e. Weki din du bîzînen me hene û çend mange ku destûra me heye em wan li mîrgê biçînin. Deri van ji mişarek erdê me heye. Diya min li wêder dikare hêşinahîyê biçîne. Lê ji tiştên wusa pere nayên.

Dema min ew di mehkemê de bi bedlê hêşin, îşlîgê xet-xeti û qerewata qehwerengi ve dit pirr çeleng û lihevhati bû. Ewên ku mehkeme dibûn -wi ji wan re "hevrê" digot- tev bi kincên xweşik û lihevhati pêçayî bûn. Sendiqayê ji wan re ev cîl kiribûn ji bo ku hakim û sawci bawer nekin ku ew ji mina wan ehmeqên reşik in, ku tenê dibêjin belê başe û ne tişteki din, bîyî ku tu mafên xwe bizanibin û li wan xwe-di derkevin. Eva û hemi tiştên din derheqê mahkemê de wi bi xwe ji min re qal kir, dema min destûr girt



● Nadine Gordimer, têkoşera azadiyê li Afrika Jêrin û xwediyê xelata edebiyatê ya Nobela isal.

ku wi li girtigehê ziyaret bikim. Keçikek ji me re çêbû dema ku hêj mehkemeya wi didomand û wexta min ew cara pêşin bi xwe re bir mehkemê bo şani wi bîdim, hevrêyan pêşi ew hemêz kirin û paşê ji cihê tawangiran di ser deraban re ez ji hemêz kirim û bi dû re ji hevrêyan perên ku di nav xwe de civandibûn dane min weki diyariyekê bo keça me. Wiya navê keçikê Inkululekao dani.

Di dû demekê re mehkeme qediya û 6 sal ceza danê. Bi dû re ji ew rê-kirin Giravê. Me teva Girav nas dikir. Serokên me ji mêj ve li wê derê dîman. Lê min qet derya nediti bû, bîyî dema ku min li dibistanê wêneyên derya çê dikirin û dixwest wêya bi rengê hêşin bixemilînim. Weki din min qet nikaribû xeyal bikira ku perçeyek erd bi serê xwe dikane li nav be. Min ancax dikaribû bi dû mangeyan de fikra rêxê bikira, wexta ku di ser koncalek ava baranê re derbas dibûn, ewa serav dibû û çawan ezman di avê re weki ku di neynikê re hêşin leylan dida. Min şerm dikir ji bû ku min bi tenê ev tişt dikirin. Wi ji min re qal kiribû ku çawa darên li kolanê di wan diwarên cam re xwuyani dikirin û avahiyên din li kolanê, rengê teksiyani û ewr wextê ku menceniqê ew bilind dikir ser plat-formeke bilind-bilind di nav ezmên

re ji bo ku li cihê avahiyê yê bilind-tirin kar bike. Wi ancax dikaribû mehê nameyekê bigire. Ew ji nama min bû, ji ber ku dê û bavê wi nizanibûn binivîsin. Ez carna diçûm min ew li wi gundê ku wan lê kar dikir, ziyaret dikirin û ji wan dipirsi ku çî dixwazim jê re bibêjin. Diya wi her gav digiriyay, destên xwe didan serê xwe û tişteki nedigot, û kalo ku her yekşem ji me re şîret û dua dikirin digot ji lawê min re bibêje ku em dua dikim, Xwedê hertiştî hel dike wê ji bo wi ji ya baştirîn bike. Carekê wiya paş de nivîsi: ji xwe problem ev e- xelkê me li gundan dibihise ku Xwedê dizane ji bo wan ya baş çî ye û li wê gorê dike, wusa ku ew bi xwe re tu qewetê nabinin ku jiyan xwe biguherînin.

Piştî du salan me - ez, dê û bavên me - têra xwe me pere civandibûn, êdi em dikaribûn biçûna bajêrê Zorave, wi ziyaret bikin. Em bi tirênê çûn, wê şevê em li istigehê raketin û rojtira din me cihê gemiyê pîrsi. Xelk ji me re baş bûn; teva dizani bû, dema meriv bixwaze biçe cem gemiyê ji bo wê yekê bû ku miroveki meriv li Giravê heye. Û li wêder bû -derya li wêder bû. Ew kesk û hêşin bû, bilind dibû û dadiket, di rengê spi de heta bi ezmên xwuyani dikir. Bayeki gelekî xurt dest pê kir, ji vê hêlê de û ji wê hêlê de. Girav ji ber çavan hunda kir. Lê xelkê min me ku ew ji li hêviya gemiyê bûn, nişan dan ku Girav divabû li ku biketa. Girav gelekî dūr li nav derya avê diket, ku

min qet bawer nedikir wê wusa be, lê rast bû.

Li wê derê gemiyên din ji hebûn, min avahiya mezin bûn, diçûn li dunyê li gelek cihan digiriyana. Lê gemiya me tenê diçû Giravê, bîyî Giravê li dunyê ne diçû tu cihên din. Me di gel xwe jê re şekir, paste, pantoreki dirêj û paltoyeki anibû. (Jinekê li kêleka me got ku ewê destûrê nedin ku em cîlan jê re bibin)

Û êdi di serê min de ew kumê ku keçikan li gund dida serê xwe tunebû, -min merhemeka poran ji wi etarê ku li ser basklêtekê di navbêna gundan de etari dikir, kiribû. Û porê min di bin şarpeyeka ji rengê kulilkan xemilandi de şekirî bû. Şarpeyê ser guharên zêrin negirtibû. Diya wi egalek di ser kirasê xwe re li ser nava xwe girêdabû. Jinekê gundi bûm, lê min wan qizên li wêder tevan xweşik bûm.

Dema gemi amadebû ku me hil-de, em hemi nêzi hev û bêdeng ra westibûn. Mina dewarên ku derbasi hundirê hewşekê bibin. Zilameki her tim li dora xwe mîze dikir, argûşkên wi radibûn û nîzm dibûn, wi dihejmart, xofek ketibû dilê wi ku yê li gemiyê siwar dibûn pirr bin û paşê belki cih jê re nemmine. Wi ne dixwest li wir bîmine. Teva dest pê kir ber bi polêsê nobedar ve çûn û ewên li

pêşberi me tev li gemiyê siwar bûn. Lê dema ku dora me hat wi min ku tişteki bixwaze destên xwe dirêj kir, min nizanibû bê çî dixwest.

Destûra me tunebû. Me nizanibû ku beriya meriv tê bajarê Zorave û beri ku meriv tê cem gemiya ku diçe Giravê, divê destûrê ji polês bistine ku heta meriv bikaribe biçe girtiye-ki xwe li wêder ziyaret bike. Min xwest ku bi dengekî nerm, dostane jê rica bikim. Lê bayê deng ji devê min revand. Em siwar nekirin. Me dit gemi çawa hejiya, bejayi li dû xwe hişt û di ser avê re henki çû. Gemi her ku diçû li ber çavên me biçûk dibû. Ta ku êdi meriv nema tê derdixist ku ew e an teyrikeki reş e li wê duriyê xwe dadide binê avê û derdikeve.

Ya baş ew bû ku yekî ji yê din şekir û pastên ku me li gel xwe anibûn bi xwe re jê re birin. Paşê wi ji me re nivîsi ku ew tişt gihîştinê. Lê nameyeka nebaş bû. Bi rasti ji ne xweş bû. Ew li min hêrs bûbû: Min divabû bizaniba ku bê destûr nabe. Heqê wi hebû - min bilêten tirênê kirin û pîrsa rêya gemiyê kir, lê min divabû bizaniba ku destûra polis ji divê. Wi nivîsibû ku min sîfîna heştan qedandibû. Li bajêr ji daireka şewrdariyê hebû ku meriv dikaribû biçûya wêder, eva ji hêla kulisê ve idare dibû. Lê gund ji bajêr ewqasî dūr e ku em van tiştan nizanin û ne agehdar in. Weki ku wi digot; ev nezaniya me ku me jar û bindest dihele, ev nezani divê ji nav me rabe.

Me paş de tirên girt û em vegeriyan, em qet neçûn Giravê- me qet ew nedit di her sê salên din de ji ku ew girtibû me qet ew carekê ji ziyaret nekir. Me têra çûyina xwe nikaribû pere bicivanda. Bavê wi mir û min bi mehaniya xwe divabû alikariya diya wi bikira. Min jê re nivîsi ku derdê xelkê me yê bê peretiye her gav heye. Emê kengê bîbin xwediyê xwe û peran? Wê çaxê wiya nameyeka gelek xweşik ji min re şand: Ji ber vê ye ku ez li Giravê dimînim, ji te dūr im. Ez li vêder im ji bo ku wê carekê xelkê me ji bibe xwediyê xwe û her tiştên din. Gelek tiştên din di nama wi de hebûn lê -min tenêdikaribû gotina "îktidar" bixwenda, ew ji idara girtigehê ser xêz kiribû. Nameyên wi ne tenê bo min bûn; personalên girtigehê ew beriya min dixwendin.

Ew bi rêya malê de bû, bi tenê piştî pênc salan! Min wusa his kiribû wexta min eva bihistibû-ew her pênc sal ji nişke ve winda bûbûn-êdi hewce nedikir ku ez saleka din li hêviyê bîminim. Min rîsmê wi careka din şani keça xwe -me- da. Eva bavê te ye, tê malê, tê wi bibini. Wê li dibistanê ji zarokên din re qal kir, "baveki min heye wê were mal." Me dixwest ku bira ew zû were, Di wê navbêndê de ji me dixwest em bigihên, xwe amade bikin ku biçin pêşiyê. Diya wi li ba xaleki wi rûdinişt. Nuha tu malên bavê tunebûn ku ew min bibe wêder. Eger wextê me hebaya wê gavê bavê min wê çend spidar qut bikirana, min û diya xwe ji me yê kelpîç çêkirana û tev de meyê xaniyek ji min, wi û

“EZ LI HÊVIYA AZADIYÊ ME”

“EFÛ”
DEWAM
DIKE

keça me re ava bikira.

Me esehi nizanibû wê kijan rojê were. Dî radyoya min de me navê wi û tenê yê çend kesên din bihis-tibû ku wê ji girtigehê bêne berdan. Weki dî ji çavê min li cem dukan-darê Hindi bi rojname ketibû, The Nation, ku ji hêla reşikan ve çap dibû. Dî bergê pêşin de wêneyek hebû, wêneyê komek mirovên ku direqisîn û destên xwe li ba dîkîrîn -mîn wê gavê zû fam kir ku li ba wê gemiyê bûn. Çend zîlam hîldabûn ser milên xwe. Mîn baş nedit ji wan kijan ew bi xwe bû. Em dîpan. Gemiyê ew ji Giravê anibûn, lê me nîzani bû ku bajêr çendi ji cihê me dûr e.

Rojekê bi rasti ji hat. Roja yekşemê dibistan tunebû, ji ber vê min li gel diya xwe kar dikir, me garis û kundir paqij dikirin û hûr dikirin. Lî serê min şarpeyek kevn hebû, lê min dixwest ez xwe xweşik bihêlim.

Hevalên wi ew li piqabekê sîwar kiribûn û anibûn. Mîn xwest ez bazdîm, biçim xwe bişom, lê ew rawestibû gava xwe avêtibû û bang dikir; roj baş! roj baş! Hevalên wi li dorê bi dengê bilind qerf dikirin, tînaz dikirin û diya min destê wî girt û hejand. Ew bi çepilên vekirî ber bi me ve hat, ev zîlamê mezin bi kîncên bajariya û qundereya biriqandî; dema ez himêz kirim mîn destên xwe yê bi qirêjê dûr dikirin, tev bi herî bûn. Dîranên wi di nav lîvên wi re di rûçikên min re radi-bûn. Wi diya min ji himêz kir û wê dixwest ku keçika me ber bi wî ve bilind bike. Hindek mabû ku em tev bi ser hevûdî de biketana! Em hemî wusa gawekê bîdeng man. Keçikê xwe li paş diya min veşart. Lê wi keçik girt û ber bi xwe ve bilind kir, lê wê serê xwe ber bi milê xwe ve zivrand. Ew bi dengê nîzm pê re axîfî, lê wê bersiv neda. Keçik nuha şeş salî ye! Mîn jê re got ku xwe weke mindalan meke. Wê li min vegehand: Ev ne ew e.

Heval tev kenîyan, em kenîyan, wê ji bi rêya xwe ve bazda û wi got jê re wext divê heta ku ew fêrî min bibe.

Kiloyên xwe zêde kirine, belê geleki. Ew ku ewqasi qels bû. Berê min hestiyên laşê wî dikaribûn bihejmartina, lê nuha - wê şevê- wexta ku li ser min xwe dirêj kiribû ewqasi giran bû ku êdî nema dihat bira min ku bi vi awayî bû. Ewqas wext! Ecêb e ku mirov di zindanê de bi qewettir dibe; mîn dîgo qey wê xwarinê zêde nedîn wan û wexta ku derkeve wê geleki jar be. Teva got lê binhêrîn! Êdî nuha zîlam e. Ew kenî û kulma xwe li singa xwe da û ji me re qal kir: Ku çawa hevalan di hucreyan de hereket dikirin. Wi rojê pênc kilometran bazdîda, yani di wê hucreya biçûk

de di li dora xwe diçû û dihat.

Heta derengi şevê piste pista me bû, lê nuha ez fam dikim ew tiştina difikire ku haya min jê tune ye û ji hêlekê ve ji ez nikarim bi axaftina xwe serê wî biêşinim. Ya rasti ji ew e ku ez nîzanim çî jê re bibêjim. Ez jê bîpîrsim ku ev pênc sal di zindanê de çawa derbas kirin; an behsa dibistanê, an ji ya keçikê jê re bikim. Weki dî li vêder çî qewimiye? Qe ne tiştek.. Carna bi rojê dixwazim jê re bahs bikim ku di nava van pênc salan de me li gund çawa debara xwe dikir. Guhdari dike, bala wi dikşine, weki dema xelk ji gundên din tene balê wi ziyaret dikin û behsa ew bûyerên çaxê ew li wê Giravê bû bi serê wan de hatine, jê re dikin. Ew serê xwe dihejine, ji wan çend pîrsan dike û radibe ji piya xwe diwezînine. Ez dibînim ku bi vîya şani wan dide, ku bes e; hûşê wî diçe ser mijareka dî. Em yê li gundan geleki giran in; em tiştan geleki giran û hêdi dibêjin, wiya ji wusa dikir, lê berê bû.


Wi hê tu kare-ki nû ji xwe re peyde nekiriye, lê ew nikare li malê li ba me bîmine.

Me bawer dikir ku piştî pênc salên wê dûriyê, li nava wê derya hêşin û kesk wê paşê demekê li ba me bîmine. Lê piqabek an trumbêleka din her carê wî dibe û ew dibêje; qet meraq nekin, ez nîzanim bê kijan rojê ezê vegeim.

Pêşî min dipirsî; kijan heftiyê, heftiya bê? Wi hewl dida ku ji min re izah bike: Dî rêxistinê de ne weke ku di sendiqayê de bû, li wêder meriv her roj karê xwe dike û bi dûrê ji diçe cîvanan. Dî rêxistinê de meriv nîzane wê bi ku de biçê û nîzane wê çî wezîfe ji bo meriv derkeve. Û ji alî peran ve ji wusa bû. Rêxistinî ne weke kareki ku mirov bi mehaniya xwe dike - vîya ez dizanim ev hewce nake ew ji min re bibêje. Ev mîna ku meriv diçe Giravê, meriv vîya ji bo xelkê me tevi dike, ku hemî di feqiriyê de dijin ji ber ku ne pere û ne ji erdê wan heye- ew ji min re dibêje lê binhêre; weki misal mala dê û bavê min bigire, mala min, mala ku li benda wi bû û ku zaroka wi lê mezin bûye: Li vi cihê binêr dibêje; yê sipî xwedî erd in û dihelîn ku hun di koxikên wusa de bijin, ew ji ji ber ku hun jê re dixebitûn - bav û birayê te çandîni û gavanîya wi dikin, diya te destir-maniya wi dike û tu li dibistanê dixebitî bîyi ku tu imkan ji te re hebûn ku tu bibi mamoste. Yani em bûne perçek ji malê xwediyê erdan.

Mîn bawer dikir ku malek me tunebû ji ber ku ew li Giravê bû û yê me ji wexta me tunebû ku em malekê ava bikin. Lê wusa xwuya dike ku qet mala me tune ye. Nuha ez tê digihêjim ji ber çî ye.

Ez ne bê aqil im. Wexta heval bi piqabekê tîn cem ji bo ku sohbet bikin, êdî ez û diya xwe ji em li ba wan rûdînen. Piştî me çay û bira da wan êdî em ji wêderê naçin. Heval



ji bireya diya min pîrr hez dikin. Tev derbarê kultura me de diaxîfîn û yek ji hevalan her gav destê xwe davê ser milên diya min wê himêz dike û dibêje "diya me teva, diya Afrika." Carna heval wê geleki kîfxweş dikin wexta ku bahs dikin ku li Giravê tev de çawa kîlam digotin û dihelîn ku ew ji straneke gelêrî ya kevn ku herkesi dizanibû, bistirê. Paşê ew ji bi dengên xwe yê qalind li gel dibêjin. Kêfa bavê min jê re nayê ku dengê me wusa bilind derdikeve. Bavê min ditirse ku xwediyê erd pê bihise, ku mêrê min weke girtiyekî siyasi li Giravê maye û li ser erdê wi cîvanan pêk tine. Wê gavê ewê jê re bibêje ku ji vêderê barke, biçê. Lê birayê min dibêje; eger ku xwediyê erd ji we pîrsî, hunê bibêjin eva cîvineke dinî ye, em ji xwe re duan dikin. Bi dû ku kîlam diqedin diya min bi karê xwe ve radibe diçe.

Ez li wir dimînim û guhdari dikim. Ew wexta ku dikeve nav axaftinê jî bir dike ku ez li wêder im. Ez fam dikim ku behsa tiştê pîrr muhim dike, ji tiştên ku dema em tenê ne û ji hev re dibêjin, muhimtir e. Lê carna wexta yek ji hev rêyan diaxîfe li min dinîhêre, weke ku ez carna li mindaleki xwe yê dibistanê dinîhêrim û pê nişan dikim ku ez dixwazim ew tê bighêje. Zîlam ji min bersivêkê napên û ez ji naxîfîm.

Yek ji wan tiştê ku li ser diaxîfîn ev e ku li gundan xelkê organize bikin, karkeran weki bav û birayên min û yê berê mîna dê û bavê wi. Ez xwe fêr dikim ku evan hemî tîn çî manê: Mehaniyek asgari, wextê karkirina rojê, mafê grev û tatilê, mafê sigortayê, teqawutbûyin, mafê lîmalmayîne dema ku mirov nexweş be û heta bi mafê lîmalmayîne ji bo zarûkan. Ez bi hal im, bi rasti ji ez ducan im, lê eva problemeke

jinan e. Wextê ew di derheqê yê Mezin ewên Kal de diaxîfîn ez dizanim bê çêl kê dikin: Serokên me ew ji zindanê derketine. Mîn jê re got mindalek din bi rê de ye, wi got ev zarûk wê li welateki nû çavên xwe veke, ewê azadiya ku me ji bo wê têkoşîn dikir ava bike!

Ez dizanim ku ew dixwaze em daweta xwe bikin, lê nuha wexta me tune ye. Wexta wi bi zorê hebû ku zarokeki çêke. Ew tê cem min, mîna ku tê vêder ji bo ku xwarinê bixwe û cilên xwe biguhere. Paşê ji radîhêje wê keçika biçûk û li dora xwe digirîne, her wusa! - belê wusa, dikeve piqabê cem hevalan, serê wî ji fikran tîji ye, ew awirên zû-zûka weke li dû tiştê be ku mirov nabîne. Biçûka me hêj fersend nediye ku fêrî vi zîlamî bibe. Lê ez dizanim ku ewê rojekê ji ber wi serbilind be.

Çawa meriv dikare van tiştan ji mindaleka şeş salî re bahs bike? Lê ez jê re bahs dikim derheqê yê Mezin de û ewên extiyar de ku serokên me ne, ji bo ku bîzanibe ku bavê wê ji li Giravê bi wan re bû, ev zîlam ji meriveki mezin e.

oja şemiyê dibistan tune, ez zêrze-

Rwat diçînim û bi diya xwe re paqijiyê dikim, ew distirê lê ez nastirê; ez difikirim. Roja yekşemê kar tune, cîvina bo duakirîne ew ji dûr ji deri awirên xwedî erd li bin darekê û paşê ji vexwarina birayê li cem xaniyên me yê ji heriyê û êzingan ku xwedîerd destûr daye ku em li ser erda wi ava bikin. Lê ez xwe didim alî, bi serê xwe dimînim, weke mîn di zarotiya xwe de dikir, dema mîn ji xwe re listik diditin û xwebixwe

diaxîfîm li cîheki ku kesi ez ne diditim û ne dibihîstîm.

Geleki bi dû nivro de ye, ez li ser kevîreki germ rûniştîme, li jorê, berî di nav giran re tev dibe xeçrêyek, ku ji ber lingên min ve derdikeve. Ev tev erdê axê ye, lê ev ne rast e, ev ne yê kesekî ye. Heywan fam nakin ku yek ji wan re bibêje xwediyê vî mîhê evê han e. - ew kevîrên reş in, û paşê dibin mareki qalind û reş. Xaniyên me yê ji heriyê û ew dara beruyan ya extiyar û ew merşê qehwerengi ji axê ku diya min duh ji bin erdê kola bû, derxistibû û li wê dûrê ew komên daran li dora bixêriyan- ew li ser piştê vî dunyayê ne tiştek in. Ew dikare vî gavê wan dawêşîne, mîna ku kûçikek kelmêşekê ji xwe dawêşîne.

Ez li jor, li cem ewr im. Roka li paş min rengê ezmên diguherîne û ewr ji xwe hêdi hêdi diguherînin. Çendek soravî ne, û çendek ji spî ne, nepixî weke peq-peqonka ne. Li jêra wan xetek tari heye, ne ji ber ku wê baranê bîbarîne. Ew dirêjtir û taritir dibe, ew pozeki zirav û gewdeki dirêj digirê û dawiyê dibe boçek û paşê ji ew dibe mişkeki ecêb mezin û reş ku xwe li ezmên dilvine, ew ezmên dixwe.

Wêne hate bira keçikê: Wê got, ev ne ew e. Ez li vêder rûdînem ev cîhê ku ez her gav dihatimê gava ku ew li Giravê bû. Ez dihatim vêder ji bo ku ji yê din xelas bim, ji bo ku ez bi tenê bîpîm.

Ez bi çavan mişk dadîwerivînim, ew xwe wînda dike, formê xwe, ew ezmên dixwe û ez dipîm. Li hêviyê me ku ewê paş de vegere.

Dipê.

Ez li hêviyê me ku ezê paş de vegeim malê.

70 SAL: 92 KOVAR

Rojname pêşin a Kurdi, Kurdistan dî 22'yê Nisana 1898'an de li Qahirê derket. Ji wê rojê hetta iro nêzîkî 600 kovar û rojnameyên Kurdi derketine. Tenê li Turkiyê û li Kurdistanê Turkiyê nêzîkî 92 kovar û rojnameyên Kurdan derketine.

Em van malûmatan iro bi xêra xebata Mahmud Lewendî û Malmisanîj dîzanin. Ev herdu nivîskar piştî "Rojnamegeriya Kurdi li Turkiyê û li Kurdistanê Bakur" nuha ji hazîriya cildê duduyan dîkin.

Ji xebata van nivîskaran tê fam kirin ku grafîka derketina kovar û rojnamên Kurdi li gor pêşveçûna tevgera netewîya kurdi pêşde çûne an jî paş de mane.

Bêdengiyeka dirêj

Dî 1908'an de piştî ilana Meşrûtiyetê, li Îstebolê Kurd jî dest bi derxistina rojname û kovaran dîkin, komele û cemiyetan ava dîkin. Dî dema Şerê Cihanê yê Pêşin (1914-1918) de weşanên Kurdi dîskînin, dernakevin. Dî 1918'an de, piştî Mutarekeya Mondrosê, Kurd disan dest bi derxistina weşanan dîkin.

Piştî tevgera Kemalistan, dî navbêra salên 1920 û 1950'yê de bêdengiyeka dirêj heyê. Dî nava van herdu tarîxan de tu kovar yan jî rojnameyêke muhim derneketiye.

Lî derveyî yek-du îstîsnayan, jî bo salên 1950-1960'î jî mirov dikare her vi tiştî bibêje.

Bi guherîna Qanûna Esasî, piştî 1961'an li Turkiyê rewşek demokratîk a îzafî peyda bû. Hîn ronakbîr û welatparêzên Kurdan jî xwestin jî wê rewşê îstîfade bikin. Û dî 1962'an de dest pê kirin çend rojname û kovar derxistin. Lê her dî derketina wan de hukumatê pêşî li ber wan digirt û qedexa dikir.

Li zindanê jî kovar

Dî nava salên 1955 û 1975'an de, xwendekarên Kurd ên ku li Îstebol û Anqerê dixwendin, hin kovar û rojnamên kurdi derxistin, lê ne periyodîk bûn û carina cih didan hin nîvîs û şîirên kurdi jî.

Wekî tevgerên Kurdi, rojname û kovarên Kurdi jî dî nav salên 1974 û 1980'yê de gelek pêşde çûn. Dî nav van şeş salan de jî bîstî zêdetir rojname û kovarên kurdi derketin.


Piştî Îlona 1980'yê êdî tu kovar û rojnameyên kurdi nema derketin. Tenê piştî 1984'an dî Girtixana Diyarbekir de hin kovar bi awayekî îllegal jî teref Kurdan ve hatine derxistin. Mesela jî wan navê yekê Çandîya Berxwedan e.

Gelek jî van kovar û rojnameyan legal derdîketin, lê her tim dihatin qedexa kirin, ceza didan kesên ku dixwendin û belavdîkirin.

Kovar û rojnamên Kurdên Turkiyê

Şark ve Kürdistan, İstanbul, 1908,
Kürd Teavvün ve Terakki Gazetesi, İst, 1908
Kürdistan, İstanbul, 1908
Serbesti, İstanbul, 1909
Amid-i Sevdâ, İstanbul, 1909
Peyman, Diyarbekir, 1909
Rojî Kurd, İstanbul, 1913
Yekbun, İstanbul, 1913
Hetawi Kurd, İstanbul, 1913
Jin (kovar), İstanbul, 1918
Jin (rojname), İstanbul, 1919
Kurdistan, İstanbul, 1919
İrfan, Siwêreg, 1923
Gazi, Diyarbekir, 1923
Mezopotamya, Diyarbekir, 1925 (?)
Agri Agri Dîbarine, Agri, 1929 (?)
Gaziya Welat, Agri, 1929 (?)
Agri, Agri, 1929-1930
Dicle Kaynagi, İstanbul, 1948
Şark Mecmuası, İstanbul, 1950
Şarkın Sesi, İstanbul, 1950
Demokrat Dogu, 1950
Agri, Ankara, 1953
Şark Postası, 1954
Henek, Ankara, 1955 (?)
Miya Farkin, Farqin, 1955
Cudi, 1956 (?)
Dersim, Ankara, 1957
Ceride-i Dersim, İstanbul, 1957
İleri Yurd, Diyarbekir, 1958
Silvan Sesi, Silvan, 1962
Dicle-Fırat, İstanbul, 1962
Rêya Rast, İstanbul, 1963 (?)
Keko, Ankara, 1963
Deng, İstanbul, 1963
Rojî Nêwe, İstanbul, 1963
Kormişkan, Ankara, 1965
Çıra, Xarpêr (El'eziz), 1965
Yeni Akış, Ankara, 1966
Havar, Ankara, 1966
Uyanış, Ankara, 1967
Çıkar, Ankara, 1967
Diyarbakır Kültür, Ankara, 1967
Siverek, İstanbul, 1968
Hinistan Sesler, Ankara, 1968
Karakoçan, İstanbul, 1969
Diriliş-Mardin'in Sesi, Ank. 1969
Ezilenler, Dersim, 1969

Dogu, İstanbul, 1969
Dengê Serek, İstanbul, 1969
Şêresiyar, Bayezid, 1970
Adıyaman, İstanbul, 1970
DDKO Haber Bülteni, Ank. 1970
Bazalt Kent, Ankara, 1970
Ozgürlük Yolu, Ankara, 1975
Deprem, Licê, 1975
Heval/Yoldaş, 1975
Azad, Ankara, 1975
Xebat Bona Yekbûn û Rêya Azadi, 1976
Rızgari, İstanbul, 1976
Pêşeng bo Şoreş, 1977
Rojî Welat, Ankara, 1977
Diyarbakır Yol-İş, Diyarbekir, 1977
Demokrasi, Agri, 1977
Xebat ji bo Rızgariya Kurdistan, 1978
Devrimci Demokrat Gençlik, İst. 1978
Kawa (Kawa), İstanbul, 1978
Dengê Kawa, Ankara, 1979
Haber Bülteni, Bismil, 1979
Hewar, 1979
Ala Rızgari, İstanbul, 1979
Jina Nû, Wan, 1979
Ozgürlük, İzmir, 1979
Têkoşin, Entab, 1979
Ozgürlük Şafağı, Wan, 1979
Tirê, İzmir, 1979
Sesleniş, Batman, 1979
Beşiri'de Uyanış, Bişêri, 1980
Demokratik Egitime Dogru, Bedlis, 1980
Têkoşer, 1980
Xebat Ser Rîya Barzani, 1981
Hawar, Girtixana Diyarbekir, 1984
Çandîya Berxwedan, Hefsa Diyarbekir, 1984
Çirûska Jiyan, Hefsa Diyarbekir, 1984
Berhem, Girtixana Diyarbekir, 1984
Medya Güneşi, İstanbul, 1988
Toplumsal Diriliş, İstanbul, 1988
Ozgür Gelecek, İstanbul, 1988
Vatan Güneşi, İstanbul, 1989
Deng, İstanbul, 1989
Halk Gerçeği, İstanbul, 1990
Ozgür Halk, İstanbul, 1990
Yeni Ülke, İstanbul, 1990
Newroz, İstanbul, 1991



● Mahmut Lewendî li gel Malmisanîj hazîriya cildê duduyan dîkin, ku tede ci didin 600 kovar û rojnamên Kurdi.



MUSA ANTHER

Bînîhêr lawo, bê em jî ku hatin ku...
Lê ne bi xêra bavê xelkê em hatin vir.
Bî hepsê, bî kuştinê, bî îşkencê û bî xwinê em hatin vir.

Lê dunyayê lê dunyayê...

Dî 1943'yan de ez mudûrê "Dicle Talebe Yurdi" bûm. Rojêkê dî polês hatin Yurdê û ez girtim bîrîm "Birinci Şube" yê. Çawa ez ketim hundir, sê-çar polês li min civiyan, bî pîhînan, bî şeqeman û bî darên bi min ketin.

Ez şaş mam. Lawo ma min çî kîriye?

Mezinê wan got: "Hî kurê kerê tu nîzani te çî kîriye?"

Min got: "Na"

"Ma kero radyoya we tune?"

Min got: "Heye"

Got: "Xayin lawê xayinan, ev qas qawînên (sêlik, plaq) xweş ên bî Turki hene, çima hun dî Yurdê de bî kurdi difikînin?"

Sûcê min û sebeba lêxistina min, bî kurmanci fikandina me bû.

Paşê dî 1959'an de li Diyarbekirê, dî rojname "İleri Yurdê" de bî Kurmanci min şîirek nîvîsi. Navê şîirê, "Qimil Hat Lo Apo" bû.

Hoy babo tu ye û te bî kurdi nîvîsiye...

Celal Bayar û temamê sernîvîskarên rojnamên Turkan rabûn ser nîgan.

Hînekan dîgotin, "Serê wi bîperçiqîn"

Hînekan jî dîgotin, "Zîmanê wi jêkîn"

Ez girtim û kirim hepsê. Heta ku min xwe jî nav lepên wan xelas kir, nivê ruhê min çû.

Lê dî vi nivîrîhê min ê mayî de, elhemdülillah iroj dî paytexta Osmaniyan de, li Îstebolê, em rojname xwe ya bî zîmanê xwe dertînin.

Ez gelekî bextiyar im ku min ev roj dîtî, lê heyfa min jî ew e ku gelek hevalên min ên hêja bî wê hesretê çûn rehetê. Hêvî û bawerîya min ew e ku wê xortên me yê hêja roj bi roj bî vi karê xwe yê spehî dilê min xweş bikin û ruhê hevalên min ên çûyî jî şad bikin.

Berê Kurd bavik bûn: Paşê bûn eşîr. Lê iroj ez dînihêrim Kurd êdî bûne millet. Xuya ye ku bavik û eşîr dîtina wan teng e, tim neyarê hev in. Her bavîkek diji bavîkê din e. Her eşîr jî dijmîne eşîrek din e.

Dî tarîxa Kurdan de bî sed salan jî vi hawî Kurd perîşan û bîndest man. Lê ez dînihêrim iroj kurdi êdî jî van dubendîyan xelas dîbin. Dîbin millet. Yanê yekpare Kurd û Kurdistan.

Niviskari û navûdeng

Dî heştaliya xwe de bi diya xwe ya jinebi re, ez di nav pireke katolik û kaleki protestan de dijiyam. Li ber masa xwarinê her yekî bi dinê yê din tînazên xwe dîkir. Ev yekê ne ji ber nerindiyê bû, ev edetêke malbatî bû. Lê zarokê li hertiştî bi awakî cid-dî dinîhêre. Ji van tînazan, min netica bêrûmetiya herdu olan ji derxist. Ji bo ku ez weki katolikeki mezî bibim, çî ji destên wan hat, wan kir, lê ne bû. A ez di wê dema xwe de ge'ekî ji mirinê ditirsîyam. Çima? Dibe ku ez ji hêviya efsana dunya dî dîr bûm, loma Weki her zarokê min ji wê xaxê tîştina dîwîsîsand. Daxwaza jiyîna min ya piştî mirinê, bi mîraqa min ya nivîsandinê ve yek bû. Min dîxwest ku ez piştî mirinê di nivîsarên xwe de ji nû ve bi-jim. Bêguman ev edebiyata piştî mirinê- ya ku min dûre dev jê berda - di destpêkê de bû bîngehê xebatên min.

Xristiyanek bi gelemperî ji mirinê natirse. Lewre ji bo ku dest bi jiyana rastîn bike, divê ew bimirê. Ji bo ku meriv bi dunya aliyê dîn heq bînin, ev dunya ha ciyekî imtihanê ye. Ev ji hinek, vatîniyan, pereştînan, dua û daxwazî berbiçav divê. Sernermiyê divê. Divê ku meriv ji kêf û zewqê, ji mal û milk xwe dûr bixin. Min ev hemû tîştên ha digirt û diguherand qada edebiyatê: Lê heta ku ez bijiyama rûmeta min ê tune bûya, lê di nivîsarên xwe de bi nişmîtiya xwe û di hunera xwe de min ê bi paqîjiya ew jiyana bêdawi heq bikira. Navûdengê nivîskariya min ê ji roja mirîna min dest pê bikira. Şerên min yê muhim, bi min bi xwe re hebûn. Ji bo ku meriv li ser hertiştî binivîsîne, ma pêwîst bû ku meriv bi hertiştî bizanibûya? Aya diviyabû ez ji wek metranekî bijiyama û min wexta xwe bi rindekirinê bibuhuranda? Xuya bû pîrs pîrsa mirin û mayîniyê bû, hemû tîşt bi carekê re digirt nava xwe. Jiyana nivîsê, jiyana dîni di serê min de ciyê xwe girt. Hemû hiş û aqlê min li ser xelaskirina rûlê min bû... Dûre min dev ji van hemûyan berda û heta çêsalîya xwe ji ez li ser nefikîtim. Êdî min ji xwe nepîrsî ka ez ji bo çî dînivîsinim...

Ez nabêjim navê nivîskariyê min eleqedar nake, lê piştî derîkê maneyêke viya namîne. Dema ku mirin bi rastî ji tîrîn be, navûdengê dibe xapînokek. Çendekî beriya min ya yekî digot: Ez wusa dizanim ku qedera yekî, piştî mirîna wî bête zanîn, ji viya ka nbaxtîrîn tîşt tune ye. Ji nav me yekî digirin, ji kul û derdanê dikujin û piştî bîst û pênc salan ji bi navê wî beryadekî dadîçîkinin. Ew merivên ha, di a ew qeşmerên ha him di tujin û him ji li ser beryadê vegotaran digirin. Miriyekî bi şan û şerefê dikin ku bikaribin ji jiyana yekî dîni bi jahriyan.

J. P. Sartre

Zarûk li hemêza dayikên xwe bûn. Dayikên wan "Şembeliyê min loori, lori..." digotin ji wan re. Barana dawî hêj nû daketibû erdê. Pez ji dengê bilûrê dîr ketibûn. Darikên dewkulan hêj di sêpiyên xwe de bûn. Haya kesî ji tîşki tunebû. Ji nîşke ve hat. Weki birûsk li darê keve hat. Lê nesekîni, li tu ciyekî nesekîni. Te digot qey tofan rabûye. Her tîştî li bin guhê hev xîst. Ji bayê zûtir dîçû. Weki hespekî rewan di çiyayên asê de hildîkîşîya, li destên xalî zîtikan davêt.

Yê ku dihat ne sîwar bû, ne peya bû. Ne insan bû, ne heywan bû. Xeber bû. Xeberek nû bû. Xebera xêrê ninbû. Xeber ji ninbû, ferman bû.

Kevir û kuçikên xwe elelecele dan hev. Palasên xwe grêdan. Pez û dewarên xwe ji dan ber xwe û ketin rê. Ji kesî xatir nexwestin. Ji xwe kes nemabû ku Jê xatir bixwazîn. Tu eceleka wan tunebû, lê disa ji zû dimeşîyan. Car carîna li dû xwe dînhêrtin. Lê ne dua dikirin, ne ji nîfir.

Her ku dîçû pîr dîbûn. Jin, zarûk, kal, keç, xort, mêr. Herkes dîçû. Tevî pez û dewarên xwe ve dîçûn. Hevdu nedihêjmartin. Kesî nîzani-bû çend kesin. Lê ne sed, ne hezar ne ji deh hezar bûn. Weki xwelîyê pîr bûn û pîrtir dîbûn. Bi şev û bi roj dimeşîyan. Carîna ji hev re çirokan digotin. Carîna ji sitranan. Lê ji kezeba şewitî digotin.

Mirata rê nedîqediya. Ge pîr dîbûn, ge kêr dîbûn. Navikên zarûkên xwe zûzû dibîrrin û disa bi rêya



**Gelekên me dîzanin ku
Kurd li Parisê, li Mos-
kovayê, li Berlinê û li
gelek quncikên dunyê
hene.**

**Lê pîraniya me der-
heqê Kurdên Konyayê,
Anqerê, Çorumê û
Kîrşehîrê tîşteki nîza-
nîn. Loma me li Hüse-
yîn Kîşnîş'ê Kîrşehîrî (ji
eşîra Gawestî) doza
nivîsandinê kir. Fermo
nivîsa wî bixwinin:**

Piştî 300 salî merheba ji we re...

xwe de dîçûn. Carîna zarûkan dîşûştin, carîna ji pê re nedîgîştin. Wexta wan zêde tunebû. Ji zarûkên xwe re li navên xweşik nedîgerîyan. Lê wan tu car bê nav ji nedîhiştin. Muriyên xwe li her derî venedîştartin. Lê gava mecbûr bîmana ji gorên wan pîr kûr dikolan.

Birçî dîman. Bê xew dîman. Di-hatî şêlandin. Lê nedîsekinin. Piştî xwe dabûn welatê xwe, dimeşîyan. Gava gîhiştin Kîrşehîrê, êdî pîr

westiya bûn. Pez, mange heta bigî-hîje gayên bi wan re ji westiya bûn. Bûbûn weki darîkan. Êdî parsîyên wan yek bi yek xuya dikirin. Sekî-nîn. Bihna xwe dan. Zêde nefikîrin. Konên xwe vegirtin. Palasên xwe raxistin. Û ji warê xwe yê nû re navekî ji ditin: "Ga-westî"

Lê herkes li Gawestiyê bi ci nebû. Hinek ji wan disa ketin rê. Ji yê mayî xatir xwestin. Ji hev belav bûn. Û careka dîn meşîyan. Bi gelek

aliyan ve, ber bi Anadolû'yê ve. Berê xwe dan Konyayê, Bala'yê, Anqerê.

Yên ku li Gawestiyê man, derketin serê çîya. Li wê derê konên xwe vegirtin, bi ci bûn. Ji xwe re serokekî hilbijartin. Navê serokê xwe ji danin Lawê Tabûr. Lawê Tabûr yekî pîr serhişk bû. Bê tîrs bû. Ne paşa naz dikir, ne ji qazî. Ji zîmanê wan ji ji xwe tîşteki fêr nedîkir. Kîrîn nekîrîn zîmanê wan hin nebû. Jê re gotin, "weha nabe, vê derê welatekî dîne. Divê tu li gori qanûnên wan bîmêşî. Yan na wê serê te jêkin". Li gori qanûnên wan nemeşîya. Serê wî jêkirin.

Xelkê Gawestiyê bê serok ma. Yê ku fermana surgûna wan derxistibûn wan li vê derê ji rehet nehîştin. Navê zulma xwe danibûn "nîzam". Navê xugiyê ji danibûn "vergi". Paşiyê li gundê wan mektebekê avakirin. Mamosteyekî şan-dî ji wan re, neazellah. Navê ma-mostê Altan bû. Altan Xoce weki cendîrman bû. Hêj ji roja pêşî de zîmanê xelkê Gawestiyê "yasax" kir. Ki li hember yasaxa Altan Xoce derketa kutanê dîxwar. Cezayê per-dîda.

Roj derbas bûn, meh derbas bûn, sal derbas bûn. Êdî xelkê Gawestiyê bi zîmanê Altan Xoce ji zanibû. Lê navê Altan Xoce zûde ji bir kiribûn. Ne tenê navê Altan Xoce, navê gelek tîştên dîni ji bir kiribûn. Lê zîmanê xwe, edetên xwe, şahiyên xwe, şînen xwe ji bir nekîrîbûn. Çavê wan her tîm li rê bû. Meriv digot qey li hêviya tîşteki bûn.

Hüseyin Kişniş

WELATÊ XERÎBÎYÊ


Nivîskarê Kurd Erebe Şemo, ku bi trilogiya xwe ya pîr sade û naiv navdar e, yek ji wan nivîskaran e ku ez her tîm û bi kêfxweşî dîxwinim. Romanên vi nivîskarê bextreş ku di dema şerê cihanê yê yekem de, tevî malbata xwe, ji kuştina Osmanîyan reviya û çû li welatê Qafqasê bi cih bû, lê ji wê derê ji, di dema Stalin de, sirgûnî Sibîriyayê bû, her û her, bi awayekî pîr şexsî û insani, li dora van hisên hanê tîrî xaxistin.

His û şerma ku ew mehkûmî jî-aneke nehêja bûye, his û kesera ku ew nikare xwe bigîhîne merivên xwe û li hember wan xwe deyndar dibîne... His û daxwaza ku ew bi-karibe tîştên ku wî di jiyana xwe ya nû û kevn de winda û qezenc kirîne, bi welat û merivên xwe, bi dîne rabîgîhîne û nişan bide ku ew heye, bikêr e, ew nemirîye, neketiye.

Ji xwe bi xêr û alîkariya van hisan, wî di kampên mirinê yê Stalin de planên romanên xwe, di heşê xwe de, çekirin.

Ew di romanên xwe de, car bi car, behsa tîştên ku wî winda kirine û qezenc kirîne, dike. *Tîştên windakirî û qezencîrî...* Ez bawer im, jiyana sirgûniyê ji van du pey-vên zelal û basît tê pê.

Ez ji, her mîna Erebe Şemo, li welatê xerîbiyê, berî her tîştî, ke-



tîm nav "tunela windabûnê". Jiya-na min a nû bi windabûyîne dest pê kir. Berî her tîştî, min zîmanê xwe yê bav û kalan, hebûna xwe ya herî muqedes, bi gotina Albert Camus, welatê xwe yê zîkmakî winda kir. Bi carekê, zîmanê min bû hebûneke bêmahne û barekî giran. Wî hew dikaribû hêz û quwet, bawerî û rehetî bîda min û daxwazên dilê min, gotinên mejiyê min ifade bikî-ra.

Tevî zîmanê xwe, min huwîyet û şexsiyeta xwe winda kir. Ez ji "ez" bûnê derketim û bûm "pena-

bereki, macîreki" nenas û bêwelat ku hewcedarî alîkariyê bû û kesî nîzanibû ka ew kî ye. Jiyana min, tecrubên min, fikrên min, bi carekê qîmet û hêjahîya xwe winda kirin. Ew daxwaz û îdealên min ku ez ji bo wan li girtigehan mabûm û min her tîşt dikirin, bûn banal û wan hew tîşteki hêja û bîmahne ifade dikirin.

Min kar û meslekê xwe winda kir. Min mafê hemwelatîyê ku ji bo hemû merivan mafekî muqedes e, winda kir. Min mafê bi serbestî vege-rê û li welatê xwe kitêbên xwe

weşandinê winda kir. Min ew qîse, gotin û peyvên germ ên dorahîya xwe ku hêz û quwet didane min, winda kirin.

Da ku ez jê, bi awayekî gîştî, guherî û nûbûyî derkevim... Eger ez tîştên ku min qezenc kirîne ji, bi eynî zelalî û basîtîya romanên Ere-bê Şemo, rêz bikim, berî her tîştî, ez divê bibêjim ku min zîmanekî qe-zenc kir. Zîmanekî ku ji zîmanê min pîr cihê bû û ew êş, keder, jan, qedexê, dijîti û birînen ku bûne barên zîmanê min, tê de nin bûn û ew nedîanîn bîra min. Zîmanekî ku min dikaribû xwe pê, bi awa û şeweyên dîni ji, ifade bikira û imkan û fersendên nû yê nivîsin û xweifadekirinê didane min. Bi alîkari û wasîta vi zîmanî, min welatekî nû, çand û edebiyateke nû qezenc kir.

Gelo min ev hemû tîşt û wesîf qezenc kirin? Ma kî ji me, merivên ku ji tunela wextê dibihure, bi vê yekê dizane? Kî dizane ka çî qezenc dibin û çî winda dibin? Ez bi xwe, bi misogerî, nîzanîm, lê bi tenê tex-min dikim.

Bi alîkariya van tîşt û wesîfên ku min qezenc kirin, min ji nû ve zî-manê xwe yê zîkmakî peyda kir. Ji nû ve, ez hîni zîmanê xwe yê ku xwendin û nivîsina wî qedexekirî ye, bûm. Ez li reh û kokên xwe yê qurmîçî û li huwîyeta xwe ya asimî-lebûyî vegerîyam.

Mehmed Uzun

DOSTOYEVSKI

**Tu bi
xêr hati
welatê
me!**

Pûşkin, Çêxov û Dostoyevski ji êdî li welatê me ne. Gelek klasikên din ji bi rê de ne, lê Hesenê Metê (ji nefspîçûkiya xwe) naxwaze qala wan bike.

Rast e, em pîr dereng ma ne. Lê belkî te ji bîhistibe, dibêjin ku "derengmayin ji nekîrinê çêtir e"

Tu nuha meroq diki, ka Hesenê Metê meriveki çawa ye. Hesenê Metê xorteki 34 salî ye. Li Swêdê diji. Bavê du zarûkan e. Bi rojê weki grafisyen li çapxanê kar dike. Bi şevê ji kitêban werdigerine.

Hesenê Metê, berî her tiştî, meriveki şermok e. Qet naxwaze qala xwe bike. Gava ku qala xwe dike li ber xwe mêze dike, awurên xwe ji merivî dîrevine û dîxwaze zû-zûka sohbetê biguherîne.

Lê ez wi bernadim. Bi îsrar, dîxwazim cewaba pîrsên min bide:

- Te çawa dest bi tercûmê kirî?

- Min xwest bi riya wergerê pêşî li Kurdiya min vebe.

- Sin'etê tercûmê, bi gotina te sin'etê wergerê, sin'eteki çawa ye? Eserên te bi xwe ji hene, yanî eserên edebî. Ferqa tercûmekîrîn û nivîsandinê çi ye?

- Bi qasî serbestiya ku meriv tiştê bi xwe binivîsîne, di wergerê de ew serbestiya tune. Dostoyevski yan ji nivîskarekî din, berhema xwe li gor dewlemendiya zîmanê xwe dinivîsîne. Wê çaxê ji meriv mecbûr dibe ku kapasîta zîmanê xwe bigihîne wê dewlemendiyê. Ev kapasîte kelîme ne, cumle ne, lihevane û mane ne. Wek nûmûne; ez dîkanîm pirtûkeka sed rûpelî bi deh hezar kelîmên cihê cihê binivîsinim. Lê ji bo wergerê sed rûpelî dibe ku hewce-dariya min bi bist hezar kelîmên cihê cihê hebe.

- Heta nuha çend kitêbên te û kengê derketîne?

- Tiştên ku min zêde kiribin tunene. Ji A.S. Pûşkin "Keça Kapitan", 1988, ji A.P. Çêxov "Mirina Karmend" 1989, min û sê hevalên din me her yekî çend kurteçîrok wergerandîye û wek pirtûk çap bûye. Hinek çîrokên gelêrî min xwestiye ez bi formeke edebî weke kurteçîrok binivîsinim û ew ji bi navê "Ardû" weke pirtûkekê çap bûye, 1990. Çend kurteçîrokên ku min nivîsandine bi navê "Smirnoff" wek pirtûkekê derketiye, 1991. Ji Dostoyevski min romana bi navê "Merivên Reben" wergerandîye û wek pirtûk çap bûye, 1991.

- Sedemê ku tu xusûsî li ser klasîkan dixebitî çi ye?

- Di sohbetê xwe de, mamoste Celîlê Celîl digot: Kubarîya her milleti ye ku Shakespeare bi zîmanê wi hebe.

- Di wergerê de çi problem derdikevin pêşîya te?

- Wergerên min heta nuha

dibêje: "Çend meh bi vi awayî buhurin"

Ev problemek e ku ez nîkanîm ji zîmanê orijînal wergerînim. Lê ji bo sîlametiya orijînalê, ez van ferqên wusa bi alîkariya yekî ku bi zîmanê orijînal dîzane rast dikim.

- Lê gotinên ku di zîmanê me de tunene, tu wan çawa tercûme dikî?

- Du celeb gotin di Kurdi de tunene. Yek, yên ku di Kurdiya rojane de tunene. Weki nîmûne: "Sîrgûn" (sîrgûn) an jî "nefi, nefî kirin". Lê di ferhengên Kurdi de gotineke weha heye: "Dûrandin"

- Baş e, tu vê rast dibînî? Gotinên wek "Dûrandin"ê gelek in. Ma ev ne "Kurdiyeka naylon" e?

- Ku çêkirina gotinan bi awa-kî ilmî û pedagojîk be, bîla bibê. Lê ji bo karekî wusa ji, ji me re ilîmdar, pedagoj û dezgehên zîman dîvêt.

- Te negot, tu bi xwe van problemên çawa hel dikî?

- Kelîmên ku di ferheng û zîmanê Kurdi de tunene, em bêjin, "lorniyet", "laterna", "travers", ev peyvikên weha di binê rûpelan de bi noteke piçûk izah dikim. Hinek peyvikên enternasyonal ji weke xwe dimînin. Mesela: "kapasîte", "uniform", "kapitan"... Herweha kelîmên ku di Kurdiya rojane de tunebîn, ez ji ferheng û berhemen kevn dertînim. Wek ferheng: Yusuf Ziyaeddin Paşa, "Osmani-Kurdi Ferhençe", Aziz Akrewî, Musa anter...

- Tu ji zîmanê Kurdên Ewropayê re çi dibêji?

- Jindariya zîman bi gramer, ferheng û çêkirina kelîman dibe. Ku Kurdên Ewropayê bîkanîbûna bîhatana cem hev, bi hevdu bişewirîyana û bi hevdu re kar bîkîrana, ewê jindariya zîman bêtîr bîbûya. Jindariya zîmanekî ji axaftinê bêtîr, ji nivîsinê diyar e. Zîmanek lazîm e bi her awayî bi kar were, ku jindar bîmine. Awayê herî baş ji nivîsandin e.

- Baş e, ji bo me Kurdan, iro ferqa zîmanê peyvê û nivîsandinê di çi merheleyê de ye?

- Ev ferq iro gelekî mezin e. Mesela ew zîmanê ku pê dinivîsinim, pîrri caran ez di axaftina rojane de bi kar nayînim.


- Di programa te de kîjan kitêbên din hene?

- Weke program û daxwaza dîlê min gelek tişt hene ku werîne wergerandin an jî nivîsandin. Lê îmkân bi sinor in. Loma ez naxwazim tu sozan bîdim.

- Te ewqas kitêb tercûme kirîne, di kovar û rojnamên Kurdan de qala te nayê kirin. Qey tu daxwaza reportajan qebûl nakî?

- Na, heta nuha kesekî an kovarekê banî min nekîriye ku reportajekê bi min re bike.

Eşref Okumus



**Çavê te rohnî,
kekê Abdullah Cewdet! Va ye
wesiyeta te bi ci hat. Te, di 1913'an
de digot, "Eger hun Kurd dîxwazî
bikevî nav milletên medenî, klasîkên
edebiyata dunyê tercûme bîkî."
Mîzgîna me li te, kekê hêja, va ye
Hesenê Metê, ji bajarê Erxeniyê,
xwestîna te bi ci anî.**

ÖMER OKUMUŞ KITÊBA "BEKLE DIYARBAKIR" DIDE NASIN

MEHDI

Çiroka şagırteki û serokeki ji xelkê

"Gava ji deri ketim hundir herkesi li çepikan dixist. Ji kêfa devên wan nedîçûn ser hev."

Yê ku dikeve hundir Mehdi Zana ye. Hundirê ku dikeve ji îşkencexana Diyarbakirê ye.

Mehdi Zana dewam dike: "Wusa xwanê bû ku pîr kêfa wan dihat. Kêfa xwe bi van gotinan ifade dikirin: 'Heeeyt Mehdi Zana'ya bak.' Û bi gotina xwe re êrişê min dikirin. Kulm, pîhin, çêr, heqaret, qûndax û cop li dû hev dihatin."

Pîştî ketina hundirê îşkencexanê rûpeleka nuh vedibe di jiyana Zana de. Ev rûpel ji deh salan zêdetir dajo. Dî vî navê de Mehdi Zana bi berxwedana xwe ya li hember mahkeman û bi Kurmanci-xeberdana xwe ya di mehke-man de, cara duduyan dibe nişana mucadela azadiyê.

Ki bû Mehdi Zana, çi kiribû, ketina wi ya zindanê çima ew qas kêfa dewletê anibû? Xelkê çiqas wi nas dikir gelo?

Kitêba "Bekle Diyarbakir" li ser van pîrsan ava dibe.

Nivîskarê kitêbê Ali Oztürk di hefsa Diyarbakirê de Mehdi Zana dinase. Mehdi Zana hê ji roja pêşî de bi tînazên xwe, bi germiya xwe, bi devbikeniya xwe bala wi dikîşîne. Ali Oztürk pîştî demekê qerare xwe dide: Gerek jiyana vi insani ji aliyê xelkê ve bê nasin. Çawa keysê dibine planê xwe ji Zana re dibêje. Cewaba Mehdi hazir e: "Çima nebe, tiştêki weha ji bo min şeref e."

"Bekle Diyarbakir" di sê mehan de, di nav şertên giran ên hefsê de tê nivîsandin. Kitêbê ji zarûtiya Zana dest pê dike. Dawiya kitêbê, bi dawiya neh salên wi yê hefsa Diyarbakirê, yani bi surgûnbûna Adiyemanê ve tê girêdan.

"Universita" Zana

Zana di 20'ê Çilê Pêşîn ê 1940'î de li Farqînê tê dinyê. Zarûkeki gelek mîzawur e. Dirûvê zarûkên din lê naxe. Pîr bi heyecan e. Pêşevaniya leyistikên zarûkan dike. Ji mektebê qet hez nake. Bavê wi, wi dide berdestê terziyeki. Hostayê wi meriveki welatparêz e. Xort, xwendevan, gundi, ronakbir ji dukana wi kêr nabî.

Li dikanê suhbet û munaqeseyên pîr germ dibin. Bahsa îşyanên kurdan tê kirin. Helbestên Cigerxwîn û Ahmedê Xani tîrên xwendin. Ji zulma axayan tê xebirdan, sedemên sefaleta ku gundi tê de ne tê munaqesê kirin. Ev sohbet pîr li Mehdi tesir dîkin.

"Ew ji paşnavê min ê nû ye"

Gava ku li Şelmoyê petrol tê ditin, Zana ji hevalên xwe re dibêje, "Werin em herin dest deynin ser birên petrola xwe, em nehêlin kes

petrola me talan bike". Hevalên wi weha bersiv didin: "Mêdi tu dixwazi serê me têxi belayê?" Paşiyê Zana ji bo vî pîrsê fikra mîtingekê davê pêş. Çend roj şûn de li Farqînê mîtingeka bi heytehol çêdibe. Dî dû re yek ji li Diyarbakirê çêdibe.

Di wan deman de, di kovara Ötüken de, ku ya Turanperestan e, nivîsek li ser Kurdan dertê. Nivîs ji seri heta bini li xelkê Kurd heqaretê dike. Mehdi vî nivîsê dibe li çapxanê zêde dike, belavokê ji ew dîvîsine û bi navê "Zana" imza xwe davêjê. Dî belavoka xwe de mudafea kurdan dike û ji bo mîtingekê gazi xelkê dike. Belavokên xwe dibe ji Ruhayê heta Agiriyê, Mûşê, Çolemêrgê, bajêr bi bajêr, qesebe bi qesebe belav dike. Gava ku dîgîhîje Farqînê wi derhal derdixin mahkeme. Hakîm jê dipirse:

- Ev belavok ên ki ne?
- Ên min in.
- Ev Zana çi ye?
- Ew ji paşnavê min ê nû ye.

"Ez li cem dinan nasekinim"

Hevalê Zana, Ayhan Soysal ji İstebolê hatiye. Ew, Zana û yekî din rûdînen qala "seçîman" dîkin.

Zana ji wan re weha dibêje: "Eger namzateki şoreşger hebûya meyê wi destek bîkîra. Ez bawer im ku xelkê Diyarbakirê ji vî tiştî re musaid e. Lê çi feyde namzateki tune ye. Û yekî wusa peydekirin ji zehmet e. Ji ber çi ye nîzanim, lê kes bi vî meselê mijûl ji nabe."

Li gori qenaeta min baweriya gelek hevalan bi xelkê tune ye. Gelek ji bi dûvîka CHP'ê ve zeliqine. Pîr heyf e. Eger ji bo çapkîrîna afîş, belavok û pîşûlên rayan perê min hebûna, ezê bi xwe bîbûma namzat û minê qezenc ji bîkîra."

Ayhan Soysal jê dipirse:

- Dî texmîna te de ji vî îşî re çiqas pere divê?
- Li dora çîl, şêst hezari.
- Eger ewqas be ev îşî temam e. Wan peran ezê bîdim te.


- Wê çaxê min ji namzatiya xwe dani çû. Mêrikê ku ji seri de li Zana û Soysal guhdari kirîye, dibêje:

- Bi xatîrê we ez diçim. Ez li cihê ku qerarên weha bi dînitî bîn sitendin nikarim zêde bisekinim.

"Tu nikari Turki qedexe biki"

Ji "seçîman" re rojek ma ye. Zana tê girtin. Dotîra rojê Zana Serokê Belediya Diyarbakirê ye. Mecbûrî wi berdidin. Lê ji bo ku Zana nikarîbe ji xelkê Diyarbakirê re xîzmetê bike, çî ji destên wali, esker, polês û MÎT'ê tê dîkin.

Ewqas pêş de diçin ku, carekê birreka xelkê, ku ji aliyê polêsan ve hatiye fitil kirin, davêjin ser Belediyê û bi zorê dikevin oda



● Mehdi Zana di xortaniya xwe de.

”
Ji aliyê
berxwedanê ve
ez ji xwe emin
bûm. Ji ber li ba
min, ne tenê
min îşkence di-
dit, yê ku raya
xwe dabûn min,
yê ku bûbûn
sedemê hebûna
min, yani xelkê
min ji îşkence
dîdit.”

Zana. Ji Zana re dibêjin, "Tu ki yî ku zîmanê me qedexe dikî? Zîmanê me Turki ye û emê li her derî bi Turki bîpeyivîn. Kes nikare zîmanê me yê Turki qedexe bike û Kurdi mecbûrî bike!"

Ji aliyekê ve nanpêj dikevin grevê, ji aliyê din ve karkerên belediyê. Belediyê dixwaze rê çêbike, xelk îşyan dike: "Em rê-mê naxwazîn." Belediyê dixwaze qenalizasyonê av-ake, xelk nahêle.

"Reiscumhûrê Kurdistan'ê"

Rojekê Cuneyt Arcayürek ji bo reportajekekê tê mala Zana. Arcayürek dikeve hundir, li dora xwe dinêre, şaş mayî ji Zana dipirse: "Tu li vîderê dimîni?" Zana dizane yê weki Arcayürek li dû çî ne, li gora wi bersivê didê: "Erê, Reiscumhûrê Kurdistanê li vîderê dimîne" Çawa gotina Zana diqede disa telefon lêdikeve. Zana radike telefonê. Hê berî yê ku li wi aliyê telefonê ye tiştêki bête, Zana dibêje: "Erê, rast e ez li te geriyabûm. Wan silahên ku hatine êdî belavkî. Emê sibê li Turkan bîxî."

Pîştî vî gotinê Zana telefonê digre, li mêvanên xwe vedigere û dibêje: "Arcayürek wê li mala me di nezaretê de bîmine. Ji nuha pê ve êdî esîrê me ye." Ji tîrşa dest û lingê Arcayürek dilerîzin. Gava rûdînen, hemû dest bi kenê dîkin. Arcayürek hê nû nefeseka rehet dide.

Pîştî çendeyekê di rojnama Hürriyetê de di rûpela seri de nivîseka mezin dertê: "Ez ji mala Reiscumhûrê Kurdistanê tîm." Arcayürek di nivisa xwe de bahsa xebirdana xwe û Zana pîr kêr dike.

Çendeyek dibuhure disa nivîsek dertê. Li gora nivîsê bi telefonê bi Zana re hatiye xebirdan, goya Partiyeka bi navê "Partiya Rojhelata Kurdistanê" hatiye damezrandin û Mehdi Zana ji tê de ye.

Paşiyê di îşkencexanê û mahkeman de he-sabê van xebîrên bêbîni ji Zana tê pîrsin.

"Em gîş Turk in"

Sal 1979 e. Havîn e. "Genel Kurmay Başkanı" Kenan Evren û qumandanên din tevi xatûnên xwe, ji mêvandariya xwe ya Iraqê vegeyriyane, ji bo sê rojan hatine Diyarbakirê. Li gor protokolê Mehdi Zana ji vexwendiyê şîvê ye. Zana tevi xanîma xwe diçe şîvê.

Pîştî fêslên hevdu-naskirîna suhbet dest pê dike. Zana ji qumandanên dipirse:

- Rêwitiya we çawa derbas bû gelo?
Evren Paşa bersivê dide:
- Yaw Reis, xelkê Batmanê çima bi awirên tûj li me dinîhêrt, ev çî îş e?
- Ez texmîn nakim, dibe ku ji we re wusa hatibe

Ersin Paşa mudaxe dike:
- Yaw yani em derew dikin?
- Estexfirullah, min ew qest nekîr. Mexse-da min ev bû, dibe ku erebên we û forsa we bala xelkê kişandibin.

Evren Paşa gotina Zana dibire:



Foto: CHRIS KUTSCHERA

● Çi dıkaribû zulûmata 12'ê İlonê biçirine, ku ne ev awır bûna? (Xwediye saqoyê xet-xeti Mehdi Zana ye)

– Na, na! Ne wusa ye, qey em awırên tûj û awırên bî meraq jî hev dernaxin? Lî Batmanê şiv dan me. Serokê Belediya Batmanê jî vexwendî bû. Lê dî şûna xwe de wekilê xwe şand şivê. Me got, çima ew nehat. Gotin, nêrehet e rapor sitendiye. Me zanibû jî me direve, loma me got, herin wi jî nava ciyê wi derxin binin. Me jê re got, baş lî me mêzeke, hişê xwe bine serê xwe, ev çî hedise-medise ne, em tiştên wusa naxwazin. Binêre emê dunyê bî serên we de hilweşîn haa!

Zana baş fêhm dîke ku Evren dîxwaze çî jê re bêje. Zana aciz dibe. Lê dî wê esnayê de Ersin Paşa dîkeve navê:

– Em tev Turk in.

Zana cewaba wi dide:

– Na, Paşayê min, em Kurd in, hun Turk in.

Ersin paşa gotina xwe tekrar dîke:

– Em tev Turk in

Zana disa cewaba wi dide:

– Na! Em Kurd in, hun Turk in. Hun direvin, eger mîl biqete gune yê we ye, ne yê me ye. Madem hun pîr jî vi welatî hez dîkin, çima hun lî hember Amerîqa dernayên, jî kengê ve ye ku ew xwîna vi welatî vedixwin.



● "Bekle Diyarbakir" dî sê mehan de, dî nav şertên giran ên zindana Diyarbakirê de, jî aliyê Ali Öztürk ve hatiye nivisandin.

Evren Paşa dîkeve navê:

– Bî texmina min şiv hazir e, em rûnên.

Piştî qederekê Zana jî qumandanan re dibêje:

– Sibê keremkî Belediyê çayeka me vexwin.

– Na, wextê ku em hatin Diyarbakirê tu nehati pêşiya me, em jî nayên çaya te vena-xwin."

24'ê İlona 1980'i ye. Zana lî İstenbolê lî mala Rahmî Saltuk e. Polês davêjin ser malê. Zana dıgırin, dışının Diyarbakirê. Mehekê lê işkence dîkin. Dî işkencê de, weki ku meriv şeytan rıcm bike, her carê yek jî gıregırên emniyetê tê "ziyareta" Zana.

"Bıra Turkiyê bavêjin?"

Êdî Zana dî hefsa Diyarbakirê de ye. Ro-jekê Qerdiyan tîn jî Zana re dibêjin İdare gazi te dîke. Zana gava ku dîkeve oda idarê, dînihere çend kesên sivil lî wêderê ne. Wextê ku Zana dîkeve hundır radibin piya û dibêjin:

– Em jî Parlemanto Ewropa tîn

Dawiyê qederekê lî Zana mêze dîkin ka yê hember wan bî rasti jî Zana ye yan na. Qenaeta xwe tinin û dest bî pirsên xwe dîkin:

– İşkence heyê? Ki dîke? Jî bo çî dîkin? Kes heta nuha dî işkencan de mîriyê? Eger kesên mîri hebin, navên wan çî ne? Lî te bî xwe jî işkence bûye, yan na?

Pirsên Parlamentaran pîr in. Zana yek bî yek bersiva pirsên wan dide. Zana çî qas bahs

dîke, Parlementer ew qas şaş dimînin û misê-wa not dıgırin. Zana dibêje: Wextê ku min bahsa hefsê dîkir, wusa jî min re dîhat ku, Parlementeran êdî jî min bawer nedîkirin. Jî min pirsin:

– Baş e, iro jî lî te işkence bûye yan na.

Min got, welle iro lî min nebûye, lê lî hevalên dîn bûye nebûye nîzanim.

Piştî pirsên işkencê dıqedin, jî Zana pîrseki dîn dîkin:

– Tu zani, jî kengê ve ye ku mesela avêtina Turkiyê jî Parlemanto Ewropayê tê munaqêşe kîrin. Dîtina te ya derheq vê mese-lê çî ye gelo? Yani bî raya te bîra Turkiyê bavêjin yan na?

Zana lî ser çevên memûrên Turkan dînihere. Kenê wi bî wan tê. Ketine haleki pîr xerab. Nuha

weki evdalan

lê mêze dîkin.

Zana bersiva

Parlamen-

teran dide:

– Na, bîra

neyê avêtin.



Ömer Okumuş

ZANA

Ji dijmin natîrsim, ji girtinê jî natîrsim. Vegera min ji ne dûr e

Ne ji dijmin dîtîrsim, ne ji ji girtinê. Heger min bîzaniya ku wê kes min mecbûrî xwe nekî û ji çavê xelkê nexin, ezê vegeriyama welatê xwe, Kurdistanê. Ya duduya vegera min wê çawa bêt organizekirin ku hunerê min nekeve xeterê. Tîrsa min a mezin ev e.

Ev gotin yê Şivan Perwer in. Ew Şivan'ê ku kakilê dilê heyranên xwe û derdê dilê neyarên xwe ye.

Seet heştê êvarê li deriyê Şivan didim. Şivan deri vedike û dibêje:

– Wey bî xêr hati, ser seran û ser çavan... Û bî xêrhatinê re min bî xanîma xwe Gulistanê dide nasin.

Ez di ci de ferq dikim ku Şivan miroveki xweşohbet e.

Gava ku dikevim hundur Şivan tena gomlekê zendpêçayî hazîriya çekirina "çikufte" dike. Min yekser bî xwe re dibe mutfexê. Gava ku ez kamera xwe jî tûrkê xwe dertînim bo rîsmê wi bikêşim, Gulistan jî salonê tê û dibêje:

– Weylê tu dike çî bîki, em jin rûniştî û zîlam xwarinê çêdikin...

Şivan guhdariya van gotinan nake, lê dibêje:

– Ev cara ewil e ku ez destûr didim rojnamevanekî ku rîsmên min di mutfexê de bikêşê.

Heyranê Cizrawiyan

Şivan gomlekê xwe jî ber xwe dike, tena kirasê çengkurt isota Rihayê û ava bacanan nêv hev ve dide, hêdî-hêdî danhûrîk jî dike ber. Ew dest bi strandinê çikufte dike, ez jî dest bi pîrsên xwe dikim.

– Dî stranên te yê berê de temaya sinifî ciyekî mezin digirt. Hîşyarkirina gel armanc bû. Te qala hêvî û têkoşînê dikir. Dî stranên vê paşiyê de qêrîn û hewar heye. Ma ev ne elametê bêçariyê ye?

– Serê ewil ne çekên me ne ji mal û mülkê me hebû. Jî ber wê qasê min dixwest hêviyê bîdim xelkê, te got erê. Gelê Kurd iro di hemi waran de di nêv şer de ye. Ez dixwazim alem bî qêrîqêra me bihesîn.

– Dî stranên te yê vê dawiyê de dersdayin heye, çîra?

– Ev grûdayî mesela yekitiyê ye. Wek Ehmedê Xani dibêji: "Ger hebûya jî bo me Kurdan ittifaqek/wê di nav me de rabûya padişahêk." Lê tu fikra min bipîrsî, stranên min ên vê dawiyê hem bî muzika xwe ve, hem bî muhtewa xwe ve jî yê berê pêşdetir in.

– Tu jî kîjan dengbêjên Kurd hez dikî?

– Yê ku bî ruhê xwe, bî dengê xwe, bî îşqa xwe Kurd in. Wekî Cizrewîyan; Arîf Cizrewî, Hesen Cizrewî, Kewîs Axî, Meryemxan...

Şivan naxwaze behsa dengbêjên Kurd, ên nû bike. Li gor wi kesê ku wi têr bike nine. Mihemed Şêxo? "Hinekê". Dîkim nakim ew naxwaze navê kesi bide. Baş e,

gelo Şivan hez jî kîjan stranbêjên

Turk

dike?

Dî-

gêl

hemî

îsraên

min car dî naxwaze tu navan bêje. Ez navan dihejmêrim. Sezen Aksu? "Xatûneka delale" lê di şûna wê de guhdariya "Gloria Estephân" dike Şivan. Liwanêlî? "Qet". Rûhî Sû? "car-carna". Ibo? "Na".

– Tu jî bo Tatlisê dibêji "na", lê tu jî bî meqamê erebesk stranên dibêji?

Kaniya Tatlisê


– Na, muzika min ne erebesk e. Jî guhê te re wusa tê. Alet hinekî wusa hatine xebitandin. Lê muzika min û Tatlisê jî eynî kaniyê dizên. Jî kaniya kultur û muzika Kurdî. Ez bî Kurdî dibêjim, ew bî Tirkî.

Çikufte hinekî bî ser hev de tê. Şivan, jî bo çekirina çeqilmastê bang dike Gulistanê. Ez jî dewamî pîrsên xwe dikim:

– Tu pîr dikevi şev û konseran, ma tu çawa wext dibîni ku hunerê xwe pêş de bibî?

– Eger dewleteka Kurd ku ez xwedî bîkirîma hebûya minê hemû bala xwe bidaya muzikçekirînê. Ez mecbûr im idara mala xwe bikim. Kiyê kurê min Serxwebûn û diya wi xwedî bike, kiyê mesrefên stûdyo û aletan bide?

– Disa jî gazin jî te tînin kirin.



● Şivan Perwer hesreta xwe ya xeribiyê bî "çikufte" aş dike. Lê wê ev zêde najo. Jî ber ku Şivan dibêje "vegera min ne dûr e."

Mesela di kovara Berbangê de bî imza Bavê Nazê nivisek bî navê "Şivan Pere Were" hat nivisandin. Tu çî dibêji?

"Bî qimeta xwe hesiyam"

– Ew neheqî bû. Wi xwest bela xwe di min bîdî jî bo ku xwe meşhûr bike. Heqê xelkê heye li min jî rexne bigirin. Rexne nebe pêşveçûn jî nabe. Lê ne bî vî şekli. Bavê Nazê miroveki pis e.

– Ev 16 sal in tu li xeribiyê diji. Heta kengê wê xeribî qedera te be?

– Xeribî ne qedera min tenê ye. Gelek mirovên hêja li xurbetê ne. Lê wê biqede. Miletê Kurd dixebite

û bî xebatê her tiştê çêdibe. Vê havînê çûm Kurdistanê Iraqê, ez carek dî bî qimeta xwe hesiyam. Gerek ez li ser meselên hûr nesekînim. Qedrê şexsiyeta xwe bigirim heta ku vegerim welatê xwe.

"Dibe ku iro jî vegerim"

– Ew roj dîr e yan nêzik e?

– Ew roj nêzik e, dikare iro jî be. Mesele ne tîrsa jî dijmin yan tîrsa jî zindanê ye. Tîrsa min ev e: Wê çûna min çawa bê organize kirin. Ezê çawa vî hunerê xwe biparêzim, bîyî ku bikevim bin tesîra filan û bêvan. Û min perçe nekî jî çavê xelkê nexin. Wê çaxê ezê bimirim. Ez jî vê dîtîrsim.

Çikufte hazîr dibe û mase tê rastînin. Şivan dibêje ki dixwaze firek ara qexwe. Yê ku dibêjin "erê" teşrîfî qedehêk wiskî dîbin. Şivan devê şûşê vedike û di ber re dibêje: "Ez Black Label vedixwim, wiskîya bê qelîte venaxwim"

Ez meraq dikim, gelo Şivan vî dengê xwe yê zelal çawa diparêze. Şivan dibêje:

– Ez baş spor dikim, dibezim, teqlan didim xwe, karate û jûdo dikim. Hemû jî bo ku bêhna min vebe û dengê min nerm bibe. Sîhet

xweş bit deng xweş e.

Şivan bî Almanî, Îngilîzî, Tirkî û piçek Swêdî dizane. Dilê wi heye ku bî Îngilîzî jî stranên bêje. Şivan dibêje Îngilîzî mûsaiid in, lê ez ne mûsaiid im. Ez jê dipîrsim:

– Ne mûsaiiditiya te çî ye?

– Ez hê tam jî gunditiyê xelas nebûme.

– Ma tu dîfîkirî muzika Pop çekî?

– Belkî jî bo hinekan çekim, bila bî zîmanê Kurdî jî Pop hebe. Ez bî xwe jî muzika Pop hez dikim. Ez û Peter Gabriel'ê Îngilîzî dixwazim bî hev re li ser rewşa dinê ya iro û li ser menfîetperestan stranekê bî navê "I am the boss", çekin.

Seet dibe 12'ê şevê. Çikufte xelas bûye. Şûna wê fêki girtiye. Dî ber fêki re em temaşa konsera Şivan a Diyanayê dikin. Bî deh hezaran pêşmergek çêdî guhdariya wi dikin. Jî kêfa xwe hildavêjin.

Ez difikirim, gelo wê kengê dora Diyarbekirê bê...

Arîf Zêrevan




pirsê. -Dî serê tûzbiyê de ye. 10-Filankeso, çiko. Sembola zêr. -Merivê servekîrî-Bazdan. 11-Bî Dimilî "tu" (berepaş). -Bî Ingilîzî derya-Kesê ne rastgo. 12- Rismê jêrîn ê milê rastê, serokekî Kurdan i bî navû dengê, 30 salî jî bo heqê Kurdan şer kiriyê-Brayê mezin(berepaş). 13- Jin dî nenûkên xwe dîdn. -Dûman jê der tê, rojin. -Mîrov genim lê dihêre. 14-Baş (berepaş). -Aşê desta. -Ne kevn (berepaş). 15-Jî poz tê. -Navek. -Dost Ben. 16-Nig. -Navê kevn yê Elezîzê- Şil. 17-Perçên Qur'anê (berepaş). -Navek. 18-Ne teng (berepaş). 19- Kûçik (berepaş). 20-Serokê serihildana 1925'an (berepaş). 21-Ne germî-Ne ew(berepaş). 22-Navek-Lî esman diçirise.

'e

Bira
mebûsên
HEP'ê disa
vegerin
HEP'ê?




Ayşe Bal
Xwendevan, 26 salî.
- Bira vegerin. Bî SHP'ê tiştê hel nabe. Gerek partiyekê Kurdan jî hebe.




Alan Avcı
Mamoste, 31 salî.
- Na. Baştir e ku bî SHP'ê re bin, bî wan re daxwazên xwe dikarin bî hukûmetê bîdî qebûl kirin.




Muzeyyen Esmer
Xwendevan, 27 salî.
- Bira vegerin. Qe nebe Kurd hemû dî partiyekê de tîn ba hev û dikarin dengê xwe bêtir bilind bikin.



Sofi Demir
Bê kar, 35 salî.
- Na. Heta ku qanûn neyên guhertin dî nav kîjan partiyê de dibin bîla bîdî nîkarin tiştê belav kirin.



Çeko Pekgöl
Mamoste, 28 salî.
- Erê. Jî ber ku nîkarin programa HEP'ê dî nav SHP'ê de bî ci binin.



INTIXAR NEKE ROJNAME'KÊ BIKIRE!

Eger zîmanê te "yasak" bûna teyê çî bikira? IHD, dî anketekê de jî Turkan ev pîrs kîr. Cewaba gelekî weha bû: "Minê intixar bikira" Lê tu disa jî intixar neke, ROJNAME'kê bikire. Hem ruyê xwe, hem ruyê me spi bike.

FALA TE FALA TE FALA TE FALA TE FALA TE

BERAN



(21 Adar-20 Nisan)
Tu pîr betiliyî, kêfa te jî ne lî ci ye. Demekê jî ciyê xwe bî dîr keve. Wê her tişt derbas be.

GA



(21 Nisan-20 Gulan)
Hevalên te pîr jî te hez dîkin. Karê te jî baş e. Dî nêzik de xeberek xêrê heye.

CÊWÎ



(21 Gulan-21 Heziran)
Van rojana gelek mêvan tîn mala we. Lê huzûra te heye. Hazîriya xwe ya jî bo karekî dîr û dirêj bike. Bî sebir be tuyê bî serkevi.

KEVJAL



(22 Heziran-22 Temmûz)
Dev jê berde, pîr lî ser nefikire. "Yê çû nede dû." İstiqbala xwe bîfîkire. Wê mîzginekê bîdî te.

ŞÊR



(23 Temmûz-23 Tebax)
Ew pîr jî te hez dîke. Vê fersendê jî dest xwe bernede. Pêşiya te vekirîye.

SIMBIL



(24 Tebax-23 Îlon)
Sihheta te baş e, lê dî xwarinê de lî xwe mîqate be. Carna xeyal jî baş e, lê realistbûn ya herî rast e.

MÊZÎN



(24 Îlon-23 Çiriya Pêşî)
Serê xwe nexer her tiştî. Karê jî qaweta xwe zêdetir meke. Jî yê herî biçûk dest pê bike.

DÛPIŞK



(24 Çiriya Pêşî-22 Çiriya Paşî)
Tenêbûn carna baş e, lê ne her tim. Rabûn û rûniştina bî dostan re gelek tiştan fêrî mirovan dîke. Dev jî hissên xwe berde, heşê xwe bixebitine.

KEVAN



(23 Çiriya Paşî-21 Çileya Pêşî)
Te dest pê kirîye, dî nivî de nehêle. Lez û beztiyê (stresê) jî ser xwe bavêje. Rêwiti heye.

KARİK



(22 Çileya Pêşî-20 Çileya Paşî)
Heval û hogirên te jî te hez dîkin, lê diqet bike te nexapînin. Piçeki guh bide mala xwe jî.

SATIL



(21 Çileya Paşî-19 Sibat)
Lî xwe baş bînehêre, tu nexweş nekevi. Hêviya xwe nebire. Jî dereke dîr mêvanekî xêrê tê.

MASÎ



(20 Sibat-20 Adar)
Dî bin tesira zîman û doxina xwe de nemine, tuyê bî serkevi. Şansê te pîr e, lê neyaran jî jî bir ve neke.